

K.T.
ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZÎNDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZÎMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BÎLÎND



Ladanên Civakî Di Helbestên Nalî De

REKAN MOHAMMAD TAHA ABDULLA

ŞÊWIRMEND
Dr. Öğr. Üy. Ömer ÇİFTÇİ

WAN– 2018

T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ



Nalînin Şiirlerinde Toplumsal Kurallardan Uzaklaşma

REKAN MOHAMMAD TAHA ABDULLA

DANIŞMAN
Dr. Öğr. Üy. Ömer ÇİFTÇİ

VAN –2018

NAVEROK

KURTE.....	I
ÖZET.....	II
ABSTRACT	III
PÊŞGOTIN	IV
SÛPAS Û PÊZANÎN JI BO	VII
KURTEBÊJ	VIII
1. DESTPÊK.....	1

BEŞA YEKEM

Çemk û Zaravayê Ladanê

1.1 Çemk û Zaravayê Ladanê.....	2
1.2 Pênaseya Ladanê.....	6
1.3 Ladanên Civakî	9
1.4 Peywendiya Edeb Bi Civakê ve.....	11
1.5 Peywendiya Ladana Civakî û Rexneya Civakî	15
1.6 Cûreyên Ladana Civakî	22
1.6.1 Ladana Ji Kevneşopiyên Civakê.....	23
1.6.2 Ladana Olî - Kesayetiyên Olî.....	24
1.6.3 Ladana Civakî Hevregezbazî - Hevregezî.....	26
1.6.4 Galte Carî (Henekkarî).....	27
1.6.5 Ladana Civakî Li Rûyê Siyasî ve.....	29
1.6.6 Ladana Erotîkî	30
1.6.7 Ladana Civakî Laşê Jin (Diyarde û Bihayên Civakî).....	30
1.6.8 Ladan û Rexne Girtin Li Paşketiyya Li Nava Civakê de	31
1.6.9 Şî'ira Vekirî	32
1.6.9.1 Daşorîna Pêkhatên Leş.....	34
1.6.9.2 Daşorînî Sîfetên Dirust Kiriyan	35

BEŞA DUYEM

Zimanê Helbestê Li Cem Nalî

2. Zimanê Helbestê Li Cem Nalî.....	36
2.1 Zimanê Şî'îrû Zimanê Şa'îr.....	39
2.1.1 Zimanê Şî'ir	40

2.1.2	Zimanê Şa'îr	40
2.2	Zimanê Şî'irê Klasîkî Kurmancîya Xwarê	41
2.2.1	Li Zimanê Nalî ve.....	41
2.2.2	Bi Hûrgilî Li Şî'irên Nalî da.....	43
2.3	Nêrîna Lêkolînan Di Derbarê Zimanê Yekgirtî Ya Şî'irê Klasîkî û Hewlên Nalî û Hevrêyên Li Warê Şî'îrda:.....	44
2.4	Sê Nêrînên Girîng Di Derbarê Zimanê Şî'îr.....	45
2.4.1	Zimanê Şî'îr û Çek.....	45
2.4.2	Zimanê Şî'îr û Zimanê Şîrînî	46
2.4.2.1	Zimanê Şîrîn, Şîrînî Ji Bo Ziman	46
2.5	Çavkanîyên Zimanê Şîrîn.....	49
2.6	Nalîyê Şa'îr Dû Çavkaniyên Serekî Kiriye Bi Faktera Tevera Bikaranîna Ziman	49
2.7	Dahênan Li Şî'irê Nalî Da Li Nêrîna Ladana Civakî ve.....	51
2.7.1	Dahênan Wekî Zarava.....	52
2.7.2	Çemk û Pênaseya Dahênanê	53
2.8	Dahênan Li Cem Nalî Li Nêrîna Ladana Civakî ve.....	55

BEŞA SÊYEM

DESTNÎŞANKIRINA CÛREYÊN LADANÊ LI HELBESTÊN NALÎ DA

3.	Destnîşankirina Cûreyên Ladanê Li Helbestên Nalî da.....	65
3.1	Ladan Li Dabu û Nerîta Civakê ve	65
3.2	Ladana Olî - Kesayetiyên Olî.....	67
3.3	Hevrezgezbazî - Ladana Civakî Hevrezgezbazî.....	71
3.4	Ladana Civakî Galtecarî (Henekwarî).....	74
3.5	Ladana Civakî Erotîkî - Behskirina Laş û Cesteyê Jin.....	77
3.5.1	Behskirina Memkê Jinê	78
3.5.2	Endama Nêrîneya Zilama	79
3.5.3	Endama Mêyîneya Jin	81
3.6	Ladana Civakî û Paşketiya Civakê:	83
3.7	Ladana Civakî Li Rûyê Siyasî ve.....	86
3.8	Ladana Civakî Şî'ira Daşorîn	88
	Encam.....	91
	ÇAVKANÎ.....	94

KURTE

Lêkolînekî edebiye kar li ser ladanên civakî li helbest û şî'rên Nalî da dike. Li gor hebûna mînakên şî'ir, çend cûreyek ladana civakî jê hatiye derxistin û şîrovekirin. Girîngiya vê mijarê wekî diyardeyekî Şî'ir li şî'rên Nalî da hatiye nîşandan. Ladanên civakî aliyekî dinê ji wan aliyên ku amadene û hêjayî ewene ku lêkolînên akademîk li ser bê nivîsandin.

Navê Nalî yê din Xidire û kurê Ehmedê Şaweysê Alî Begê Mîkayile. Gundê Xakûxol ya li deşta Şarezûr di sala 1800'an hatiye dinyayê, di sala 1872'an de koça dawî kiriye. Li gor rêbaza xwendina wê serdemê di destpêkê ve Qurana pîroz û kitêbên Farişî xwendiyê û bûye feqe û bi navê wergirtina zanistên olî de bajar û gund û xwendingehên beşeke Kurdistanê gerîyaye û pileya wê xwendinê derbas kiriye û îcazeya Melayetîyê wergirtiye. Ew cihên ku ew gelek tê de maye Sine, Sablax, Zerdiyawaya Qeredax û Helebçe û Silêmanî ne. Li Qeredax li cem Şêx Mihemedî Abin Alxiyag xwendiyê, li tekiya Qeredaxî jî ders û waneyên bîrkariyê li cem Şêx Elî Mela xwendiyê. Nalî bi xwe mela bûye melayekî baş jî bûye û şarezayî kûltura îslamê û Yonana kevin û rewanbêjê ereb û kelepûra edebiyata klasîkî ya fars û kurd û ereb û xezîne û gencîneya zimanê her sêyan bûye û Şî'irbi her sê zimanan jî nivîsiye.

Di vê lêkolînê de kar li ser aliyê civakî bi awayeke giştî li şî'rên Nalî de hatiye kirin, ku çawa li nav civaka Kurdî de tê behskirin û bi tiştêkî xerîb û namo tê qebulkirin. Civak çawa li pişt şa'ir behsa wî û şî'rên wî dike û çawa dinirxîne. Heta çi radeyê kariye li nav civakê de cihê xwe veke û werbigre, girîngiya şî'rên wî li rûyê derxistinên civakê ji aliyê baş û xirabên kesên nav civakê û hewldana ji bo bikaranîna peyva xerîb angonamo li şî'rên wî de bo ku bibe tiştêkî asayî li nav Şî'irnivîsînê de ji bo şa'irên dawîya xwe.

Peyvênserekî: Ladana civakî, civak, ladan, komel, şî'ir, Nalî şa'ir, wêneyên şî'irî, zimanê şî'irê klasîkî.

ÖZET

Bu edebi araştırma ünlü Kürt Şairi Nali'nin şiirlerinde, aykırılık ve toplumsal kuralların dışına çıkma ile ilgili bir çalışmadır. Elde edilen ve mevcut şiirler göz önüne alınarak, toplum kurallarının dışına çıkma ile ilgili birkaç çeşit örnek seçilmiş ve yorumlanıp değerlendirilmiştir. Şair Nali'nin şiirlerinde bulunan görüngücü olaycı veya fenomen şiirler konu olarak seçilmiş ve önemi değerlendirilmiştir. Toplumsal kuralların dışına çıkma konusu üzerine akademik araştırma yapmak ve yazmak büyük bir önem ve değer taşımaktadır.

Nali'nin bir diğer adı Xıdır (Hıdır)'dır ve babası Ahmed Şaveysli Ali Bey Mikail dir. 1800 yılında Şarezur ovasının Xakuxol köyünde doğmuş ve 1872 yılında vefat etmiştir. O dönemin eğitim ve öğretim sistemine göre önce Kutsal Kuran-ı Kerimi ve Farsça dersler ve kitaplar okumuş ve Feqe ünvanına ulaşip dini bilimleri elde etmek amacıyla Kürdistan'ın çeşitli il ve ilçelerinde bulunan okulları okumuştur. Bu okullarda Feqe ünvanını aşarak Mela veya Hocalık icazesi ve ünvanını elde etmiştir. En çok yaşadığı kentler (Sine, Sablax, Zerdiavaya Qeredax, Helepçe ve Süleymaniye) dir. Qeredax'da Abin Alxiyag'lı Şeyh Muhammed Hocanın yanında okumuştur. Qeredax tekkiyesinde Matematik ve bazı bilimsel dersleri Şeyh Ali Mela'dan almıştır. Nali'nin çok iyi bir hoca (Mela) olduğu belirtilmektedir. İslam, Eski Yunan ve Arap kültürleri ve Klasik Kürt, Arap ve Fars edebiyatı uzmanıydı. Kendisi özellikle Kürtçe, Arapça ve Farsça klasik edebiyat hazinesi sahibi olup ve bu üç hazinenin dilinde de çeşitli şiirler ve eserler yazmıştır.

Bu çalışmada Nali'nin şiirlerinde genel toplum üzerine çalışılmıştır. Bu şiirlerin Kürt toplumu üzerinde nasıl değerlendirildiğini ve nasıl aykırı ve yabancı olarak nitelendirildiğinisunduk.Nali'ninşiirlerinin iyi ve kötü yanlarının toplum üzerindeki etkisi, şiirlerindeki aykırılık ve yabancılığı nasıl cümleler ile sunduğunu, bu aykırılığın gelecek nesilde nasıl etki yarattığını ve ondan sonra gelen şairler ve yazılan şiirler üzerinde nasıl bir etki bıraktığını değerlendirdik.

Anahtar kelimeler: Toplumsal kuralların dışına çıkma, toplum, aykırılık, şiir, Şair Nali, Şiir örnekleri, klasik şiirde kullanılan dil.

ABSTRACT

This thesis is about a literary research discussing the social deviations in Naly's poems as per the poetic examples tackling many social deviations in the poems and their critical analysis, in addition to discussing the importance of the above-mentioned theme as a poetic phenomenon in Naly's poems. Worth mentioning the social deviations theme is an important element to be discussed academically.

Naly's real name is (Kidhir) the son of Ahmed Shaweys the son of the Beg Michael family, born in (Khak w Khole) a small town in Sharazore plateau in (1800) A.D, and died in (1872) A.D. The studying approach back then (19 Century Era) the holy Quran and Persian booklets were the starting point of his education process, to join the Islamic Jurism as a means gaining more education traveling and residing among various cities, towns, villages and schools within northern part of Iraq such as (Sina and Sablagh, zerdiaway Qeredagh, Helebjeh and Sulaimaniah). eventually given license to become a Mullah.

He was a student of (Sheikh Muhammed bin Al- Kheyat) in sulaimaniah, and in Qeredagh he studied Mathematics as a student of (Sheikh Ali Mela), Naly was a qualified and intellectual Mullah, he was an expert in Islamic and old Greece cultures , having good information about Arabic rhetoric and the Persian, Arabic and Kurdish classical norms, In addition to his fluency in the three languages of Kurdish, Persian and Arabic.

This thesis illustrates the social side in Naly's poems and how it was seen as an abnormal and controversial subject, emphasizing, to which extend the poems were acceptable among the people. The poems also concentrate on revealing the good and evil individuals of the society, using unusual words and phrases in order to normalize its usage in the future.

Keywords: social deviations, society, deviation, social, poem, Naly, the poet Naly, poetic examples, the classical poetic langua.

PÊŞGOTIN

Şî'îr û ladan her wekî cûreyekî nû li edeba Kurdî de tê pêş çavan, nîşandana kêmasiya civakê destnîşan kirina wan û tiştên veşartî û nehatî gotinên civakê bi awayê Şî'îrderbirîn, bêguman eve jî girîngî û bihaya xwe heye li edeba Kurdî de û sedema wê berfireh bûna hizr û bîra edebîye. Ji ber eve dikarîn li nav şî'îrê klasîka Kurdî da bi taybetî ew aliyên ku şa'îr behsê dike li cihên cûda cûda de behsa kesayetiye dike. Ji ber ku şa'îr gelek car, bi taybetî dixwaze li rêya nivîsên xwe ve, an jî şî'îrên xwe behsa wan babetan bike, ku bi awayeke rasteqîne hebûye. Şa'îr behsa wan tiştan jî dike ku li dilê wî da mabê û nekariye behs bike, bi awayê Şî'îrderbiriye, bi watayekî din derbirîna hestên kûrahiya dilê xwe û daxwazên derûnî ya şa'îr sedemeke diyar û ber bi çavê dirustbûna tekst û deqên şî'îra ladana civakîne.

Sinorê Lêkolîne

Ev lêkolîn taybete bi şî'îrên (Nalî) li dîwana wî da û diyar kirin û girîngiya civakê li rûyê civakî û derûnî li nav civaka Kurdewarîda.

Nav û Nîşana Lêkolîne

Ev lêkolîn her wekî li navnîşanê da jî xûyaye (Ladana civakî li şî'îrên Nalî) da hewlekî akademiye ji bo derxistin û diyar kirina girîngiya ladana civakî li nav şî'îrên Nalî da. Her wiha behs kirina kêşe û giriftên civakê bi awayeke Şî'îran jî derxistina raz û niyazên civakê, li rûyê siyasî û aborî û olî û civakî ku raste rast peywendiya wan bi ladana civakî ve heye.

Astengî û Pirsgirêkên Lêkolîne

Bêguman hemû lêkolîneke zanistî û akademî di dema nivîsînê da lêkolîner rûbirûyê hinek kêşe û giriftan dibe. Em jî li vê lêkolîne da tûşî kêşe û giriftan buyîn, wekî nebûna çavkaniyên pêwîst bi zimanê Kurdî bi taybetî di derbarê ladana civakî li rûyê teoriyê ve, her wiha nebûna zanyariyekî tevahî û baş li ser nivîsîna çarçêwe bi sîstema (Apa6) tûşî kêşe û giriftan buyîn. Lê belê piştî hewldanê û pirsiyar kirina ji

kesên şareza û pîspor li vî warî da min karî li ser kêşeyan da zal bim û wan çareser bikim.

Girîngiya Lêkolînê

Girîngiya vê lêkolînê ji wê yekê derdikevê ku heta weke niha hîç lêkolînekî zanistî û akademî li ser ladana civakî nehatiye encamdan, bi taybetî li şî'irê klasîkî ya Kurdî û li ser ladana civakî li şî'irê Nalî da ne hatiye berhevanîn.

Rêbaz û (Metod)ê Lêkolînê

Siruşt û girîngiya babetê me neçar kir vê lêkolînê li gor rêbaza (wesfî û rexneya şîrovevî) kar li ser aliyê teorî û praktîze kirina wan bikîn.

Armanca Lêkolînê

Armanca vê lêkolînê ji bo me diyar kir û pêş çav xistina sedem û kêşe û giriftên civakî li rûyê siyasî û aborî û olî û civakî diyar kirina taybetmendiya kesayetî, weke reşbîn, eybe, şerme, xirabe, serkirdeye, zilameke maqule, zilameke başe, Serok hoze, kesayetiyêke olî ye..., hwd wate dest birina ji bo van kesayetiyên tiştê eybe û şerme, lê belê li vê lêkolînê da gelek bi eşkere bi nav tîne û ji başî û xirabîyan dide axaftin.

Pêkhateya Lêkolînê

Ev lêkolîn berî pêşkêş kirin û spas û pêzanîn û pêşekî û kurtî bi her sê zimanên Kurdî, Tirkî, Îngilîzî, li sê beşan pêktê ku evin:

Beşa Yekem

Babeta yekem: Behsa çemk û zaraveyê ladanê hatiye kirin, her wiha behsa pênaseyên cûda cûdayên ladanê hatiye kirin, her wiha behsa peywendiya edebî bi civakê û her wiha peywendiya ladana civajî bi rexneya edebî ve hatiye kirin. Babeta duyem, li vê babetê de jî bi awayeke giştî behsa ladana civakî hatiye kirin. Her wiha cûreyên ladana civakî bi vî awayê xwarê hatiye behs kirin, ladana ji kevneşopî û dab

û nerîtên civakî, ladana olî û behskirina kesayetiye olî, ladana civakî hevregezbazî, tinaz û pêkenokî, ladana civakî li rûyê siyasî ve, ladana erotîkî, ladana li rehayên civakî û behskirina laşê jin, ladana bi awayê şîrî hatiye kirin. Wate şîrî seksî, ladana bi awayê şîrî hatiye şîrove kirin.

Beşa Dûyem

Ev beş jî bi vî awayî pêkhatiye, mijara yekem pêkhatiye ji zimanê şîrî li cem Nalî û zimanê şîrî klasîkî Kurmanciya xwarê, her wiha ji bo çûna mijaran di derbarê yekgirtiya şîrî klasîkî û hewlên Nalî û hevrikên li warê Şîrîda, babeta duyeme li vê mijarê de hatiye behs kirin. Sê nêrînen girîng di derbarê zimanê şîrî, her wiha çavkaniya bikaranîna ziman li cem Nalî yê şîrî, mijara sêyem behsa dahênanê li şîrî Nalî da bi nêrîna ladana civakî ve, dahênan wekî zarave, çemk û pênasoya dahênanê, dahênan li cem Nalî li nêrîna ladana civakî ve hatine nirxandin.

Beşa Sêyem

Praktîzekirina cûreyên ladana civakî bi mînak şîrî Nalî.

Li dawiya lêkolîna me de gihîştî çend encamek, bi awayeke rêzbendî elif û bê çavkaniyên li vê lêkolînê de bekarhatine me xistiye rû.

Rêkan Mohemed Taha ABDULLA

Van - 2018

SÛPAS Û PÊZANÎN JIBO

Di destpêkê de spasî xwedayê mezin û dilovan dikim ku temen bi min bexşî ku wiha vê pileya zanistî bidestbînim ku bikarim xizmetê pê bikim.

Dayika min a gelek dilovan û xweşdivî û xuşk û birayên min, ku gelek dilsoz û piştgirên min bûn ji bo xwendina master palpiştiya min kirin û sedema serkeftina min bûn û malbata min a xweşdivî palner û palpiştê min bûn bi taybet li warê wergêranê da.

Serokayetiya Zanîngeha Yuzuncu Yil ku wiha derfeta xwendina masterê bi min bexşî li Zanîngeha Yuzuncu Yil .

Gelek spasî Mamosta Ömer ÇİFTÇİ dikim ku wiha erkê serpereştî kirina nameya min girt stûyê xwe û ew hemû mamostayên ku wiha li xwendina beşa Kurdî mamostayê min bûn li Zanîngeha Yuzuncu Yil ya li bajarê Wanê.

Rêkan Mohemed Taha ABDULLA

Van - 2018

KURTEBÊJ

Weş : Weşanxane

Hej : Hejmar

R : Rûpel

Wer : Wergêr

Htd : Heta Dawî

Dr : Doktor

M : Mamoste



1. DESTPÊK

Li vê nameya min da, ladan bi wateya (Al Anhiraf) nîne, hinek mebest li awayên nebawe li axaftin û nivîsînê da, ewê edebiyata me de heta peydabûna nivîskar û şa'îrên nûxwaz, li ser rahatibû, papendbûn bûye bi hemû dab û nerît û kultur û sînorên olî û şermxwazî, lê belê şa'îran û nivîskaran hatin û karîn beşek ji van sînoran bibezênin û heta niha jî li gel da bê, ew tevgere berdewame, ji bilî hebûna çendîn astengiyên li ber da, lê belê kariye berev aqarê rasteqîneya xwe mil bîne, bi bêyî wê yekê ne aramiya civakî dirust bike, ladan têkşikandina bihayên mirovayetiyan nîne, belku pênasekirina wan bihayane û cûdakirina wan ji wan astengî û qedexekiriyên kultura me bi hêceta wê yekê ew dijî bihayên mirovayetiyanin, li ber nivîsîn û axaftinê da dirust kiriye. Bi tenê nivîskar li navbirina endamên cesteya mirov şermane û bi bikaranîna remz û wêneke din, kar kiriye. Ji bo wê yekê bi tu awayekî mebesta min ji ladanê ne lêdane li qedexekiriyên ol û zanist û bihayê rastiyan, belku li çarçêweya parastina rûmeta mirov da, bi raya min normal û asayîye wan kotan bişkênîn û nivîskar zêdetir azadane dest ji bo wan çemkan bibe.

Li dîroka me da nivîskar bi cûreyek wiha hatiye girêdan bi sînorên destkirdeyên me'rifeya xêl, tenê nekariye guzarîşt li hest û soza xwe bike û azar û giriftan bixe risteyan ve, ji ber ku rûbiruyê tomet û kêşeyan bûye û çendîn nivîskar bi van sedeman bi çavên neşîrîn û dijayetiye ve hatine temaşekirin. Her wiha hinek ji wan rastî hewla kuştinê hatine û ji warê xwe hatine derxistin, bi hêceta wê yekê ew propaganda û bangeşeya kufur û bêdîniyê dikan. Li dawiya wan de derketiye ku nivîsîna wan bi tu awayek dijayeti kirina dîn û bihayên din nebûye, bi berevajiyê ve çendîn nivîskar azad bûn. Hêvî ji bo têkşikandina hemû bihayên mirovayetiyan bibin, ji ber ku zîrekane ol û dab û nerîtan kirine palpişt ji bo nivîsîna babet û kitêbên xwe. Êdî mînaka şa'îrekî wekî (Nalî) hatiye û dest ji bo wan çemkan biriye û bikaraniye û silî nekariye li wê yekê çawa nirxandin ji bo wê tê kirin, di demek da em wê rastiye dizanîn ku Nalî kesayetiyeke

şareza li ol û dîndarekî rastîn bûye, ku wate ladan li vir da ladane ji wan bihayên kulturên şaş ku bi navê bihayên rastîn ve hatine binavkirin û vegeyriyane pênaseya rastîn, ya wan çemkan.

BEŞA YEKEM Çemk û Zaravayê Ladanê

1.1 Çemk û Zaravayê Ladanê

Ladan an ku ji rê derketin diyardeyekî giştî ya mezine, her ji berê de hebûye. Hemû tekstekî edebî û mirovayetiye li xwe digre. Ji ber ku her li destpêka avabûna dinyayê ve gerdûn bi vî awayê niha nebûye û guhertin li ser da hatine. Ev guhertin û ladan jî ranawestê û her berdewam dibe. Edeb bi civakê ve peywîste, an ku jiyanê ve bi berdewamî li guhertin û berev pêşveçûnê daye. Mirov jî ku li vê dinyayê de dijî, li hemû war û aliyên jiyanê da hêjayî guhertin û berev pêşveçûnê ye. Wate mebesta ladanê, şikandin û guhertina wan tiştaye ku li her warek de bê neguherîne. Ji ber ku ne taybete tenê yek warî de, nemaze li edeb û wêjê de çûye nava hemû aliyekî edebî da. Gelek caran girêdayî nebûna kesekî, bi dab û nerîtan anku kevneşopiyê civakî ew bi kesekî lader tê zanîn. Yan kesekî negirêdayî yasa û desthilatên siyasî bi kesekî lader û ji rê derketî tê nasîn. Wate ladan li warê (Edeb, Siyaset, Ol, Ehlaq, kevneşopî û Ziman) Da heye ku kesê ladide û ji rêya ola bab û bapîrên xwe derdikeve. An ku ji kevneşopiya wê civaka ku têda dijî bi kesekî binpêker û lader tê zanîn. Li nav civak û xwendevanan da jî tê zîq kirin. Li gelek waran da civak van kesan napejirîne û herdem bi awayeke ne hêja behsa wan dike.

Bêguman ladan gelek aliyên zimanê helbestê jî li xwe digre, lê belê ewê ku li vir da mebesta meye zêdetir ladana ji civakê ve ye. Ew jî beşeke girîngê ladana zimaniye ku ji aliyê zêdetirê helbestvan û Şâiran de tê dîtin.

Çemk an ku têgeha ladanê li dawiya sed sala bîstan ve gelek caran behsa diyardeya ladanê hatiye kirin. Bi taybetî ji aliyê lêkolînerên avakar û zimanvanan ve tê dîtin. Her çende ev awaya ku dibêjîn an ku ev riwayet her ji berê ve û di serdema Arîsto ve jî hebûye. Arîsto bi xwe zimanê helbest û şîir û zimanê normal û asayî ji hevdû cûda kir. Piştî wî jî zana û nivîskarên din jî li gor qonaxên xwe yên cûda cûda behsa vê yekê kirine. Her yek ji wan, nav û derbirîn û wateyekî cûda ji bo vê çemkê bikaranîne. Lê belê bi vî awayê berfirehê wekî niha nebûye û ew çemk û wateya ku niha heye negihandiye.

Ev diyarde bi vê wateya niha ya nû ya li van salên dawî da hatiye behskirin û girîngiyeke zêde dane wê. Ewe jî bûye cihê têbinî û gengeşe û rexneyên giran ya nivîskar û Şairan. Bi taybetî ladan li nav wêje û edeba Kurdî da bi taybetî li edeba kevna û klasîk da dewrekî xwe yê girîng û bi bandor hebûye û hatiye bikaranîn.

Wate ladan diyardeyek nîne ku tenê taybet bê bi şîira nû ve, ji ber ku taybetmendiyê hevebe li navbera kevin û nûda. Lê belê ewa li şîira nû da heye, bûye diyardeyeke eşkere û balkêş ku wiha li me dike ku li ser hurbîntir bibîn. *Wekî derdikevê rewanbêjên ereban li bin navnîşanên cûda cûda de vê çemkê bikaranîne, Wekî pêş û paş xistin, labirin, kurtbirî... ku hemû li zimanê nû da wateya ladanê digihînin* (Abdumelîk 1994:, 134) Çendîn awayên pênaseya çemka ladanê hatine kirin. Ji ber ku çemkeke berfirehe û axaftin û behseke zêde li xwe digre. Lê belê em li vir da balê dikşînin li ser hinek ji wan, bi awayeke giştî ku girîngin û hêjayî behskirinê ne û wateya ladanê digihînin. Komek cûreyên cûda jî ji bo çemka ladanê hatine danîn. Eşkereye ku nasîna wan gelek girîng û pêwîste. *Berfirehiya cûre û necîgiriya zarava pirsgirêk û girifteke bûye cihê girîngpêdana rexnegir û lêkolînerên edebê, ku pêwîste çemkeke pir bi wateya ladanê bê danîn. Ji ber ku Zarava kilîla zanistane, her zanistek b* (Weys 2005, 29)

Li encama hurbîniyê ve ji wergêr û veguhestina kûlturan da, pirsgirêk û kêşeya zaravayan de cûreyeke ne zelalî pêve tê dîtin. Yek ji lêkolîneran taybetmediyeke wan zaraveyan ji bo me zelal dike û dibêje: *Hemû çemkek zaraveyekî xwe ya taybetî hebê ku ew zarave ji bo çemkeke din nehatibe bikaranîn. Ew çemk jî ji bo zaraveyeke din nayê bikaran .* (Qasimî 1985:, 86)

Lê belê di nava zêdetirê zaraveyan de ev merc tûne. Ji ber ku hinek car dibînîn ji bo yek wateyê zêdetirê zaraveyek tê bikaranîn. Yan yek zarava balkişandin û amajeyeke ji bo wateyeke cûda. *Ev ne cîgîrbûnê jî li danan û bikaranîna zaraveyan li hemû babet û zanistan da bi giştî wihaye. Ladan jî çemkeke ku zêdetirê zaraveyan xwe li nav bazinek da hilwasîne û tiştêkî belge nexweste ku li navbera wan da cûdahiyêke zêde hebê. Lê belê birastî gelek zaraveyan tiştêkî balkêşe ku eve ne tenê li kitêbên erebiyan da ye, belku li pirtûk û kitêbên Rojavayîyan de jî hey* (Weys 2005, 30) Bêguman zêdebûna cûr bi cûra zaraveyan jî peywendiya wan bi serdem û qonaxên cûda cûda ve heye. Pêşketina bîr û berfirehbûna zanyariyan sedemên serekî û girîngin ji bo dirustbûna zaraveyên hemû cûre û nû heye. Ji bo wê yekê lêkolîner û zimanewan ne tenê rexneyên hevçerx de jî rêk neketine belku li ser bi navkirina wan zaravan jî rêk neketine *Jan Kuhen yekem kes bû behsa ladanê kiriye. Bi vê wateya niha ku heye li kitêba xwe ya bi nav û deng de, ya bi navê (Binyata zimanê şîir) de beramber vê çemka zarava (Alanzîyah) bikaraniye û hinek carên din jî bi (Alantîhak) bi nav tîne û amaje pêdike* (Quen 1972, 6) Hemû ew çemk û zaravayên ku ji aliyê nivîskar û lêkolîneran ve hatine bikaranîn, yan xistine ber destê xwendevanan bêguman hemû cihê xwe li edeb da digrin. Lê belê bêguman li gor cîh û dema bikaranînê diguherin. Wate merc nîne hemû zarava yek wateyê bidin. Eve jî ji ber girîngî û berfirehiya babetêye ku wiha lê dike wate û çemkeke zêde ji bo ladanê birexsêne.

Bi awayeke giştî beramber bi çemka ladanê li ziman û edeba Kurdî da, gelek zarava hatine bikaranîn ku hinek ji wan raste rast ji zimanê erebî ve wergerin. Hineke din jî hatine dirust kirin, wekî mînak (Ladan – Xilîskan(Xişandin)- Xizan(xişkirin)-

Tirazan(veqetandin)- Zeqkirdinewe(Zîqkirin) - werçerxan-têkşikan - wergeran - goran(guhertin) (Ma'ruf 1987, 97-102) Bi navkirina van çemkan ku ji aliyê nivîskarên Kurd amaje pê hatiye kirin û hatine bikaranîn ji lêkolînên wan û nivîsîn wan, lê belê ji aliyê (P.D.Zahîr Letîf Kerîm) ku wiha çemkeke cûda ji bo ladanê danî. Ew jî (ladana fîkrî, an ku ladana fîkra civakî (Abdulwahîd 2005, 118-120) Ku bêguman beşeke girîngê ladanane li edeba Kurdî de, bi taybetî li şîir da. Ewe behseke serekiya li van lêkolînan ku li ser de bi awayeke berfireh tê gûftugo kirin.

Ladan cûre nivîseke edebîye ku bi taybetî li şîir da ber bi çav dikeve. Wate em dikarin bibêjin ladan li hemû zimanek de rû dide. Ji bo wê yekê li edeba erebî da jî ber bi çav dikevê û Şâiran xwe li vê cûreya awayê nivîsê dane û ji bo wê yekê jî li cem Şâir û nivîskarên ereb jî çemkên cûda cûda de hatine bikaranîn.

Dr. Abdulsalam Almesedî Ew jî ji aliyê xwe ve beramber bi ladanê balkişandiyê li ser zêdetirê yanz deh zaravayan. Li beramber her zaraveyek jî navê xwediyê wê diyar kiriye ku li vir da navê hinek ji wan tînîn (*Valîrî*) bi *Alanziyah, Altecawiz) ladan, sînor derbaskirin) (Spîtirz) be Alaneharaf) (Wêlbûn) her weha (batiyar)be (Alatahe) (ruxandin), (Tîrî) bi (Almuxalefe) (Serpêçî, binpêkirin) (Bart) bi (Alaşna'e) (Neşîrîn kirin), (Jan Kuhen) bi (Alantihak), (Todorof) bi (Komelîmu) bi nav dik (Almesdî. 1993, 99-102)*

Her wiha ji aliyê rexnegiran ve zaraveyên cûr bi cûr hatine bikaranîn, wekî mînak: Lîç (Ladan) Patiyar (Derketin), Yakopsin (Bêhêvî çaverê kirin) Rîniye Wîlk (Têkdan) Kuriş Sefewî (Rêsa kemkirin) bi nav dikin. (Abdulla 2008, 43)

Li edebiyata erebî da çendîn zaravayên cûr bi cûr li gor serdeman beramber ladanê hatine bikaranîn. *Kevnartirîn zarava ku li Rexne û rewanbêjiya kevin ve ji bo me mabê, zaravaya (Alatsa) ye, ku zêdetirîn bikaranînê wê hebûne û (Îbin Cînî) jî vê zaravayê bikaraniy (Ribab'e 2003, 43-47)*

Bêguman ji aliyê nivîskarên ereban ve jî bi taybetî girîngî bi ladana civakî dane. Wekî beşeke girîng û taybet li edebê de temaşe kirine *Çendîn çemk ji bo vê mebestê hatine bikaranîn ku ev çemk zêdetir di derbarê ehlaq, rewşt û derûnê ve heye. Li lêkolînên derûniyan û lêkolînên edebîyan wiha li derûna me dike ku tûşî tengbûnê bîn. Wekî Aladul, Altexîr, Alanehraf) bûn, ku çemka (Alanehraf) hejmareke zêdeyê nivîskaran bikaranîne ku zaravayekî berbilav bû li lêkolîn û rexneyên nû da (Weys 2005, 48-50) Wate: Rexnegirên nûxwazên ereb rêk neketine li ser danîna sînorek ji bo zaravaya ladanê. Ewe jî li ber eweye ra û riha zarava li cem zimanvan û rexnegirên erebên cûr bi cûr û cûda her yek li gor nêrîn û hîlbijartina xwe diyar kiriye û çemkeke berfireh û wateyeke zêde li xwe digre. Ev hemû jî ji ber girîngiya babetê û berfirehiya edebê wiha li rexnegiran dike ji bo vê babetê bîr û ramana wan berfirehtir bibe.*

Wate ladan bi hemû astên cûda ve bi çemkêke berfireh û ne cîgîr tê zanîn. Ew hemû zarava li xwe digre ku behsa wê dikin ku mebesta wan derketine ji pêver û şikandina wateyê ye *Wate necîgirî li manayê da vedigerê li ser berfirehiya zaravê ku hemû wateyan li xwe digre* (Cizîrî 2002, 31) Divê ewe ji bîr nekîn. Hemû zaravayek li gor serdem û guhertinan berev pêşveçûna civak û teknolojîya serdem guhertin li ser da tê û warê bikaranîna wê berfirehtir dibe û xwe li çend çemk û rehendên cûda de dibîne. Ji bo wê yekê çemk û zaravaya ladanê jî bi heman berçavka jîyan û jiyar û serdem û guhertinan temaşe dikîn û warê bikaranîna wê berfirehtir dibe. Wate asayîye xwe ji van hemû bikaranînên cûda û rehendên cûr bi cûr peyda bike.

1.2 Pênaseya Ladanê

Dest nîşan kirin û hîlbijartina pênaseyek ji bo ladanê gelek lêkolîn û ked divê. Ji aliyê lêkolînerên edeb ve girîngiyeke zêde bi vê behsê hatiye dayîn û şîroveyên zêde ji bo wê hatine kirin. Ji ber ku babet berfirehe û hemû aliyeke edebê li xwe digre. Li edebê de babeteke zîndiye. Wate di destpêka serhildana edebê heta niha jî ladan her berdewam

bûye. Li edeba kevnar û klasîk da bi zelalî ber bi çav dikevê. Nabê eve jî ji bîr bikîn ku ladan li serdema klasîk da sînordar bûye. Wate: Rê bi hemû cûre ladanek nedidan. Eger li şîirên salên pencih û şestan temaşe bikîn, hest dikîn rêjeya ladan bilindtîre li gor salên pêştir. Şîira nû gelek gelek girîngiyê bi îstatîkan dide, bi cih û tiştên nû û nebîhîstî da digêrê, dixwaze bi wateyê nû behsa hestên xwe bike *Li gor şîirên nû ladan wekî pêverekî îstatîkî tê temaşa kirin. Lê belê li şîira klasîk da bi berevajîye. Eger ladan jî hebê dikeve nav sînoren tengên yasa ve* (C. A. Husên 2008, 87)

Ladan li edeba nû da jî berdewamiya xwe heye, ji bo wê yekê li ser pênasekirina ladanê gelek bîr û rayên cûda heye. Dikarîn bibêjin: Her nivîskar û lêkolînereke edebî li gor bîr û raya xwe pênase kiriye û nasandiye, eve jî bêguman li ber dewlemendiya behsêye ku ra û riha xwe li nav rêziman û edebê de belav kiriye. Rexnegirên edebê nekarîne pênaseyekî ne guherî ji bo ladanê dest nîşan bikin. Li heman demê da eve ewe nagihîne ku her yek ji wan pênaseya hevdû red bikin, bi girîngiyê ve temaşe nekin. Hemûyan mebesta xwe pêkve, lê belê li dem û cihên cûda de kirine. Ji bo wê yekê em li vir da hewl didîn hinek ji wan pênaseyan bixîne rû ku ji aliyê lêkolîner û rexnegirên edebê ve li serdemên cûda cûda de xistine rû.

Eger temaşa wan babet û nivîs û lêkolînan bikîn ku li ser ladanê hatine nivîsîn dibînin ev awa û şewaz tenê cihê girîngîdana edebnas û rexnegirên edebî ve nebûye. Belku zimanvan û rexnegirên ziman jî gelek girîngiyê pê dane, ji ber ku babeteke berfirehe û bikaranîna wê gelege *Cûreya ladanê li ziman û awayê pêveran, li rewşa mentîqî û rastiya yasayan derdikeve. Li berê da jî li bin perdeya rewanbêjî da hatiye bikaranîn* (Mihemed 2008, 231) Destnîşakirina babeteke girîng û berfireh li ziman da û hebûna wê li serdemên cûda cûda de di bin navê cûda derketiye. Wate merc nîne, ladan peywest bê bi yasayek ku Şâir peyrew bikin. Li gor pêwîst ladan li berhemên wan de berçav dikevê an jî tûşî ladanê dibe. Ladan şiyana dahêner ya li bikaranîna ziman û derxistin û teqîna şiyânên wî û berfireh kirina delaletan û ji dayikbûn û dirustkirina awayê pêkhata nû pêktîne *Berê li bikaranîna da bi xûrt û bilavnebûye dahêner çawa*

pêwîst bike, bi wî awayê zimanê xwe rêk dixê. Bêyê wê yekê guh bide sînor û yasayên hatine danan. Ji ber ku ew li rêya bikaranîneke ziman ve, li tiştên guncaw bi xûrt ve me dibe, ji bo tiştê ne guncaw (Ribab'e 2003, 33) Ladan babeteke pêwîste ji bo xweguncandina li gel wê rewşa ku Şâir têda jiyaye û dibê sedema bêş xistina zimanê babetên edebîyan û tameke taybet dibexşê berhema Şâir. Şâirên klasîkî bi taybetî, gelek bi şîyan û jêhatîbûne û li ruyê zimanê şîir ve karîne wê ladana ku li şîiran de berhem tînin delaletên wan wenda nebê û mebesta xwe bike. Her çende armanca ladanê werçerxane li yasa û rêsayên ziman û durketinê ve ji tiştên xûrt û aşînanan bikaranîna peyvek cûda li mana wê bihêz dike. Lê belê eve têkşikandin dibê hevsengî têda hebe, Ladan bi sedema bînpêkirina sînoren bîngêhînen zimanî û pêdana wateyên nû bi peyvan, ji bilî li wateya wê ya ferhengî. Ev derketina ji rêsa û sîstemê dirust dibe.

Bêguman beşekê zêdeyê ladanê li şîir ber bi çav dikevê. Êdî ji bo her mebest û armancek bê. Hîç şîirek nîne ladan têda nebê (Quen 1972, 192) Wate hemû şîir li gor pêwîstiyê ladan têda ber çav dikevê ku Şâir bi xwe agahdare ku ladan ji bo çî mebestek û aliyeye edebî encamdaye. Bêguman her ladanek rû bide, raste rast peywendî bi zimanê şîir ve heye. Ji ber ku cûre û awayê ziman ladanê dirust dike. Ji aliyê lêkolînerên edebî ve, bi taybetî xwendevan ve jî tiştêkî zelale û gelek bi hêsanî hest pê tê kirin û tene dîtin.

Li vir da ladan bi beşek ji şîir tê zanîn û jê nayê cûda kirin û peywendiyekî serekî li zimanê şîirê ladanê heye û rengêke ji rengên gotina şîir û diyardeyekî serekî ya zimanê şîire û cûdaye ji gotina zimanê asayî û normal. (Elî 2004, 89) (Todorf) Ladan bi şaşîyeke astengdar dide zanîn Eger zimanê edebî hemû praktîk kirina awayê rêzimanên destpêkê bûya, wê demê dirust nedib (Fazil 1988, 64-65) Li vir da zimanê edebî ji zimanê rêziman cûda dike û ladan li edebî de babeteke diyar û ber bi çave. Lê belê li rêziman da pêwîste li gor wê rêsa û yasayê nebê ku ziman li ser berhemê hatiye nîkarîn jê cûda biki. Wate: mebesta wê diyare ku dibê zimanê edebî bi tevahî peyrew berçavê yasayên rêzimanîyan bike Ladan bi sedema derbaskirina sînoren bîngêhînen zimanîyan û pêdana wateya nû bi peyvan, ji bilî li wateyên xwe yê ferhengî dirust dibê. Ev derketin

ji rêsa û sîstema zimanê şîir ve ciwanî bi teksta şîirê dibexşê (Emîn 2008, 188) Ji bilî van pênaseyan ku ji bo ladanê hatine kirin, ji aliyê rexne ve giraniya edebî lê belê hê jî negihîştine pênaseyekî cîgîr. Ji ber ku edeb li peydakirina peyva nû berdewame ji bo zîndî kirina edebê û pêdana tama zêdetir ku wate ladan li cihê edebî da her dimîne û pêwîstiyekê girîngê şîire.

1.3 Ladanên Civakî

Ladanên civakî diyardeyekî giştî ya mezine. Babetekî serekî û girîngîya edebiye jî, peywendî bi fikir û diyardeya civakî ve heye. Dixwaze xelk hişyar bike li diyardeya bi hêza şaş. Her ji berê de hebûye û hemû gerdun û mirovayetiye li xwe digre. Li gel civakê têkilhevboneke baş heye. Çavkaniyeke serekiya ladana civakîye ji ber ku behsa wê ladanê dike ku li gel kevneşopîya civakê naguncê. Li her warekê civakê da bê, bi awayeke giştî ve destnîşan kirina kêmasiyên civakê ye. Wate mebesta ladanên civakî pîşan dan û zeq kirina karê nehêjaya kesê, yan civakeke, yan civakeke ku li ser diçe û peyrew dike. Êdî ev ladan ji (Ol, siyaset, edeb, dab û nerît û kevneşopîyan) bê.

Li edeba Kurdî da her li serdema klasîk da Şâir li şîirên xwe da ji bo bihêzî û pîşandana asta jêhatî û zîrekîya xwe li rûyê zimanê şîir û dariştina peyvan de dest ji bo vê cûre awayê nivîsînê ve biriye û bi awayeke zelal tê dîtin. Li berhemên wan bi taybet li şîira olî, civakî) tê dîtin û hest pê tê kirin, zêdetir tûşî ladanên civakî dibe. Ji ber ku edeba wê demê de bi taybet edeba klasîk de rêreweke tengê fikra edebî û civakî da diçe. Civak pêwîst bû bi bihayên olî û civakiyên nava civakê de.

Ladanên civakî li destpêka li nav lêkolînên rewşenbîrên civakê de serî hildidin û li rêya wê lêkolînê li nav xelkeke din da jî geş dike û belav dibin (Melakerîm 1979, 51) Ku wate destpêka çîna rewşenbîran dikevin ber van cûre nivîsînan. Bi taybet Şâirên pêşeng derdikevin. Yek ji hûnerên edeb tê zanîn û astekî bilind dibe. Kesên rewşenbîr û

zimanzan dikarin li sedema nivîsîna van cûre ladanên têbigihîn ku wiha Şâir hewl daye çî şaşîyeke civakê rêk bixe.

Ev behs wateyeke zêde hildigre, madem beşeke an jî sedemeke ji bo dewlemend kirina edeb û zimanê şîir, destnîşan kirina kêmasiyên civakê û pîşandana asta rewşenbîrî û zîrekiya Şâir li rûyê xweşik nivîsînê. Ev hemû sedem wiha kirine ku rexnegirên edeb girîngiya ladanên civakî bikin. Lêkolînan jê bikin û bûye sedema dirustbûna çendîn pênase û çemk û zarave û dirustbûna çend cûreyek şîira Kurdî ku ji aliyê nivîskaran ve amaje ji bo wê hatiye kirin û serî hilbide. Zaraveyên cûda ji bo ladanên civakî destnîşan bikin. Li vir da hewl didin hinek ji wan zaravayan bixînin rû ku ji aliyê nivîskaran û rexnegirên edebê ve amaje ji bo wê hatiye kirin *Zaravaya ladanên civakî li edeba Kurdî da nûye û rexnegir û lêkolîner li bin navê cûda ve hewl daye binasênin (Wateya Ladanê) bi wateya ladanê ji wan pêveran tê ku bi pêkve hatinan diyar dikin. Ladan li wê sîmayên wateyiyane ku li ser bikaranîna ziman da* (Sicudî 1997, 150) Ladan wateya berevajîya dirustî jî wate digihîne.

Zêdetirê mebestê Şâiran ji ladanên civakî ji bo vê mebestê bikarhatine xwestine li rêya peyveke nehêja û an jî pêkenînê ji mebesta wê ya serekî bipêkê. Dr. Abdalwahid Muşîr Dizeyî ladana wateya li ser çar cûreyan dabeş dike. Çendayetî, çawayiyetî, guncan, awa (Dizeyî 2007, 13) Bêguman ladan wateya mebestê yek armanca xwe heye, lê belê li gor mebesta şîir diguhere wate guncandin gelek girînge ku çawa ev ladan pêwîste bê encamdan. Li gel wan ladanên ku peywîste cûdaye ji forma rewanbêjîyî wekî: Xweste, xwestin, paş û pêş xistin û hwd... Eve jî bi navê derxistina cîh û demên ciwan û dema delalî û dirust kirina şiyana nû û derbirîn û gerana li pey peywendiyên wate û awayên şîirên ji berê *Niha edeba Kurdî da li vir de derdikevê ku ev ladan kêşeyekî mînake li gel kevin û nû da yan cûdaye li navbera kevin û nûda. Wate li navbera wê yekê aşîna û asayîye û ewê namo û xerîbe neaşînaye* (Latîf 2005, 119) Li vir da edeba Kurdî her le serdema klasîk ve ew hemû babet û mebest û wate û awayê teqlîdiyane derbas dibe. Bazina şîir li girêdana cîh û dema azad kir û bir berev asoyekî

nû ya pir bi hêv *Cûdakirina wê cûre ladanê li edebê da heye û nasandina xwendevanan û dewlemend kirina edeba Kurdî, eve jî piştgiriya me dike ji bo ku ladaneke din bi navê ladana fikrî civakî dabimezrê ku pişt bi tengiya necîgîrî rewşa derûniya civakî û fikrî ve girêdide* (Latîf 2005, 123) Şâirên klasîk yek ji wan cûre şîirane ku nivîsan bi girîngiyê ve dest bi vî awayê şîir nivîsîne û birine şîira vekirî (Erotîk) Buye, ku dikarê bi zaravayê ladana civakî de tê dîtin ji ber ku ji destpêkê ve heta dawiyê dest bi dem ladana civaka Şâire.

1.4 Peywendiya Edeb Bi Civakê ve

Her civakek li gor dab û nerîtî û kevneşopîya taybetîya jîyan û jiyar û jiyana xwe ya cûda heye. Ji bo wê yekê çavê Şâir û edeb û edebiyatê dikevê ser aliyan diçe bin tîşka şîrovekirina rexneyê. Li vir da jî dû alî û dû tevgerên civakî ji hevdû têne cûda kirin û bi awayeke cûda û berevajî amaje bo wê tê kirin. Di derbarê tevgera yekem ew hemû bihayên ciwanên nava civakê de û tevgera pejirandî û nerîtên bilind her civakek digre, ku li vir da ladan bi awayeke ber bi aliyê erênî tê bikaranîn û pesnê wan aliyan dike û palpiştiya bîr û îdeolojiya xwe ji bo wê derdixe bi mebesta zêdetirkirina wan bihayên ciwanan û bi hêzkirin û pêşketina wan hemû kevneşopiyên bilindên nava civakê û li vir da jî pêşketina civakî serî hildide.

Hemû alî û tevgerên dinên civakê wan hemû ehlaq û kevneşopiyên neyînî li xwe digre, ku jiyana civakê têkdide û jîrî û hişyariya pejirandina vê kevneşopiyê nake. Bihaya xweşika jiyane distîne û li ber pêşketina jiyana civakê de rêgirin. Eve jî di destpêkê da ehlaq yan nexweşiya jiyane derûniya take kesek bûye. Êdî ev nerîtên neşîrîn tevî jiyana van kesan kiriye nava jiyana civakê û civak jî pêşxistiye û heta bûye kevneşopîyeke giştî. Êdî ew hemû diyarde li cem Şâir û rexnegir û edîban cihê pirsiyarê ye û çavê rexneyan xistiye ser û li dîwana Şâir bi giştî û Şâirên klasîk bi taybetî. Wate peywendiyê di navbera edeb û civakê *yan bi watayeke din, peywendiya di navbera çemka edeb û çemka civakê peywendiyekî dîrokîye. Ji ber ku edeb bi awayekî giştî her li serdema ji dayikbûn û serhildanê ve, wekî dezgehekî civakî hatiye temaşekirin. Yan bi*

saziyeke civakî ve hatiye çandin (Omer 2005, 85) Bi cûreyeke din dikarîn bibêjîn her ji wê dema ku mirov kariye li diyardeyên siruştiyên dewrubera xwe de bibîne. Bi taybetî li civakên paşketî de berev şîir hengav avêtiye û şîir jî wekî hander û palpiştiyek li gel sirûdên dîniyan û merasîm û cejnan da bûye awaz. Her li vir ve jî peywistiyeke bi civakê ve bihêzbûye. Ji bo wê yekê *Hinek car gelek zehmet bûye, yan zehmetên cûdahî bikîn li navbera şîir û merasîmên olî, yan civakî, yan şîir û efsane, şîir û kar, şîir û yarî û lîstokan* (Omer 2005, 118-119) Wate dikarîn bibêjîn *Mirov bi tenê di destpêka qonaxa jiyana mirovayeti da hewl daye li rêya hunerê ve li rastiye têbigihe. Ji ber ku hewldana ji bo têgihîştina rastiye hengava yekem ji bo kontrolkirina* (Mecîd 2008, 15) Wate li vir ve mezinî û şiyana mirov li qonaxên seretayiyên geş bîra mirov da, ku nivîsîn ne bûye derdikevê. Mirov dest girtî û rawestî nebûye, belku herdem li kar da bûye. Ji bo eve jî fikir û endîşeyên xwe bigihîne û li rêya wêne û xeyal ve hezên wê bi cîh kiriye.

Her wiha li serdemên paşê de pêşketin û geşkirina mirovayeti da, zêdetirê rêbaz û xwendîgehên edebîyan de bi xwest û hêvî û armancên takên civakê ve peywest bûn. Hemû bizav û çalakiyên edebî û hunerîyan ber encama pêşketin û geşkirina qonaxa piştî qonaxa civaka mirovayetiye ne. Wekî mînak dema behsa serhildana rêbaza rastiye dikîn ku girîngiyekê zêde bi kêşeyên civakî mirov hevçerx dide û bandorê rûdaw û serhatên li destpêkên civakê derdixe. Hemû wê peyamê digihîne ku peywendiyekê dînamîkî ya bi hêz li navbera edeb û civakê da heye. Yan bi cûreyekê din civakê ji rewşa bizavtina xwe da ji bo çalakiyên edebî rê xweşker bûye. Li heman demê de civaka vekirî herdem bîngehekê afirandiye ku hela xwe nûkirinê bi çemka edebî bexşîye.

Siruştî takên civakê jî li rêya xemxurî û selîqeya edebî ve nemiriyê dibexşîne bi hinek berhemên edebî û *Ew berhema ciwan û rêkûpêk û li jiyane ve nêzîk bûbê, bersîva pirsîyar û hêviyên ruhiyên xelkê dibe. Ji aliyê xelkê ve ji ber vekirî û parastinê ve, ew jî ku hîç girîngiyekê însanê têda nebûye û li hunerê dûr bûye. Her zû pûk avêtiye û li nav ruhê nişan de dengdanê ve peyda kiriye* (Mamend 2014, 166) Ku wate edeb û civak herdem bi berdewam li gel hevdû kar dikin û bandorê li ser hevdû heye û dibe *Ji bo wê*

yekê jî tê gotin peywendiya di navbera edeb û civakê de peywendiyêke dû seriye. Ji ber ku civak ji aliyê lêgerîna piştî hel û merca peydabûnê û pêkhatina karên edebîyan rê xweş dike. Li aliyêke din ve jî kareke ji bo nirxandin û pêdana wan (S. Husên 1976, 58) diyare civak wê keşeya guncaw diafirîne. Pêwîstiya wê bi berhemê edebî ve heye, her li dirustbûn û derketinê heta qonaxa nirxandinê heye.

Peyama edebê pêwîste guzarîştîkirin bê, li jiyana û kêşe û giriftên civakê û derbirîna jiyana bê. Ji ber ku *Guman têde tûne ku hemû mirov wê yekê dixwazin ku her berhemek bi jiyana serdem û tevgera civakê ve peywîst dibê. Eve dijî hemû bîr û baweriyên mirovayetiyanê û hîç pîvan û piştewaniyekî li cîhana hest da pê venake ji ber ku berhemeke cîhanekî wendaye (Anduras 1974, 40) Ku wate nêrîn û girîngîdana xelkê û jiyana xelkê, eve erkê edîb û nivîskar û hunermendane. Ji ber ku eger nivîskar li jîngeha xwe ya civakî da veqete, nikarê ji xeyal û hez û daxwaza civakê têbigihe. Her wiha agahdarî kêmasiya kêşe û giriftan bê. Li heman demê da jî şiyana bercestekirina bi niyetên civakî nabê.*

Biha û girîngiya karên edebî wekî çalakiyekî mirovayetî ji bo civakê ve vedigerê. Ji ber ku civak dema temamkerê karên edebîyan bê eger nivîskar bikarê, bi awayeke mirovane guzarîşt li mirov û hestên civakê da bike. Ji ber ku bandora civakê li ser edebiyatê rastiyeke ku nayê înkâr kirin. Her li vê meydanê da beşekî zêdeyê rêbazên rastiyên bi cûr bi cûr didin û hunera xwe ji bo xizmeta mirovayetiye terxankirine. An jî bi watayekî din *Ji bo xizmetkirina şiyana maddî û rûhiyên civakê bi pêkve, her wiha pêwîste edeb û huner handerek bin ji bo bizava wê.. Şiyana mirovan ji bo dahênana wê yekê ku dikarê li warê ciwankarî û xêr û qencîya mirovayetiye da deyne (Merwe 1986, 153) Gelek pêdagîriyê li ser peywendiya di navbera edeb û civakê tê kirin ku hîç rolekî ji bo dahênana take kesan danayne. Bi cûreyek aliyeta bîrkirin û berhemanîna fikra edebiyatê jî dide piştî çalakîyên civakê *Fîkir û bîr û nêrînên mirov berhema çalakiyên eqlî nîne. Ji ber ku li rêya jîngeha civakê ve bi dest ve aniye. Ji ber ku bi tenê çalakiyên fikrî û civakî jî bi encama jîngeha civakî tê zanîn (Sale 2002, 89) Divê eve neyê ji bîr**

kirin, dema behsa peywendiyên di naavbera edeb û civakê dikîn, divê hurgilîtir û babetiyanetir biçîne nava babetê û behs û xwesta wê bikîn. Wate divê balê bikşînin li ser peywendiyên di navbera edeb û sosyolojiyê bikîn û li ser rawestîn *Zanista civakî li ser metodên zanistî belav bikîn ji bo lêkolîna li diyardeyên mirovayeti û civakî dike. Hêviya xwe ji bo amrazên naverokê ve dibe. Bi vê navê da, ku bi rastiya cîhana civakê têbigihe. Lê belê edeb bi wesifkirinê ve girêdayîye, yan şîkarên zanistî û tenê li asta rûyên derveyê jiyana civakî da ranawestê Belku dixwaze, bi kûrî bi tişt û diyardeyan têbigihe. Ji wê dema wêneya şarezayiyên mirov li civakê da têdigihe. Li gel rêyên guhertinên wan şarezayiyên ji bo hestên mirovayetiyan, ji bilî wan jî li çawayiya dirust bûn û geşkirina helwest û kêşeyên jiyane vedikolê (Şeqrawî 2005, 43) Eger temaşe bikîn ladanên civakî bi xwe li encama aliyên sosyolojiyan ve dirust dibe. Ji ber ku dikarî bibêjîn: Sosyolojiya zêdetir li çarçêweya civakiya mirov vedikolê li gel wan aliyên ku peywendî bi pêve heye eve jî çavkaniyeke baş dibê ji bo dahênana naveroka edebî tejî bê ji ladana diyardeyên civajî. Her çende sosyolojî wan sîsteman vedikolê ku peywendiya wan bi bidestve anîna xweş guzeranî û jiyane kî baştir ji bo mirov ve heye. Her ev alî jî, wate rûhê başî xwaziye wiha dike ku edebiyat jî girîngiyê bi sosyolojiyê bide. Ji bo wê yekê jî edeb jî *Wêneya hewlên berdehamiyên mirov bi baştirî awayî dike, ji bo xwe guncandina li gel cîhan û meylên ji bo guhertinên cûreya wê serkeftin û şikesta ku dibîni û ew dilxweşî û diltengiya ku hest pê dike (Şeqrawî 2005, 49) Her wiha Edeb rûhê serdeme û eynik û awêneya pişandana jîngeha wê ye. Bi tenê wêneyekî temamkerê dezgehên civakî ye. Sembola hemû diyarde û pergala û sîsteman dike (Silêman 2015, 49) Ji bo wê yekê herbeheme kî edebî nîkarê li zemîneyek da bijî. Eger ji civakê bi xwe derneketibe. Wate guhertinên civakî pêwîstiyê ji pêwîstiyên mirov bo ku bikarê xwe li gel wê merc û rewşa nû da biguncênê û hest bi nûbûn û berdehamiyê bike. Ji ber ku guhertin bi xwe mayina civaka mirovayetiye mîsoger dike. Wate: Ladana civakî li nav edeb û berhemên edebîyan da karekî nû û taze nîne, belku dîrokeke xwe ya kevin û veneqetayî heye. Lê belê bi vê mekanîzm û navê niha ve nebûye, bi watayekî din heta civak û take kes û mirovayetiye hebûna xwe hebê, edeb û edîb û naveroka edeb jî hebûna xwe dibe. Bi vê jî ladana civakî û retkirin û qebûlkirina hinek diyarde û rûdana civakî ji nûbûne û serhildane û dawiya wan nayê. Ji ber ku guhertinên civakiyên li nav**

naveroka edebiyandin... Ji bo wê yekê peywendiya edeb û jande edebiyên cûr bi cûr bi civak û take kes ve, peywendiyekî bi hêz û veneqetayî heye. Eve jî me digihîne wê baweriyê ku bibêjîn: Edeb şerteke ji valahiyê ve nehatiye, tenê beşekî zêdeyê teorî û xwendîgehên rexneyî nû, wekî: Formalîstan û Bunîsatgeriyên... hewldana wan û daxwaza wan edeb û civakê ji hev cûda bikin û veqetînin. Lê belê nekarîn û cara dawî yî her ev nivîskar û lêkolîn û rexnegirên warên edebê, vegeeriyane li ser vê teorîyê, ku nivîskar û naverokên edebî bi bêtir civakê şerteke bê girîng û bê sûde û nayê kirin û nabê. Ji wan jî Luîs Guldman Rêber û damezrînerê rexneya avakerê pêkhatî bûye. Vegeeriyane li ser wê yekê ku edeb û civak dû rûyên yekî û temamkerê hevdu ne û nabê edeb bi bê civakê bijî û nivîskar jî take kesê li vê civakê û bandora wê li ser hevdu heye û bi vê jî li naverokên Luîs Goldman de nivîskarekî bi bandor bû li damezrînerê rexneya avaker pajeya bazînî, ku dijayetiya wan dikir nabê edeb û nivîskar peywendiya wan bi civakê û diyardeyên civakî ve hebê. Divê ji civakê bê veqetandin, lê belê her heman nivîskar carekî din poşman dibê û vê carê ew bi xwe bangewaziya peywendiya bi hêz ya edeb û civakê gûftugo kir û rexneyên avakerê pêkhatî damezrand.

1.5 Peywendiya Ladana Civakî û Rexneya Civakî

Edeb bi giştî û Şîr bi taybetî paşxaneke veneqetiya civakê ne, bi cûreyek hîç berhemekî edebî li vir û li wir nayên dîtin ji navçegeriya civakê derneketibe. Wate her çende şîr, yan nivîskar bixwaze û hewl bide berhemek binivîse û behsên daxwaza civakê û diyardeyên civakî têda nebê. Bêguman neku nikarê, belku tenê nabê bi berhem û dawiyê de naverokeke mirî jê tê berhemanîn û li nav diçe.

Rexneya civakiya prosejê ji bo xwe vegeerane li duv peywendiya di navbera edeb û civak û peydakirina vê bandorê û karlêkirin û kartêkirina li navbera wan da rû dide û hebûna xwe heye. Li vir da ji bo me derdikevê, ku bi awayeke veneqetî û li hevdu û muamele li gel her sê aliyên edeb (Nivîskar – tekst – wergir – xwendevan) da vedike. Wate tekst ji xwediyê xwe venaqete, belku wekî pir bi hevdu gihandina (Nivîskar û wergir) lê temaşe dike. Her eve jî eve diyar dike ku edeb ji bo xwe diyardeyekî civakî ye

û li bin bandora civakê daye. Her wekî çawa edeb jî bandorê li ser tevgera berev pêşveçûnê da heye. Her çende em li vê lêkolînê de bi ladana civakî de me bi nav kiriye û me destnîşan kiriye. Lê belê xwediyê ladanê civak û raya xwe nebûn, bi komelek kevneşopî û dabûnerîtên li nava civakê ji aliyê tak û desthilat û hikumet û kesayetiyên diyar û hwd... Encamê da li rastiyê de eve rexneya civakîye û xwe ji bingeha vê metodê vedişêre *Ji ber ku eve sadetirîn pênaseya rexneya civakî pêkhatiye ji rexneya civakî û dixwaze hişyariya deste û grûpên çînên civakê diyar bike û tiştên xelet û çewt û neheq û diyardeyên bi hêz rast bike û perde li ser rabikin, bi mebesta lêkolîna komek pirsiyar û diyardeyên civakî, neku çareseriyê wan bike...* (Mamend 2014, 84) Ku wate erkê Şîrû nivîskar û şaîre çareseriyê kêşe û giriftên civakî re peyda bike. Belku destnîşan dîke û rexne lê digre û dijî wan radiwestê û helwesta xwe radigihîne.

Ladanên civakî li cem şaîr ve, li encama komek ne edaletî û ne wekhevî û cûdahiya çînayetî û pabendbûna bi hinek kevneşopiyên kevin û komek tiştên xurafî, bi bi navê dîn û ol û îmanê ve bi ruyê xelk û civakê girtiye û rê bi şaristanî bûna civakê û welat digre û li tevgera şaristaniyet û berev pêşveçûnê li paş dixê û vediqete li cîhanê berev pêşketinê bi vê jî şaîr wekî takekî hejyar û bi agahdar wekî kesekî şaristaniyet û bi cîhanbînîniyekî din ve li dewruber û jiyane temaşe dîke û dixwaze bibê benêde ji zincîrên bê wateyiyên civakê û wê dide aliyek û dijî wê radiwestê. Ewê kesê asayî newêrê dest xwe bo wê bibe û axaftinê li vî derbarî de bike, ewe şaîr bi erkê ser milê xwe dizane û perdeya li ser radike eve jî li rastiyê de diçe bin sêwana rexneyên civakî ve.

Bêguman kêşe û giriftên civakê hindî zêdene û hemû waran li xwe girtiye, wekî mînak (Siyasî – aborî – kevneşopî – ol – kesayetî – cîh – kesayetiyên olî û – rihspî û mezinên wê civakê – asîmîlasyona take kesî – biçûkxistin – şerm û eybe û nabê bêkirin – teknolojiya û berev pêşveçûna dînya û zanist û xeyalên zanistiyên û lawazbûn û veqetîna peywendiyên civakî hwd.... Hemû ew cûr û li warên cûda ve çavkaniya îlhama şaîrin. Ji bo wê yekê li tekstên wê da ladana civakî û diyardeyên ladana civakî bi eşkere û bi zeqî diyar dibê û xwendevan pê aşîna dibê.

Divê eve ji bîr nekîn, edeb wekî encameke xwe ya civakî nîşan dide û li peywendiyên civakî û hemû warên diyar û cûr bi cûr vedikolê û dixê ber ameliyat û neşteriyê û tîşka ideolijîya û bîr û nêrînên xwe. Ji bo wê yekê jî Şî'îrjî wekî janrêkî edebî dikarîn bibêjîn: Beşa şêr ber ketiye û ji hemû jandeyên din edeb, bi taybetî li cîhana edeb û edebiyata Kurdî ve, eger lê temaşê bikîn dîroka edeba Kurdî ku ji Baba Tahîrê Hemedanî ve destpêdike, Şî'îrbû. Wate dîroka Şî'îrdîrokeke dûr û kevnar li edebiyata Kurdî da heye.

Wate: Şî'îrên me ji civakê derketine û li nav civakê diyar û ji cografyayekî diyar û taybet xwe ji dayik bûn û jiyane. Eve jî wiha dike, bê gotin şa'îr takekî vê civakê ye, ku têda dijî. Ji bo wê yekê bandoreke erênî û neyînî ya civakê û takên li nav civakê li ser eve jî li tekstan de reng daye û bûye hewên û bingeha beşekî diyar û ber bi çavê tekstên şî'îr, her ji berê ve heta ku niha jî û bi edeba hevdem de jî li gel da dibê.

Wate: Rexneya civakê bi awayeke giştî peywendiyekî têr û tije bi civakê û take kes û diyardeyên civakê ve heye. Bi vê sedemê jî ladana civakîyan jî têne holê û ji dayik dibin. Dikarîn bibêjîn peywendiyekî konkrîtî û ji hevdû veneqetiyayî bi pêkve heye, cûreyên rexneya civakê jî peywîste bi wan hemû rewş û jîngeh û cihên jiyane û kevneşopîyan ve û paşketî û pêşketina şaristanîyeta wî mîlletî ve heye. Ji bo wê yekê ne merce cûreyên ladanên civakî tenê rexneyên civakî bin, li hemû cîh û jîngehan û li hemû mîllet û neteweyan wekî yek bê *Ji bo wê yekê têgotin: Rexneya civakî yek ji cûreyên edebî tê zanîn ku çareserîya kêşeyên civakî û siyasî û ramyarî û aborî bike. Her wiha tenê çareserîya van babetan dike, ku cihê girîng û raya giştîne li serdema xwe da* (Hîte 1974, 525) Dema behsa rexneya civakî û peywendî bi ladana civakî ve dikîn, divê ev rastî li ber çav bê girtin ku bingeha serhildana vê metodê derencama komek sedemane ku peywîstin bi kêşe û gîr û girift û biha û pêverên encamî û ehlaqiyên civakê li gor serdeman guhertin li ser da hatiye. Ev li aliyek û li aliyekî din ve li encama wê geşkirinê

diyar û ber bi çave ku hemû aliyên pîşesazî û rewşenbîrî û ramyarî û aborî girtiye. Wiha pêwîst kir ku mirov carekî din bi ramanekî hurtir û kurtir li diyardeyan û kêşe û giriftên wan rojan temaşê bike û muamele li gel da bike û şîrove bikin.

Mirov çî yasayî bê, yan hunermend, yan edebî, yan li her çînekî civakê bê, xwediyê siruştêkî civakîye. Ji bo wê yekê dema tê gotin *Mirov şiyana ewe nîne bi tenê bijîn wekî tak. Belku ewan weku endam li nav civakan da, ku li gor peymanek bi pêkve hatine girêdan, dikarin bijîn û bimînin* (Fehîm 1977, 120) Bêguman edeb û rexneya civakî aliyekî zîndî û geşbûyî yê jiyane û nivîskar û hunermend jî takekî civakî, lê belê takêkî hişyar û bi agahdar û hestiyar û bi şiyana serdema xwe karîne xwe nûbikin û li gor qonaxên pêşketina civakê hengavan bavêjin û li asta pêşhatan da xwe biguncênin. Ew peywendiyê tûnd ya nivîskar bi civakê ve, wê baweriyê li dirust dîke ku *Tenê civak kar li ser nivîskar nake, belku nivîskar jî bandorê li ser civakê dîke û huner û edeb jî bi tenê dirustkirina jiyane nîne. Belku tamamkirina wê jiyane ye jî* (Warîn 1987, 105) Ku wate li zû ve nivîskar û rexnegirên warên edebî wê yekê gotine ku edeb tiştêk nîne li valahiyê ve hatibe. Ji bo wê yekê tê gotin *Girîngîdana bi tégihîştin û hestkirina bi jîngeha civakî û zanîna radeya bi deng ve çûna hunermend û edîb ji bo wê jîngeha civakî* (Sikut 1981, 135) Êdî ew aliyên girîng ku pêwîste li serhildana vê metodê bê danîn. Eveye ku kariye dû çemkên hestiyar û zîndî peywest bi jiyana tak û civakê ve girê bide ku edeb û civake.

Siruştê mirov wiha pêkhatiyê ku nikarê bi tenê bijî, belku bi civak û deste û grup dijî. Ev rewşa mirov jî bê şik û gûman li edeb û hûner da reng vedide û rengdana wê dibe û vê peywendiyê bi hêztir dîke. Wate eve li vê rewşê de li gel regezekî zîndî û çalak li derveya tekstên edebî da rûbirû dibin ku hewêna afirandina tekstane. Ji bo wê yekê dema dibêjin karê edeb *Beşeke ji rastiye derve, eve derbasgeheke ji bo peywistkirina edeb bikarlêkirina li gel avahiya civakî û sîstema guhertinan bi wê pêgehê ku civak berhemhênerê raste rast ya dahênana karê edebî û huneriye* (Feçil 2002, 46) Geşkirina mirov û zêbûna hişyarî li civakê da, mirov bi wî alî ve bir ku bikarê sûd ji hemû zanistan

werbigrê û ji bo xizmeta xwe bikar bîne. Her li meydana peywist kirina edeb bi jiyana û civakê û diyardeyên derve, rêxweşkerbûn ji bo serhildana wan nêrînan ku dibêje: Edeb awêneya jiyane li vir da jî mebest li jiyana takekî nîne, jiyana hemû mirovan bi awayekî giştî. Ji bilî van jî hewla nivîsîna dîrokê dide, dîsa û dúbare li gel çemka civakê de berev rû dibin û pêwîste behsa rola civakê bikîn li rewta dîrokê da *Ji bo wê yekê rexneya civakî ew metode ku dikarê li vê rêyê ve hewla xwendin û pişandana aliyên dîrokî û civakî û îdeoloji û rewşenbîriyan bidin li wê diyardeyê da ku jê re dibêjin teksta edebî* (Mamend 2014, 289) Li vir da bi vê rastiye têdigihîn, ku edeb û jande edebîyan bi giştî û Şîrbi taybetî rengvedan û rûyê dûyema jiyane bi rûyê edebîya wê. Her wiha çav li ser wan hemû tiştane ku li nav civak û şaristaniyê da rûdidin.

Divê eve ji bîr nekîn, vê ladana me de tîşk dixîne ser û behs dikîn, ewe ladana bîr û fikir û civakî, ne ku ladanekî sentaks, yan rewanbêjî û hunerîniya birîn û kertkirin û li navçûna uşê û destewajeyên zimanî bê. Bi wateyekî din ladaneke ji bo şiyarkirin û bi agahdarkirina xelk û civake li çewtî û xerapî û tiştê nehez û neşiyawên li nav civakê. Ji aliyeke din ve westane dijî hinek ji diyarde û haletên li nav civakê da, ji ber ku şa'îr hest dike eve cûreyeke ji bikaranîn û çewsandina xelkê ji aliyê wan kesên li nav civakê da naskirî xelk gûh didinê, êdî kesek olî bê, yan siyasî, yan rewşenbîr û edîb û nivîskarek bê hwd.....

Dr. Zahîr Letîf Kerîm balê dikşîne li ser van cûre ladan û dibêje: Cûdahiya li gel wan ladan ku peywîste bi forma rewanbêjî wekî: Xweste û xwestin û paş û pêş xistin... *Eve jî bi navê cîh demên ciwaniyan û dema Lalî û dirustkirina şiyarên nû û derbirîn û gerîna li pişt pewendiyên wate û awayên şî'r li berê û niha ya edeba Kurdî da û li vir da derdikevê ku ev ladan kêşeyekî mînakîye li gel kevin û nû da, yan cûdahiyê li navbera kevin û nû da. Wate li navbera wê yekê aşna û asayîye û ewê namo û neasayîye* (Latîf 2005, 118-119) Ku wate: Ladana civakî ladaneke hevtaya rexneya civakî kar dike û zêdetirê dem dikarîn li cîhê hevdû ev dû çemk bikarbê û cîhê hevdû pir bikin, ji ber ku ladanên civakî wan hemû babet û mebest û wate û awayên teqlîdiyan derbasbibûya û bazneya Şîrli girêdayî cîh demê azad kirî û biriye berev asoyekî nû û pir

bi hêvî. Eve jî me pal dide bo ku ladanekî din bi navê ladana civakî serfihilde û dabimezrê ku pişt bi tengî û necêgîrî rewşa psikolojî û sosyolojî û fikrî ve tê girêdan.

Wekî mînak eger belgeya axaftina me ev mînaka Şîrîya Hacî Qadirê Koyî ye, ew bi eşkere û bi rûnê wê yekê ji bo me rûn dike ku ladanên civakî gelekî û tenê hemû şa'îrên klasîkî û nû jî van cûre ladanên civakî li tekstan de reng daye, dema ku Hacî dibêje:

Xa neqaw şêx û tekiyekan yekser

Pê m bilên nef'îyan çîye axir

Xeyrî te'lîmî tenbelî kirdin

Cem'î emlak û xezne kirdin (Mîran 1986, 65)

Her çende Hacî Qadir bi xwe kesayetiyekî olî bû, lê belê eveye rexne li Şêx û Mela û Derwêşan digre, ku di derbarê van de ku hinek kesin bi kirdarî rîseyên olî û civakî têkdaye. Eve jî ji bo wan deman nû bûye, li heman demî de jî qedexekirî bûye û bi ladan û bînpêkirin hatiye zanîn. Mela û kesayetiyên olî kesayetiyekî diyar û xweşdivî bûne li cem xelk û li nav civakê de. Her wiha peywîste jî bi ola îslamê ve.

Eger temaşa tesktê bikin, Şa'îr destê xwe ji bo tiştêk biriye, ku nayê kirin û nabê û qedexeye, ku rexnegirtin û axaftin bi kesayetiyên olî û bi çavkanîyên nefahmî û cahil û paşketiniya wan bizanê, li rastiya xwe de ladana civakî, li aliyekî din ve jî rexnegirtine li vê çîna diyar ya civakê ku kesayetiyê olî ye. Wate: Ladana civakî û rexneya civakî peywendiyekî bi hêz li navbera wan de heye, tenê yek wate li xwe digrin.

Eveye li teksteke din de Hacî dibêje:

Dexîlî şêx û mêx mebin ebeda

Hîç kesê rizqî hîç kesê nada (Mîran 1986, 188)

An ku li vê tekstê da jî dibêje:

Leber hîze nicoy û natebayî

Lejêr hîzî hîzan buwîne doşek

Heta wek agirî bin kan legel yek

Eger tofan bê leşkirtan be pûşek (Mîran 1986, 67-68)

Eger temaşa van dû tekstên Hacî Qadir bikin, dibînin bikaranîna peyvên (Hîz - doşek – hîzî hîzan – şêx û mêx) hemû mana û delaleta ladana li civakê didin û bi vê jî teksteke tevahîya ladana civakî dirust kiriye.

Her wiha Şêx Rizayê Talebanî yek ji wan şa'irane bi şa'îrê (Hecû) hatiye nasîn û nav û dengê xwe derxistiye, wate eger temaşa tekstên vî şa'îrî bikîn, divê dîwana wî ya lêhv bi lêvê ji ladana civakî, neku her ladan, belku gelek erotîkîn û hemû sînorek dibezênê û her çi zilamê diyar û mezin û kesayetîyên siyasî û olî û civakî heye bi jin û zilam ve, ber êrîşa Şêx Riza ketiye û bi şî'rên xwe jî ladana civakî kiriye. Wekî mînak eger temaşa vê teskta Şî'rê wî bikîn, dema dibêje:

Le Bexdaye yan le çiya le çepda yan le rast

Her şewêk lenaw gelêgdaye paşelî le bawêşêkî tirdaye

Kewn debêt kê çuzanêt wek cin le kuwê xoy şarduwetewe

Lekam malda aheng eka. legel çî kesan le cêgadaye

Le mizgewt çira helekat be zîkir û xelk heldexeletênê

Be destêkî tesbiye sûr eda destêkî be kîr û gunîweye

Em teres babey qundere le ser kêr danîştuwe

*Serî bo asman helbirîwe wekû westabêt be pawe (Dr:Talebanî
2001, 283)*

Li vê teksta serî de dibînîn tekst bi tevahî ber vê babet û behsa me dikevê. Wate pire ji ladanê, ji ber ku bikaranîna peyv û destewajeyên wekî: Le naw gelêk daye – paşel - bawêş- le cêgadaye - kêr û gûn – teres - qûnder - westabe pawe – Leser kêr danîştuwe - Ev peyv bi awayeke rûn û eşkere û diyarin û pêwîstiya wan bi tehlîl û nirxandinê nake, xwe bi xwe didin nasîn.

1.6 Cûreyên Ladana Civakî

Hemû diyardeyek, çî xwezayî bê û çî civakî, li nêrîna zanistê ve herdem li guhertinê daye. Civakê jî yekîtiyekî komelên xelkê dirustbû li tevgereke dîrokî da, wate wekî diyardeyekî civakî, li proseyekî dûr û dirêj da bi qonaxên pêşketina aborî û civakî li pey hevdû da hat û derbasdibe û herdem tevdigere û berev pêşveçûnê da dibe. Her çende ji ber gelek sedeman babetê ve, tevger ji civakek ji bo civakeke din cûda dibe.

Bêguman ladan û diyardeyên civakî peywendiyekî bi hêz û serubendekî tund li gel hevdû da heye. Bi tenê yek ji sedemên zeq û diyar û eşkere dirustbûna ladana civakî li cem nivîskar û şaîran, diyardeyên civakîyane ku hewêna ji dayikbûna komelek teksta dahênerên li dinyaya edebî da.

Ladana civakî wekî berê jî me tîşk xiste li ser û behsa wê me kir. Zaraveyêke bikartê ji bo her tevgereke ne bi hêz û qedexekirî an jî bi watayekî din dikarîn bibêjîn: Pêkhatiye ji rûdan û kar û kirdar û peyv û destewajeya hêja û nehatî gotin, yan bikaranîna li nav civakê da bi qedexe û eybî û şermî tê zanîn. Ji ber ku li gel hemû biha û kevneşopîyên civakî dijî dibe û li hev nayê û naguncê. Li gor nêrîna zana (Em Knard) li vî derbarî de dibêje *Reftara kesî ladera wê tevgerêye, ku dibê nerazîbûna civakê ji aliyê takên civakê ve, ji ber ku cûreyek li ser kevneşopîyên civakê ne* (Mîşel 1980, 103) Ku wate her dema civak tûşî girift û dagîrkerî û şer bûbê, komelek ladana civakî li vê civakê de rû dide û şaîr û nivîskar jî wekî takekî hişyar û bi agahdar û çîna rewşenbîriya civakê

bi hest û nêrîna xwe dikin keresteyekî xav ya berhemên xwe û li gotin û tekstan da rengdide û cihê xwe vedike.

Ladana civakî jî bêguman ji encama komek sedem û diyarde serî hildidin û ji xwe ve nabê berhem. Wekî sedemên (siyasî – olî – civakî – aborî – takekesî – derûnî – hwd... Ji bo wê yekê ji xwarê ve hewl didîn diyartirîn û ber çavtirîn cûreyên ladanên civakî bixîn rû:

1.6.1 Ladana Ji Kevneşopiyên Civakê

Civak û diyardeyên civakî bi taybetî kevneşopîya civakê tişteki hevbeşîye li her civak û millet û cihên vê cîhanê da hebûna xwe heye û reng daye.

Bêguman hemû neteweyek xwediyê kevneşopiyên xwe yên taybete, ku ji bav û bapîran ve ji bo wan maye û peyrew dikin û diparêzin. Kevneşopî hinek diçin çarçêweya bihaya ehleqên civakî ve û hineke din jî kevneşopîyên paşketî û nefehmî û pêvekiya desthilata feodalîne. Zêdetirê deman jî ev kevneşopî, wekî pîroziyek hatine temaşekirin ji aliyê takekesên civakê ve û dest jê hilgirtina wê an jî bi xerap behskirin û ladana wan tişteki qedexekirî û hêjayî qebulkirinê nîne.

Babeta kevneşopîyê babeteke diguhere û pêverekî exlaqîye li nav civakê de, tenê ji berê ve heta niha destpêkiriye ladana wê wekî gunehêk tê temaşekirin, eve jî (Eflatûn) li ser pêverên ehleqîyan ve Şîrred dîke ji bo wê yekê tê gotin *Redkirina Şîrri aliyê Eflatûn ve ji bo van sedeman vedigerê ku ji pêverên kevneşopîyên derdikeve û bihayên fêrxwaziyên li nav civakeke ideolojî tîk dide* (Latîf 2005, 102) Wate eger li aliyê Eflatûn tîkdana ehleqa gencan sedemek bê ji bo derxistina şaîran li komarê û qebûlnekirina şîr. Wate ji berê de ev cûre ladan hebûye ji aliyê edeb û milletên cûda ve, edeba Kurdî û nivîskar û şaîrên Kurd jî bêbeş nebûye ji van cûreyên ladanên civakî yên li dijî kevneşopî û ehleqa nav civakê bûne. Ji bo wê yekê li tekstên xwe de reng daye û hebûnekî ber bi çav heye wekî mînak Şêx Riza li vê teksta xwarê de van peyvên wiha

bikartîne, ku rûyê hevdîtin û civatan ve nîne. Ewe jî ladanekî diyar ya kevneşopiyên civakiye. Dema dibêje:

Mamekem jine dewletî Şedadî heye

Gal'î rahber û bextî xudadî heye

Em hemû genc û xezênay heye hêştta teres

Ne heway cûd û nemeylî kerim dadî heye (Talebanî 2001, 143-

144)

Şa'îr li vê tesktê de dijûn cinêwan bi mamê xwe dide û hinek peyv û gotinên nehêja bikartîne. Bi vê jî tekstekî dijî ladana li kevneşopîya civakê berhem tîne ku pire ji îstatîk û hunera axaftinên xweşik. An jî Hacî Qadirê Koyî dibêje:

Eme ker hîze delîn wa rîşî şer'î nebewîn

Hemuwî ebidî senemin, basî meke gewrekeyan (Mîran 1986, 83)

Eger temaşa vê teskta Hacî bikin, divê bikaranîna peyv û gotinên (ker hîz, ebidî senem) dijî hêjayî yê ne, wate ladana ji kevneşopiyên Kurdewarîyê. Lê belê divê ewe ji bîr nekîn ev ladan sedemeke serekî ya dahênane şî'rên şa'îranin bi giştî.

1.6.2 Ladana Olî - Kesayetiyên Olî

Ladana olî yek ji diyartirîn û ber bi çavtirîn cûreyên ladane ji ladanên civakî, bi taybetî li van civakên ku hilgirê olekî hatine diyar kirin bi taybetî jî civakên rojhilatîyan, li nav van de jî civaka Kurdî.

Piştî wergirtin û hatina ola îslamê li nav Kurd û li nav van de jî Başûrê Kurdistanê, êdî xwendin û nivîsîn û elf û bêya Kurdî ji aliyeke elf û bêya Erebî û kultûra Îslamî bûye beşek ji nasnameya neteweya Kurd. Ji bo wê yekê behskirin û ladana li bingeh û yasadananên wê ve bi hemû awayeke qedexebû. Tenê zilamên olî xwedî rêz û biha û pêroz bûn li cem xelk û li nav civakê da. Dikarîn bibêjîn: Kesên axaftin û biryar bi dest û bandortirîn çîn û tuwêj kesayetiyên olî bûn li ser civakê û takê civakê bûn. Xelk evan kiribû xwedî axaftinên rast û rênîşanderên xwe yên ji bo dinya û qiyametê. Kesayetiyên olî jî vê helwest û berteska xelkê xwe bi derfet zanî û ketin bikaranîna ol û pîroziyên ol yê ji bo berjewendiya xwe û zik têrkirina xwe li ser hesabê ol û bi navê olê ve. Ev diyarde li Ewropa û edeba Ewropî jî dagîrkiribû heta dawiya sedsalên navîn û û bi tenê digotin: Mesîhîtirîn şa'îr romantîktirînê wane.

Bêguman herdem ji berê ve heta niha ev cûre bîrkin û bikaranîna hesta xelkê û asîmîlasyona wan ya bi navê ol û dîn ve, ji aliyê şa'îr û nivîskaran ve hêjayî qebûlkirinê nebûye û dijî wê rawestane. Bi vê jî tûşî ladana civakî bûne, ji ber ku li şî'iran da sivikayeti û axaftinên nehêja û neşîrîn bi Mela û Sofî û Derwêş û Şêxan re gotine. Ewe jî li aliyê civakê ve rexne lê hatiye girtin û dijî wê rawestane. Şa'îrên wekî Salim – Nalî – Kurdî – Hacî Qadirê Koyî – Şêx Riza – Melayê Cizîrî – Mehwî – Hemdî û hwd... Her çende ew bi xwe jî beşek ji Melayan bûne û hemûyan jî bi qonaxên feqîtiyê derbaskiriye, lê belê li gelek cîh û deman da dijî vê çînê rawestane û perde li ser zulm û zordariyên vê çîna olî hildane û rûyê neşîrîn û ehleqa wan derxistine holê, wekî mînak: Hacî Qadirê Koyî li vê tekstê de dibêje:

Ûşke Sofî bilê be Şêxî teres

Ba be sermaneyê mîsalî teres

Eceba şa'îr nenasîwe

Şêr û enqa dekate mûr û meges

Ben girêdan û tabirîn û nefes (Mîran 1986, 66)

Şa'îr li vê şî'rê da ladanekî olî kiriye û bi vê jî tekstekî pir bi pir ladana civakî berhem aniye, li rêya zimanê şî'ira xwe ve bi sedema bikaranîna peyvên (Uşke Sofî – Şêxî teres – heres – Mûr û meges – Ker – Ben girêdan – Tabirîn – Nefes) yan Şêx Riza li vê tekstê de dibêje:

Şêxekey dem çewtekey liç gêrekey lêw xwareke

Kurde bê namûsekey gorane qurumsaxekey

Hîzekey bê dînekey kerbabekey bê areke (Dr:Talebanî 2001, 54)

Ev dû tekstên şa'îr belge û diyardeyekî eşkerene ji bo selmandina babeta min û ladana civakî li rûyê olî ve, Çawa xelk hişyar dikin, kuwa bo du'aw nuştekindin û çaw nefes û mindalbûn... hwd, tu demekî rû li vî şêxê bi derewîn nekin, ji ber ku kesên fêlbaz û derewînin û ji bo berwejewendiya xwe dîn û ol bikartînin.

1.6.3 Ladana Civakî Hevrezgezî - Hevrezgezî

Yek ji diyardeyên civakî yên qedexê û ladana civakî dirust dike hezkirin û xweşdiviya hevrezgezî bi xwe ye. Wate kurek kurekî din hez bike, yan bi berevajî keçek peywendiya sozdarî û evînî li gel keçek hebê. Bêguman eve jî li civakên rojhilatî bi taybetî wan mîllet û civakên ku şaristaniyetekî xwe ya îslamî heye, bi hemû cûr û awayek hêjayî qebûlkirinê nîne. Li edebiyata cîhanî de her ji berê ve eve hebûna xwe heye, bi taybetî li edeba Erebî û Farisî û Tirkî û Kurdî... hwd.

Bêguman dema bixwazî bi eşkere û bê perde bi kurek re bibêjî hez ji te dikim bi ber çavê civakê ve, eve tişteki nehêja û qedexê hilibijartiyê. Êdî ev kes kesekî edîb û nivîskar û şa'îr bê, wê demê ev bar çendîn car zêdetir û girantire. Bi tenê gelek caran ji aliyê take kesên civakê ve diçê xaneyê abruyî û aliyê exlaqî ve. Her çende ev diyarde li rojava û Emerîka tişteki normal û asayîye û di van demên dawî de bi yasa jî rê pêdane.

Bêguman her ji berî ve kar li ser babetên akariyan (pêverên akariyan) ji aliyê (Aristo) ve kar li ser hatiye kirin. Wate diviya xizmeta civakê û başxwazî û akarên ehlaqî ve bê.

Bi her cûreyek bê zêdetirê rexnegirên edebî yekser wateya rastîn ya destewajeya akarê bi edebê ve girêdidin û hildidin Şîrîji wan kesan biparêzin ku dixwazin ji paye yê akariya wê kêmbik *Ji ber ku bi raya wan jî her şî'irek guh bi meseleya akar nede ku wate li jiyane da qaçax û yaxiye* (Latîf 2005, 107) Bi mînak eger temaşa vê şî'ira (Kurdî) bikîn, dibînîn, bi eşkere evînî û hevregezbazî li gel kurek pêve diyare. Bi navê (Qale) hinek ji çavkanîyên edebîyan ve jî balê kişandine ser ku Kurdî piştî vî kurî diçê (Sine) û li dûvda dibê, eveye wiha dibêje:

Newcewin, ebrokeman şîrîn dehan û nukte dan

Turk reftar û perî ruxsar û kakoldarekem (Kurdî 1961, 107)

Kurdî aşîqê (Qadir) navekî bûye li Silêmanî ku bi xetên kesk ser lêhva wî bi kakol û xulamaneya ser milê wî soza eşqekî şewitîner xistiye Kurdî ve ev kurik bandoreke zêde li ser jiyana Kurdî yê şa'îr kiriye. Ewe jî li civaka îslamî û li nav mîlletê Kurd da, karekî qedexe û dijî yasa û ol û civakê ye. Ji bo wê yekê teksteke ladana civakîye.

1.6.4 Galte Carî (Henekkarî)

Galte carî cûreyekî dine, ji ladana bihayên civakî yên li nav şî'irê şa'îrên kevin û nûda heye û ber bi çav dikevê. Ewe jî hinek caran ji bo mebesta xweşî û dem bi serbirinê bûye. Lê belê zêdetirê deman li gelek cihan şa'îran ji bo meram û mebesta henek kirin û galte pêkirin û kêmkirina beramberê xwe bûye. Bi vê jî ev tekst dibê teksteke ji rê derketî li civakê de û biha û exlaqên civakê. Eveye (Salim)ê şa'îr wiha dibêje:

Çûme ser çiyafetî Mela Bekirî elî cenab

Çi bilêm xelkîne bom nayete ber meddî hesab

Hemû carê çiwarde yaprax û dû cût nanî qewî

Bay deda lûlî deda qûnî deda miplî dewab

Çengî gurgî ke beyek hemle le goşt ramalê

Hate yadim sehetî zehmetî mer cewrî qesab (Mukriyanî 1972, 43-44)

Şa'îr li vê tekstê de bi awayeke henekwarî û galtecarî behsa daweta Mela Bekir navek dike ku çawa bê şermane nanê dixwar û hesab ji bo keseke din nedikir. Çengê Mela bi çengê gurî wesif kiriye, dema ku êrîş dibe ser nêçîrê, li rêya vê henekwariyê ve û galte pêkirinê, şa'îr dixwaze balê bikşîne li ser çavbirçîtî û bêşermiya wan kesan ku ji kevneşopîya xwarinê derketine ladane û hesab ji bo kesên din nakin.

Li vir da şa'îr rexne li van kesan digrê û perde li ser vê diyardeyê radike û dixê rû û ji me re dibêje: Ev cûre reftar û tevger ladane ji kevneşopîyên ehleqa civakê bi vê jî ladanekî civakî dirust kiriye. Ji ber ku ji aliyê keseke Mela ye nabê sivikayetî pê bê kirin. Ji aliyê din ve Melayekî çavbirçî pêwîste sivikayetî pê bê kirin û rûyê wî yê rast bê eşkere kirin.

Her wiha Şêx Rizayê Talebanî li vî teksta xwarê ve axaftin û sivikayetiyê bi kesayetiyên olî dike û bi henekwarî û galtecarîyê ve behsa rihê Şêx û Mela û kesayetiyên olî dike û bi hîlebaz û şeytan bi nav dike. Ev cûre wesifkirin van cûre kesayetiyên bi henekwarî ve û rexne lê wan girtin cûreyekî dinê ladana civakiye. Şêx Riza jî dibêje:

Hezar efsûn û caduyî pêwe awêzane em rîşe

Îlacî ger bibê ya guze yan guwêzane em rîşe

Be tehrîkî telêkî sed hezar nefsî be kuştin da

Reysî hilekarane şay qumarbazane em rîşe

Ke seyrim kird, zanîm Şêx le min mesrûre ya aciz

Hemey Westa Fetahe bo halî min mîzane em rîşe (Dr:Talebanî 2001, 93)

Eger temaşa vê teksta serê bikîn, dibînin şa'îr henek û sivikayetiye bi kesek dike ku navê wî (Hemey Westa Fetahe) li rêya rîhê wî ve wêneyekî henekwarî dikêşê. Eve jî ji bo mebesta henek û galte pêkirin û sivikayetiye bi Şêxan û rexneye bi zimanekî hecîyî li wan digre. Li vir da mebest rihê wî nîne, belku wêneyê wan kesan aniyê ku bi sadeyî ya rih ve xelkê têk didin û dixapînin. Eve jî ji bo kesayetiye olî û wan kesên li rêya ol ve mirov dixapînin. Bêguman behskirin û tişk xistina ser van cûre kesên olî ladan û qedexeye li rûyê pîrozî û kevneşopîyan ve, teksteke lêhvan bi lêvkirina ladana civakî pê dibexşê.

1.6.5 Ladana Civakî Li Rûyê Siyasî ve

Siyaset û rûdanên siyasîyan sedemekî bi hêz û bi bandor hebû ji bo dahênan û dirustbûna tekstên şî'îrê, ku bîhn û rengvedana ladana civakî ne. Ji ber ku li tekstan de rexne li kesayetiye siyasîyan mezin û wan kesên bi navê siyasîyan ve û derew li xelkê dikin û wan dixapînin. Tenê li edeba nû de jî ev diyarde û ladana civakî bi rûnî û ber bi çav dikevê.

*Behskirin û bi xirap navkirina kesayetiye siyasî û serkirdayan li edeba klasîkî de neku her li edeba klasîkî, belku li edebiyata klasîkiya Ewropî jî ev karên bi vî awayî û ev cûre Şî'îrê tekst dijî yasa û kevneşopîyan û yasayên giştî bûn, li ladana civakî ve. Diyare her ji berê de (Aristo) gotiye (Mirov bûnewerêkî siyasî axaftinkere (Rêbîn 2003, 93) Her wiha dibêje eve jî bibêjin: Şî'îra siyasî helwesta hemwelatîyan nîşan dide beramber bi desthilatê *Ev helwest bi xwe armançekî siyasî û rexnegire li serkirdayetiya kesên siyasî* (Ebubekir 2002, 76)*

1.6.6 Ladana Erotîkî

Mirov yek ji wan bûnewerane dixwaze dûvçûn û zanîna xwezayî û dewrûbera xwe heye. Li dûv van sedem û egeran da geriyaye û digêrê ku bûye cihê balkêşiyê û kar li jiyana maddî û civakî de kiriye. Bi berdewam hewl dide wan nihênîyên jiyana xwe peyda bike û bizane.

Erotîk cûreyek ji behskirin û şorbûne bi navê ceste û aliyên girîng û bandor cinsa regezî beramber, wate behskirina cihên hestiyar û urujênerên jin û behskirina wan bi şîr, ku eve jî li civaka Kurdî û civaka îslamî de tiştekî qedexe û rê pênedayîye. Eve ji bo kesên asayî, ji bo kesekî wekî şa'îrên klasîka Kurdî, ku hemûyan bi qonaxên hucre û melayetî û îcazeya melayetiyê wergirtiye, van cûre derbirînan hineke din qedexe û ladan bûne li civakê da.

1.6.7 Ladana Civakî Laşê Jin (Diyarde û Bihayên Civakî)

*Eger îdeolojîya ji bo xwe dîdgeh û helwesta deste û çînekî diyarkirî yan taybetî civak li beramber rastiya jiyane dabê, an jî ev helwestên ku mirov li encama hurbînê ve û nêrîneke di derbarê tak û gerdûn û civakê ve werdigrin (Sale 2002, 94) Nivîskar jî li rêya ezmûnên xwe jiyane ve helwesta xwe derdibre. Di derbarê jîngeh û dewrûbera ku têda dijî, êşkereye her nivîskarek hilgîrê her nêrîn û îdeolojiyayek bê, bandorê li ser cûreya bîrkirin û çawayiya berhemên xwe dibê *Berhema her nivîskarek fikrek berceste dike, Tolstoy li rêya berhemê xwe ve fikra piştikirina tundutîjîyê dariştiye. Fikir jî bandora xwe li ser nivîskar bi cîh dihêle. Gorkî, Şoloxof, Ştaynbak, Nazim Hikmet, bi fikir û îdeolojîya karkeran ve (Hesen 2008, 48) Wate peywendiyekî bi hêz û diyalektîkî li navbera edeb û îdeolojîyê da heye *Yek ji helwestên li vî derbarê de hatiye gotin ku hunera resen herdem sînorên xwe yê îdeolojiya serdema xwe dibezênê û ew nasyarî û aşnayî li ser rastiyan ji bo me desteber dike û îdeolojî li ber çavê me wenda dike û ji me vedişêrê (Akeltun 2008, 48-49) Seyîd Ehmed Neqîb li vî Şîrde dibêje:***

Be kulî basî dîn fewta, kesê bîka be lasarî

Debête duşminî am û ke xasîş lêyî herasane

Le dinya emro nehî ka, kesê lem esre da bêşik

Delên ew şexse pir tezwîre, yaxo şête, dêwane (Mehmud 2006, 63)

Li vê tekstê de bi eşkere û bi rûnî hest bi ladanên civakî dikîn. Dema şa'îr destewajeyên (Dîn, lasarî, duşmin, tezwîr, şêt, dêwane, dunya) bikartîne dibêje: Eger kesek axaftinek li dijî dîn û dab û nerît û civakê bike, wê demê xelk dijî wî radiwestin û red dikin û jêre dibêjin dîne û dîwaneye. Ewe jî cûreyeke ji ladanê li bihayên akariyên civakê da.

1.6.8 Ladan û Rexne Girtin Li Paşketiya Li Nava Civakê de

Edeb wekî kayeyekî zîndî û serbixwe eynik û awêneya rengvedana hemû diyardeyekî civakîye. Çavkanî û ji dayikbûna tekstekî şî'irî dikarê li nav nîfşên civakê ve çavkanî bigrê. Edeb û civak dû bazneyên têkhilkêşê hevin û hevdû tamam dikin.

Civak dinamoya hemû warên mirovayetiye ye, hemû gûhertin û pêşketin li ber hevketin ji civakê çavkaniya xwe digre. Ev nêrîn jî bi xwendingehên diyalektekî têne zanîn *Nivîskar li vî warê de aliyekî hîlbijartiye li jiyana rastî hildibjêrê û dayika çavkanîya rexne girtina li ehleqa nepejirî û bi xwe xerap ya bi niyeta rêberî û kûrî û wêneyekî karikatêr û aliyên hîlbijartî jî şîrove dîke û diçespênê* (Basîr 1983, 69) Ev diyarde û awayê karkirina li nav kevneşopî û edebîyatê de bi awayeke rûn û eşkere li nav şa'îr û nivîskarên kevin û nû ya Kurdî da hebûna xwe heye û wekî şa'îr û nivîskar û bîrmendê cîhanî li xem û nexweşî û dijwariya civakê da bûne û herdem dijî tiştên çewt û ewên bûne sedema paşketiya civak û şaristanîyetê destnişan kirine û tîşk xistine ser. Hacî Qadirê Koyî dibêje:

Be qîsey bê ser û pa talê meke lezetî xot

Bê mubalat mesûtêne çiray fikrê xot

Hale neqdîneye, musteqiyel û may peşme

Bê emel serfî meke sîm û zerî fûrsetî xot (Mîran 1986, 218)

Hacî Qadir li vê şî'irê da bi wê rastiyê têdigihe ku hinek ji xelkê hindî bibêjî li ser babetan û kêşeyan da radiwestin wiha lêhatiye bûye remzekî neşîrînkê û xelk pê neşîrîn bûye û dikarê li navbera van dû rêza Hacî mebestekî din jî hebê rêber û serkirdeyên civaka Kurdî ewqas minet û şabaşê li ser xelkê da kirine bo ku desthilata fermanrewayiya xwe pê zêde bikin. Hacî hatiye rexneyekî civakî bi vî awayî diyardanê girtiye, yan li vê rêzê de wiha dibêje:

Eger Kurdêk qisey babî nezanî

Muheqeq daykî hîze, babî zanî (Mîran 1986, 148)

Li vê şî'irê da Hacî diyardeyên civakî bi zeqî derdixin û çarçêweyek ji bo tak û desthilatê dirust dikan. Bi awayek bê bezandina vê çarçêweyê nerêkiyek ji bo civakê dirust dike. Ji bo wê yekê Hacî Qadirê Koyî şî'irên xwe kiriye dirûşmek ji bo hişyarkirinê.

1.6.9 Şî'ira Vekirî

Şî'ira vekirî: Ev cûre şî'ire mijûle dildariyê bi awayeke vekirî ji maç û mirç û destbazî û li peywendiya jin û mêr behs dike û li rûyê seksê ve (Xeznedar 2010, 114)

Wate şî'ira vekirî yek ji wan cûre şî'irane ku wiha bi giştî ladana civakî têda ber bi çav dikevê û rastiyê bi pêkve girêdide. Zêdetirê şa'îrên klasîk û nû jî li van cûre şî'iran nivîsîne bi mînak Nalî yê şa'îr werdigrîn ku wiha bilindtirîn mînakê ladana civakîyê û têda encam daye. Li bin navê şî'ira vekirî da hatiye, şa'îr Nalî li edeba vekirî ve pîsporekî mezin bûye xewna xwe li ser Mestûre diyar û eşkereye *Li seranserê dîwana xwe da şa'îr berê xwe daye vê cûreya şî'irê, lê belê bi awayeke simbolîk pir li tem û mij û*

nediyarî ji bo meseleyê çûye û diyare hemû kesek derbirînê pê nake û nikarê telîsma caduyên şa'îr bişkîne (Xeznedar 2010, 151)

Ya her weku girdêkî ke taze helîdabê

Girdî nemekîn ye'nî giyay lê nerûabê

Damênî be inwa'î gulumul xemlabê

Gencêkî têdabê ke telîsmî neşkabê (Xeznedar 2010, 138)

Li van dû beytan da li qesîdeya Nalî ku ji bo Mestûreyê nivîsiye bi zimanê Mestûre diaxive ku bi astekî hûnerî ya bilind tê zanîn. Di destpêka axaftina qesîdeya xwe û heta dawiyê ladana civakî têda tê dîtin û yek ji wan şî'irên vekirî jî tê zanîn.

Diyardeya şî'ira vekirî, an jî nivîsîna şî'ira vekirî li cem şa'îrên klasîkiyan dikeve ber bi çav (Şêx Riza) ku bi yek ji herî şa'îrên jêhatî tê zanîn ku zêdetirê nivîs û şî'irê xwe ji bo şî'irê vekirî terxan kiriye ku gelek bi wêrane li vê meydanê da hatiye pêş serketinê. Bêguman ku behsa Şêx Riza bê kirin ji aliyê xwendevanên Kurd ve wate ladan, ladana civakî.

Li edeba Kurdî da pêşî wan şa'îrên Kurd kêr û zêde Şî'irli vê babetê ve gotiye, lê belê ev şa'îr mebesta xwe kiriye bi xwendingeh *Hîç şa'îrekî Kurd ne li pêşiya wî û ne li paşî wî bi naverok û bi qewareyê ve ewê* (Şêx Riza) *kiriye ewan nekirine* (Maruf 2010, 311) Şa'îr li vir da beşa ladana civakî zêde berdikevê yekem şa'îr bûye, bi vî awayî berfireh dest ji bo vê hunerê bibe û serkeftîbe. Mînakî şî'ra vekirî li cem (Şêx Riza) geleke, yek ji van mînakên de dibêje:

Her kesê nawî mela ezîze

Dayîm bin gunî her gîzegîze

Be xoy gewwad û jinekey hîze

Xwardinî guwe û şerbetî mîze (Maruf 2010, 355)

Şa'îr li van dû dêran da zêdetirê cûreyek ji ladana civakî bikaraniye ku li beşên din de behsa cûreyên ladana civakî dikan.

Yek ji wan cûre Şa'îrên din jî ku li nav edeba Kurdî klasîk da bi awayeke ber bi çav hebûna heye. Li nav şa'îran û nivîskaran de girîngî û taybetmendiya xwe heye li nav civaka Kurdî jî bi taybet ew jî şî'ira (Daşorîn) ye yek ji wan cûre şî'irane hewêna ladana civakîye ku li destpêka Şî'irve heta dawiyê destpêdike bi ladanê xwe ji encama ladanê dirust dibe. Eger bi hurî temaşa van cûre şî'irên li edeba Kurdî da dibînin ji serhildana tişteki kitûpir nebûye belku li encama rûdanekî xerap ya jiyana civakîye, cûdahîya çîneyetiyê ve rû daye *An jî li navbera dû mirovên hestiyar ve kar kiriye ser şa'îr. Wate şî'ira Daşorîn: Ew şî'ire ku peyvên wan kesan dijîmêrê û pîşana wan dide. Eve jî li encama soza rik û kîne li cem şa'îr ji dayik dibe* (Şukriye 1989, 46) Wate Daşorîn pêkhatiyê ji êrîş birina şa'îrek li ser kesekî din çî ji dest bê bi peyvên neşîrîn dijûnên neşîrînên millî pêşkêş dike û bikartîne. Dr. Şukriye Resul şî'ira Daşorîn ji bo dû cûreyan dabeş dike ku her cûreyek ji wan beşekin ji ladana civakî ve ew jî ji van cûreyan pêkhatine:

1.6.9.1 Daşorîna Pêkhatên Leş

Babetê van cûre Daşorîne ji leşê ademîzad û endamên leş, her ji serî û pirç, çav û gûh û difin û dem dirêjî û çûyîn û dengî û gelekî din jî, bi qesta hêviya xwe dibe ber mezinkirina endamê kirêtî heta zêdetir derbikevê ji bo wê yekê jî jêre tê gotin *Daşorîna galte carî (henekwarî) û li rastiyê da ev cûre Daşorîne kesek azar nade û derûnê têk nade, ew kesê Şî'îrjî jêre tê xwendin aciz nabê ji ber ku bilindiya hunerê kirêtî ji bîr dibe û peyvên leş hiç ji nixên civakiya mirov kêr nake* (Şukriye 1989, 47) Li edeba Kurdî da ev cûre şî'ire hebûye lê belê awayê edebî ne nivîskî da bûye li edeba

nivîskî da jî ku destê me ketibe wekî dibêjin Nalî şa'îr li vê cûre şî'ira xwe ya ji bo Mestûreya Erdelanî gotiye. Wekî mînak:

Damênî be enwa'î gul û mil xemlabê

Gencêkî têdabê ke te lîsmî neşkabê

Huqêkî zerî safi le ser banî nirabê

Nextêkî be sed sen'etî (manî) qileşabê (Abdulkîrîm 2005, 614)

wekî mînak rêzê şî'rêkî Mehwî yê şa'îr tînin di derbarê sofîyan şî'ira Daşorînî gotiye ku wê demê sofîyan bi beşekî girîngê şî'rê vekirî û şî'rê Daşoyîn dane zanîn û bi taybetî ladana civakî.

Rîşekî pan û tukî bina guwê dirêj û lul

Sofi le dînî lade be dîmen le cu deka (Mela 1977, 35)

1.6.9.2 Daşorînî Sîfetên Dirust Kiriyan

Babeta van cûre daşorîne pişandana sîfetên xweşî û sozên kesêke *Şa'îr li nav qalibêkî şî'irî da datîne û hemû sîfetên baş ji hev cûda dike û sîfetên wekî rezîlî û tirsnokî dînî û ne zanînî û bi şa'îr ve dike ji bo nivîsîna van cûre şî'iran* (Şukriye 1989, 47-48) Li vê rêza Şî'irda Nalî di derbarê Sofî gotiye:

Rîşekey pan û dirêje bo riya xizmet eka

Vahîre herkes be gûl û erçî rîşîda riya (Mela 1977, 46)

Li mînakekî dinê Hacî Qadirê Koyî de dibêje:

Em seganey ke lay ême wezîr û kelan

Bêne lay to be xuda naykeye gawan û şîwan

Eme ker mîze delên warîsî şer'î nebewîn

Hemuwî ebidî senemin, basî meke gewrekeyan (Mîran 1986, 83).

BEŞA DUYEM Zimanê Helbestê Li Cem Nalî

2. ZIMANÊ HELBESTÊ LI CEM NALÎ

Mirov û mirovayetî bi tenê ruh û giyan li berê ser rûyê zevîne, ku xwedî ziman bin û bi ziman axaftin û guftûgoyê bikin. Ev beşa girîng li navenda hemû endamên edebê da sîstema amajeyî hatiye binavkirin ev amaje û balkişandin bi teorî perçe kirdar dide û karîneke bê sînor û bandoreke li binyatnanê peywendî û bi warên destnîşankirin û pesendkirin û berceste kirinê xistiye rû. Wekî fakterekî serekî û girîng û bi girîngiya mirov derdikevê.

Bandorên xwezayî û civakî naveroka kesayetîya mirov diyar dikin. Li rêya perçekirdarên duyem ve çalakîyên hizrî yên nû ji bo mirov dirust dike û girîngiya kirdarî tîne holê. "*Li jîngeha mirov dehan demên sedem û fakterên ezmûn û nirxandin û helwest û helsukeft hene. Ev alî tenê wiha girêdayî ye bi çalakî û şiyane mirov ve, belku faktereke ji bo papendbûna têgihîştina diyarde û çalakîyên helsukeftên civakî ve li sînorê wê derbasgeha bîr û ramana ye ku derseke civakî didiyê*" (Ferec 2013, 145) Ew şiyana xwe guncandina li nava mirov da heye û ber bi çav dikeve. Tenê ji bo danîna aliyekî û têrkirina pêwîstiyên jiyana civakî nîne, ji ber ku li heman demê da ji bo guhertinên wê ye jî" *Hemû ew babetên li tevahiya endama duyem da tene dîtin û pê digihin, wiha li mirov dikin girîngiyê bi pêwîstiyên rastiyên kesayetîyê bide. Wekî sedem û piştgir daxwaza berhelestî û hevrêyî ye ku guhertinên girîng li jiyana derûnî û civakî ya mirov da pêktên û rûdidin*" (Meçiyê 1998, 98) Eger tamaşa vê teksta helbesta Nalî bikîn, nîşandan û selmandina van rastiyane dema ku dibêje:

Kewkebî gil'e tî şahaneyî tom burhane

Ke le ser mudde'î sultanî mubîne cedele (Muderis 1976, 100)

Xweşî û nexweşî û firt û fêl û telekebazî serdema zarokî de peywendî jîngeha xwe ya bi sedema navendek ve bi dest tîne. Ev navend jî kesên mezinane, gelek car bi sedema balkişandineke rûkenî û zerdexene ye, an jî cûreyeke giriyê ve kariye nexweşî û hestên xerapan bide aliyekî û berevajî bike evîn û xweşdivîtiya xwe mezintir bike.

Nalî li rêya zimanê ve rewşê guheriye ji bo dabînkirina kesekî din heta rê bi peywendiyên bide, bi cûreyekî din pêwîstiya civakî li cem Helbestvan Nalî da dibê navenda derûnî û helwesta maddî ya civakî pê dide û pê diyar dike. Eve ye Nalî dibêje:

Nalî herîfî kes niye, Îlf û elîfî kes niye

Beyfî redîfî kes niye, herze goye, gep deka (Muderis 1976, 110)

Eger temaşa vê teksta serê ya Nalî bikîn, ew şiyar û hêz û qudreta wateyên helbestên Nalî ji bo me derdikevê. Li heman demê da dikarî derûniya Nalî û peywendiyên wî yên civakî jî bixîrî rû, bi sedema tekstên helbestan ve, sedemên guhertinên mezin û girînge ji bo geşbûna di navbera rewşa derûnî û derbirîna zimanê wî ve vedigerê. Wekî hejênerekî nû li moxda *Eve bi xwe jî geşbûneke demsala jiyane ye, li heman demê de jî erk û wezîfe demaxeke daxwaza hejandina nû bi awayeke guncaw dike. Hiç endamek ya beşeke demax geşê nake tenê li rêya wezîfe ve nebê* (Cafer 1977, 195) Wate ziman û geşbûna ziman proseyeke helbestvan li fikr û demaxa xwe ve çavkanî digre û ev geşbûna ziman jî li tekstên edebîyan ve reng dide û bi diyar dikevê. Eve ye Nalî li vê tekstê de dibêje:

Le alî eşkî Nalî bêkese xeltanî nêw xake

Meger sem'î bulit muşterî lu lu yî la la bê (Abdulkirîm 2005, 602)

Geşbûna kesayetî li geşbûna şewaz û têgihîştina bikaranîna ziman ve pêve da digre li rêya dezgehek ve jêre tê gotin gişt endamê demarî balkişandina duyem û taybet bi geşbûna bikaranîna ziman ve, eve taybete bi mirov bi xwe ve û cûdaye ji gişt endamên demarî ya balkişandina yekem, ziman û hest cûdane li ziman da abstirayk tecwîd û nirxandin roleke girîng dibîne (Ferec 2013, 55) Divê eve jî ji bîr nekîn Nalî yê Şa'îr li rêya zimanê ve kariye dahênana helbestên mezin encam bide û teksta lêhvan lêv ji ladana civakî û naveroka qedexekirî berhem bîne bi taybetî ev teksta hilgirê çemka ladanê û rexneya civakîye û heta radeyekî zêde dûrî li kevneşopiyên civakîye û bikaranîna hinek destewaje û peyv û çemk û bîr û ramanên wiha bikaraniye, ku wate û delaleta wê, didin dest ve ku teksta ladana civakî ne û xelkê asayî nikarê û newêrê van cûre axaftinan li nav civatan de û bi eşkere bike, lê belê Nalî eve bi beşekî asayî datîne û balê dikşîne ser helbestên wî da û tameke xweş jê dibîne û xwendevan jî vê tam û xweşî û hestan sûd werdigrin.

Eve ye li vê teksta helbestê de dibêje:

Bo memik Nalî çi mindalane wey wey kirduwe

Gerçî muyî wek şîre, bew şîre şikofey kirduwe

Xoş be her dû dest û dem girtuwe ye oxey kirduwe

Kîzb û tuhmet, îftiraw û buhtan ke tobey kirduwe (Abdulkirîm 2005, 552-553)

Eger temaşa vê teksta serê ve bikîn, têdigihîn ku Nalî kiye û çi şiyanekeî fantazî heye û di derbarê ziman û şiyana zimanê ve, ew peyvên hatine destnîşan kirin û bikaranîn û naveroka wê ji komek peyvên pêkhatine ku wiha li jiyana rojane û wê demê ya normal û asayî û rûyê civatan nîne, lê belê şa'îr gelek bi hêsanî bi awayeke hunerî vê

hesta xwe ji kurahiya dilê xwe ve dixwe ser perên kaxiz û nîşan dide bi vê jî ladanekî civakî pêkaniye. Ji bo eve jî sud ji ziman û wate û delaliyan wergirtiye û naverokeke hunerî ya bilind afirandiye.

Dibînîn Nalî çawa ji bo memik û çêj û tama sing û memika yar zarok dibê, hez dike bibê zarok, eger li temenekî mezin daye jî, ji ber ku naveroka delaleta pîr û temena Nalî ji bo me dixwe rû, ji ber ku Nalî dibêje (Gerçî muyî wek şîre) wate Nalî ser sipî bûye û ketiye nav temenê dirêj, lê belê hê jî hez ji sing û memikên yare û bimije, eve jî ladane ji axaftin û behsên baw û ji rêzê, eger ji bo xelkê asayî ladan bê ji dab û nerît û adetên civakî, ewe ji bo şa'îrên klasîk û Nalî jî çendîn car qedexeye û nabê, ji ber ku şa'îr bi qonaxên hucre û melayetî da derbas bûye.

Ji ber ku li gor yasaya olî û şer'î û civakî û eşîriyan ve ev cûre behskirina erotîkiyane nabê û qedexeye û ne cihê qebûlkirinê ye. Lê belê ev şî'rê Nalî herdem dest ji bo hinek tiştan dibe ku yasayên emînî û asmaniyan qebûl nakin û qedexe dikin, her eve jî şa'îran ji kesên normal yên li nav civakê cûda dike.

2.1 Zimanê Şî'îrû Zimanê Şa'îr

Ziman yek ji yekî din derketiye, zimannas lêkolîneke zêde li ser kirine û dikin li rûyî çawayîya dirustbûn û serhildana ziman, resenî û nereseniya ziman, kîjan ziman yekem zimane? ziman çawa geş kiriye, an jî guheriye... li vî warî de çendîn nêrîn hene em naxwazin behsa van babetan bikîn, belku dixwazîn di derbarê zimanê şî'îrê klasîka Kurdî Kurmancîya Xwarê de bikin.

Berî behsa zimanê Şî'îrbikîn, bi pêwîstî dizanîn helwestek di derbarê zimanê şa'îr bikîn. Lêkolînerên warê zimanê Şî'îrbi awayeke giştî ku behsa zimanê Şî'îrkiriye zêdetir beramberî di navbera zimanê Şî'îrli gel zimanê asayî û zimanê pexşan da kiriye ewê

mebesta meye cûdahiya di navbera zimanê Şîrû zimanê şa'îr bixîn rû hewl didîn li vî warî de hinek van dû zaravayan bidin axaftin.

2.1.1 Zimanê Şî'ir

Mebesta awayê wê ya giştî zimanê şî'ire, bi sedema zimanekî çir û cêgorkêya beşên riste û dirustkirina wêne bi awayeke xwestin û daxwaze... berhem hatiye dikarîn bibêjîn li taybetmendiyên zimanê şî'ir, ev zimane li zimanê asayî û zimanê pexşan da cûdaye. Li hemû rojgarek da bi rêjeya ji yek cûda çendîn taybetmendî dibê. Ew taybetmendî sîmaya qonax û xwendingeha şî'irê diyar dikin.

2.1.2 Zimanê Şa'îr

Mebest ji bikaranîna awayê taybetî ya bikaranîna zimanê şî'ire, li cem şa'îran ji ber ku her şa'îr û taybetmendîya zimanê şî'ira xwe heye. Awayê bikaranîna xwe heye lîstoka zimanê xwe heye... Ji bo wê yekê tê gotin zimanê şî'irê Nalî, zimanê şî'irê Hacî (Kerîm 2016, 186).

Ji bo ku zelaltir û runtir cûdahiyên wan derkevê, li dû xalan da cûdahiyên dixîne rû:

A- Zimanê Şî'irli gor qonax û serdeman guhertin li ser da tê, her qonaxek zimanekî şî'ira giştî dirustkiriye ku yasayên zimanê şî'irin, bi wê belgeyê tê gotin zimanê şî'irê klasîkî, zimanê şî'ira qonaxa nûkirinê, zimanê şî'ira hevçerx, ku çî zimanê şa'îr li gor guhertîna şa'îr diguhere. Her çende şiyana dahênana wan mezin bê, lê belê hê jî nikarê xwe ji hemû sîmayên xwendingehên Şî'ircûda bike, bi wan belgeyan

1- Tê gotin zimanê şî'irê Salim, taybete bi awayê bikaranîna zimanê Şî'irli cem Salim.

2- Me şa'îr heye niha jî bi zimanê şî'irê klasîkî Şî'irdinivîse.

B- Zimanê şî'ir/ awayê giştî ya zimanê şî'ire, lê belê zimanê şa'îr, awayê taybetî ya bikaranîna zimanê şî'ire.

2.2 Zimanê Şî'irê Klasîkî Kurmancîya Xwarê

Ziman li Şî'irda rola serekî dibîne *ji ber ku şa'ir li rêya ziman ve bingeha şî'irê dadimezrêne, bingeh û regezên serekiyên dinê şî'ir: Wekî: Mosqaw, wêneyê Şî'irbi sedema ziman ve têne encamdan* (C. A. Husên 2008, 89) Gelek car têgotin zimanê şî'irê Baban, yan zimanê şî'irê klasîkî Kurmancîya xwarê, ku wate pêwîst dike bipirsin, zimanê şî'ira Kurmancîya xwarê kijan ji wane? Gelo taybetmediyên wê çine? Çawa û li ku ve serî derkiriye? Gelo zimanekî şî'irê yekgirtî hebûye, an jî na? *Berî sê kuçkeya Baban (Nalî, Salim, Kurdî) şa'irên din bûye lê belê wekî tevgerê ji hêz û desthilata şî'irê awa û bikaranîna ziman û kêşa erûzî zêde berhem û hemeçêşnî babet... derneketine ji bo wê yekê ev tevgera Şî'irji Nalî û hevalên wî ve tê hesab kirin* (Şiwan Bila tarîx, 315-316) û *zêdetirê çavkanî û lêkolînan da Nalî beramberî vê tevgera edebî hatiye dest nîşankirin ji ber ku Nalî çeşnekî rêbazî ya tevgerê û danerê berdê bingeha xwendingeha edebiyatê bûye. Ji bo wê yekê bi serkirdeya tevgerê û damezrênerê xwendingeha edebîyata nû tê zanî* (Şareza 1984, 27) û şî'irên belgeya vê rastîyê diçespênin ji ber eve bi pêwîstî dizanin zimanê şî'irê Nalî li rûyê bikaranîna ziman, wekî ziman ji bo destnîşankirina zimanê şî'irê Kurmancîya xwarê bixîrîn rû. Ji bo vê mebestê pêwîste bi çend aliyek ve hengavan bavêjin û li çend rûyek ve temaşe bikîn.

2.2.1 Li Zimanê Nalî ve

A- Sedema nivîsîna Şî'irbi zimanê Kurdî: Nalî serdem û cihên jiyânê li gel mîrnişîna Baban da yekangîre ji bilî sedemên ramyarî û neteweyîya bi bikarxistina zimanê Kurdî, Kurmancîya xwarê, çend sedemeke din jî hebûye. Hinek ji wan:

1- Ziman keresteya derbirîna şî'ire: Nalî bangeşeya nivîsîna Şî'irbi zimanê Kurdî dike û ji bo wê yekê dibêje Şî'irnivîsîn bi her zimanek bê, li Şî'irbûnê naxe, belku ewê li Şî'irhebûnê dixwe wateye. Li cem wî wihaye wateya bilind û kûr ya Şî'irgewhera şî'ire bi

wê wateya pêwîste Şîrwate bexş bê û wateya wê jî bi wateyekî bilind û kûr girêdaye, li vir da dibêje:

Kes be elfazim nelê xokirdiye xo kirdiye

Her kesê nadan nebê xoy talîbî me'na deka (Abdulkirîm 2005, 103)

2- Xwe Ceribandin

Xwe ceribandina şaîr li warê Şîrnivîsîna bi zimanê Kurdî, şîyan û jêhatiya şaîr û rêka şikêna wî wî zimanî digihîne, ji ber ku *Dixwaze xwe biceribîne, bizanê tiştêkî nû ji dest tê. Berî niha kes dest ji bo van cûre nivîsîna nebiribê, ku Şîrgotin li ser erûza Erebî bi zimanê Kurdî, yan na* (Abdulkirîm 2005, 103) Li vir da dibêje:

Kiteb'î şekkerbarî min, Kurdî eger însa deka

Îmtîhanî xoye meqsûdî, le emden wa deka (Abdulkirîm 2005, 168)

B- Sedema Bikaranîna Wateyên Biyanî Li Cem Nalî:

1- Zimanzanî û Ziyadkirina Desthilata Şîr

Nalî ji bo wê yekê ku şîyan û jêhatîbûn û zimanzaniya xwe û siwarbaşî li honîna Şîrda derdixe, zimanê Kurdî wekî zimanê xwe yê zikmakî û zimanên cîranan wekî zimanê rewşenbîrî û olî... li gel xwezaya siwarbaşî û tîjrewî û rewaniyê têkilhev dike. Bi vê karê jî mulkekî din dixê bin hukimraniya xwe. Wekî li vê tekst û dêra Şîrda derdikevê

Faris û Kurd û Ereb her sêm be defter girtuwe

Nalî emro hakimî sê mulke, dîwanî (Abdulkirîm 2005, 582)

Ewê heta niha eşkereye û Nalî bi xwe jî li şîrên xwe da bi karaniye ji bilî li zimanê Kurdî peyva li Erebî û Farisî û Tirkî jî wergirtiye. Her çende ew tekez li ser Tirkîyê nake û amaje ji bo Tirkî nekiriye, lê wiha daniye (Hakimî sê mulke) û sê ziman

li Şîrda hatiye bikaraniye, ew jî Kurdî û Erebi û Farisî ye. Sedema bikaranîna zimanan jî rûnkiriye û gotiye:

Ya le meydanî fesaht da be mîslî şehsiwar

Bê tehemmul bew hemû new'e zubanî radeka (Abdulkirîm 2005, 105)

Nîşandana siwarbaşî û zimanzanî li meydana şîrê klasîk da (neku tenê li cem şa'îran dengvedanekî xwezayî rewşa rewşenbîrî serdeman bû" *Belku li ber wê yekê nivîsîn bi çend zimanek bû ku şa'îran şanazîşiyê pêve dikir û bi nîşana zanayî û şarezayîya xwe dizanin* (Kemal 1986, 76) Ewe jî bingehêkî dinê şîrê klasîka Kurdiye û şa'îrên klasîkî Kurd – Kurmancîya xwarê - jê derneketine û peyrew kirine.

2- Şîrji Bo Şander (Wergir)

Wergir temamkerê karê edebîye ziman sedeme ji bo derbirîn û têgihîştina sedemeke dinê bikaranîna zimanê biyanî li cem Nalî Şîrji bo şander – wergire ji bo wê yekê şa'îr dibêje:

((Gel)) eger Tirkî taal eger Erebi

((Bê)) eger Kurdî eger Farisî ((biya)) (Abdulkirîm 2005, 123)

Li vê dêrê da çar riste ferman li forma peyvê da dibînîn bi zimanên, Tirkî, Erebi, Kurdî, Farisî, her wiha li gel sedema bikaranîna wan, ku ji bo Şîrji bo şander, wergir vedigerê.

2.2.2 Bi Hûrgilî Li Şîrên Nalî da

1- Bikaranîna Peyva Şewezarên din:

Nalî bi sedema şarezayî li şewezarên zimanê Kurdî da, kariye zimanekî şîra yekgirtî nivîsîn berhem bîne, li nav şîrên xwe da hest bi vê hîlbijarde peyva şewezaran dike (Şareza 1984, 37-46) wekî mînak:

A- Bikaranîna Cênawî Ya Kesê Yekem (ez)ê Kurmanciya Serê:

Nalî li piştî serekiya şî'irek da cênawî (ez)ê Kurmanciya serê bikaraniye li şûna (min) ya Kurmancîya xwarê, navçeya Silêmanî dibêje:

Xaw û bê xawî du zulfî xawim ez

Çawe çawî yek xezale çawim ez (Abdulkirîm 2005, 232)

B- Bikaranîna Awelfermanî (lekn) Soranî û Mukriyanî, Li Şûna Awelfermanî (Lela) ya Silêmanî, ji bo nêzîkayetî û dirustkirina zimanekî şî'irê yekgirtî, Nalî li hewlên xwe de berdewam bûye û li vê mînaka xwarê da awelfermanî (lekn) ya bikarxistiye, li şûna (lela), wekî dibêje:

Lekin to xar û xes gilzare bê min

Lekin min xermenî gul xare bê to (Abdulkirîm 2005, 392).

2.3 Nêrîna Lêkolînan Di Derbarê Zimanê Yekgirtî Ya Şî'irê Klasîkî û Hewlên Nalî û Hevrêyên Li Warê Şî'irda:

Nalî û hevrêyên wî bi danerê berdê bingeha vê hewlê tê danîn, lê belê navê Nalî li pêşiya hevpişeyên xwe hatiye hejmarkirin. Li xwarê ve hinek ji wan nêrînan dixîne rû:

1- Dr Îzet Mistefa Resûl dibêje *Hunermendî û hostayî damezrênerê ve xwendingeha edebîye, şiyaneke wiha bexşî bi wêje xwe ku zû belav bibê û baş biçê dil ve û karbike ser şa'îrên navçeyên dinê Kurdistanê û ew dengê li Silêmaniyê ve bilind bûye, dengvedana wê jî li yekem pileyê da li navçeya Soran ve bû. Komelek şa'îrên din navçeya Sine û Mukriyan her bi vî awayî nivîsîne, ku Nalî û hevalên xwe nivîsîne* (Resul 1971, 32-33) Ev nêrîn navçeya Soran li pileya yekema bi bandor dizanin û paşê navçeyên Sine û Mukriyan dixê pişt wê, her wiha navê Nalî li pêşve û bi serbixwe tîne û hevalên wî yên wekî (Salim, Kurdî) tenê bi hevalên Nalî tîne bi nav kirin. Wekî eweye bibêjê Nalî serkirdeyê wan bûye.

2- Dr. Osman Deştî "Li vî derbarî de dibêje (ziman û şêwaz û hunerên şî'ira vê xwendîgehê bû bi modêla Şî'îrû edeb li hemû navçeyên Kurdistanana xwarê, bi taybetî li navçeya Mukriyan (Deştî 2009, 33)

3- Kerîm Şareza - di derbarê Nalî û zimanê yekgirtî ya şî'irê klasîkî de dibêje (Nalî wekî hengêk bûye, bi navê gulzara peyvên xweşik û resena Kurdî ketiye û li her gule helaliyekî edeba Kurdî şî'îrî wergirtiye û hingivîna şî'îrên xwe pê dirustkiriye. *Li hemû aliyekî Kurdistanê, bi taybetî Kurdistanana Iraqê û zêdetirê Kurdistanana Îranê, şa'îrên duyem û sêyemê vê xwendîgehê şî'irê hunerî şî'ira klasîkî Kurdî lê dîrok ve û Nalî û şî'irê Nalî kirine bi pêşiya peyrewê li Şî'îrgotinê da* (Şareza 1984, 27) Ev nêrîn tekez li ser şaşıyên Nalî dike, ji bo dirustkirina zimanekî şî'irê klasîkî û çawayiya dirustkirina vê zimanê, her wiha peyrew kirina vê zimana şî'ire li cem şa'îrên Kurmancîya xwarê.

Piştî wergirtina van nêrînên serê, bi pêwîstî dizanîn bi hurî di derbarê nêrînên giştîyên zimanê şî'ira klasîka Kurdî bidin axaftin.

2.4 Sê Nêrînên Girîng Di Derbarê Zimanê Şî'îr

2.4.1 Zimanê Şî'îr û Çek

Wekî pêştir jî me behsa peywendîya di navbera ziman û Şî'îrda kir. Ewe ji bo me rûn bû, ku Şî'îrwate ziman, zimanê şî'îr, zimanêke xwe ji çekê atomî da dibîne. Diyarîrîn şa'îrê hecuwî şî'irê klasîka Kurdî Kurmancîya xwarê, wekî eşkereye, Şêx Rizayê Talebanî ye, ji bo wê yekê nêrîna vî şa'îrî di derbarê zimanê Şî'îrû çek dixîne rû: Şêx Riza li çendîn cîh li şî'îrên xwe da behsa zimanî kiriye. Li vê dêra xwarê da ziman wekî çekek dikevê berçav.

To hete tîxî deban û min heme tîxî zeban

Ferqî em dûtîxe herwek asman û rêşman (Dr:Talebanî 2001, 33)

Li vê dêrê da raste rast di derbarê cûdahiya di navbera çekê asayî û çekê zimanê Şîrîdide axaftin li heman demê da beramberî dike û dinirxîne. Cûdahîya wan bi dûrî di navbera zevî û asman dinirxîne û hejmar dike. Bi vê yekê jî dikarîn bibêjîn zimanê Şîrîcem Şêx Riza, bi vî awayê ser ve çekekî kuşindeye, wekî çekê atomî ye. Ji ber ku ji bilî li navbirina paşmayeke xerap jî bi cîh dihêle.

2.4.2 Zimanê Şîrî û Zimanê Şîrînî

Ji berê de mirov hest bi wê yekê kiriye, ku hinek peyve û gotin hene, bi hêsanî bandorê li ser wergir dirust dikin û rêzdar û şîrîn derdixin. Ji bo wê yekê herdem li hewla ewedabûn, bi wê zimanê ziman şîrîn bibê, pêşiyên me li vî derbarî de çendîn pend û pêşgotinan gotiye. Wekî mînak (Mar bi axaftinên xweş ji kun derdikevê, an jî Axaftina xweş ji bihûştê hatiye...

Zimanê edeb bi giştî zimanê Şîrîbi taybetî zimanekî hestiyar û peywendî bi zimanê şîrîn û çawayîya muamelekirina li gel ziman da heye. Eve jî vedigerê ser şa'îr û bi şa'îr ve peywiste. Bi wê wateya heta çend hewl daye kar bike. Şa'îr li edeba klasîka Kurdî da bi giştî di derbarê zimanê şîrîn axaftine û zêdetirê wan xwe bi zimanê şîrîn dane zanîn û li bin zaravayên cûda cûda heman wateya zimanê şîrîn heye. Li vir da bi pêwîst dizanîn bi vî awayî jî bibêjîn:

2.4.2.1 Zimanê Şîrîn, Şîrînî Ji Bo Ziman

Xwestekî derketiye, wate wekî hengivîn yan qend an jî şekir... şîrîne, bi sedema hestguhertineke hestî encam daye. Ji ber ku şîrînî ber hestê tam kirinê dikevê. Lê belê ewê li vir da tê behs kirin îdyome. Zimanê şîrîn bi wateya zimanekî çêj û tam bexş û

dirustkirina bandorê li ser guh gir tê. Çend mînakek di derbarê zimanê şîrîne şaîran li xwarê dixîne rû:

1- Salim - Nêrîna Şaîr Salim wiha ye şîrîne klasîk zimanê şîrîne, hemû tişte li dirustî û sîfeta xwe têkbiçê, nabê ziman li şîrîniyê bikevê. Wekî li vê tekst û dêrê da hatiye balkişandin û dibêje:

Demim tal û siruşkim şore dayîm

Tirş rûm û qisem şîrîne bê to (silh 2015, 251)

2- Mela Osman - Şaîr li çendîn dêr û tekstên Şîrîda, behsa zimanê xwe yê şîrîn kiriye, ewê li vir da me wergirtiye, ziman şekir û zêr, zimanê xwe yê şîrîn bi hingivîne bê xeş çandiye, wekî dibêje:

Şekir rêzin qisem wek şehdî fayiq

Hiçus bo medhî mehbub çelengim (Abdulkirîm 2005, 324)

3- Zimanê Şîrî Ciwaniya Şîrî: Beşek ji şaîrên klasîka Kurd dijuna bi Şîrîve dibestin, wekî ewe ye bibêjin Şîrîwate ziman, an jî hêz û bandora Şîrîli zimanê Şîrîda xwe derdixê. Ji bo wê yekê nêrîna wan wiha ye pêwîste Şîrîzimanekî kurtbir û pir bi pêsta babetê bê û wateyekî berfireh û ciwan bide bi dest ve, wekî li van mînakên xwarê da derdikevin.

A *Nalî eceb be quwetî hikmet eda deka*

Me'nayî zor û gewre be lefzî kem û biçûk (Abdulkirîm 2005, 269)

B *kem kurt be adet çake emro*

Xezel husnî lewaye muxteser bê (Abdulkirîm 2005, 273)

Ziman dergeha çûne nava rastiya civakê ye, her çende bîrmendên sosyolojîya ziman naxîne xaneya têgihîştina tevgerê ve, belku rola girîngê guncandina bîr û ramanan pê dide.

Li nêrîna kêşeyên civakî û kirdarî têkilhevbûne mirov tenê li dinya babeta hebûn û çalakîyên civakî da da najî, belku li gel min jiyar û jiyar da girêdayî bandorên zimanin li rûyê fikrî û hilçûnê ve ji bo wan hemû pêşhatane berev rûyê civakê dibe li rêya amraza daxuyaniyê ve, bi daxuyaniyê behsa wê dike *Mirov nikarê bê bikaranîna ziman bi awayeke cewherî li gel dewrûberên civakî da bisazê û hilbike. Her eve jî dibê sedema ladan û dest birine ji bo yasa qedexe kiriyên nava civakê da. Ji ber ewe ziman fakterekî zîndî bîrkirine û zalbûna astengên civakî ne* (Ferec 2013, 61)Ewê hêjayî gotinêye her zimanek sîma û xeslet û taybetmendîya xwe heye, ji ber ku heta niha tu cûre lêkçûnekî tevahî me li navbera dû ziman da nedîtiye, ku heman sîma û xeslet têda hebê. Ji bo wê yekê rastî li nava ziman ve bi awayeke xorisk daxwaza helwest û pêşxistina wan dikevê.

Wate bi awayeke giştî li dawiyê de dikarîn bibêjin: Ziman li cem Nalî yê şa'îr bi wê taybetmendî û xesletane li şakarên xwe da bikaraniye bi awayeke cûda, veqetayî û taybet, dahêner, fantazî, delalet... hwd, li rêya mayinê ve bi awayeke raste rast bi sitûnîyeyê ve bi rastiya civakê ve kariye ji wê pêgehê ve rewşeke hizrî û derûnî û soz û evînî rave û xeyal û endêşeya dahênerên wê hest û nest û ... hwd, heta bike berde bazî gihîştinê û karek li navbera xelk û li navbera dariştina awayê zimanek ji bo neteweya xwe bike. Heta bikarin pê binivîsin û pê bixwînin û pê bipeyvin û axaftinê encam bide. Çendîn helwestên civakî, olî, rexneyî û nerezayî, ladana civakî û hec û stayş ... hwd li gel tevger û moralê, waneya erênî û neyînî bi sedema ziman ve rol pêdane û berhem anîne. Bi vê jî wiha kiriye, îro hêsanî kar û axaftin û behsa bi dûvdaçûnê hebê. Nalî yê şa'îr dû çavkaniyên serekî kiriye bi fakterê tevgera bikaranîna zimanê Kurdî.

2.5 Çavkanîyên Zimanê Şîrîn

Diyar kirina çavkaniyên zimanê şîrîn bi awayeke giştî li cem şa'îrên klasîk dû çavkanîyên xwe heye. Wekî wê yekê ku me li xwarê destnîşan kiriye:

1- Xweza û siruştî zimanê şîrînê şa'îr : Nalî peyva şekirbarî ji bo siruştî Şî'îrîvîsînê bikaraniye. Şekir wekî eşkereye çavkanîyeke girîngê şîrîniye û şîrîn kirina tişteki ji şîrîn kiriyane. Ew kaniya şî'îrên Nalî ji wê ve çavkanî werdigre, awêteya şekire, wekî dibêje:

Teb'î şekker barî min Kurdî eger însa deka

Îmtihanî xoye meqsûdî le emden wa deka (Abdulkirîm 2005, 102)

2 - Yar (Şî'îra pêşkêşkirî) - yar an jî Şî'îrpêşkêşkirî û çavkaniyeke serekî ya zimanê şîrînê şa'îre. Şa'îr îlhama zimanê şîrîn ji wê werdigre, wekî wê yekê şa'îrên klasîka Kurd ji wir ve dide axaftin û wiha bo diçin, kesê behskirî li şî'îrê da şîrîne, ji bo wê yekê şa'îr bi vî zimanê şîrîn li vî derbarî de diaxive. Li xwarê de mînakek dixîne rû:

Edeb : Şa'îr yar dike çavkaniya zimanê xwe yê şîrîn, ji ber ku endamê leşa yara wî şîrîne û di derbarê şîrîniya wê ve dipeyve. Ji bo wê yekê zimanê şîrîn derdikevê. Li vî warî de rû li yar dike û dibêje:

To lebit şîrîn û xot şîrîn û qamet şîrînî

Boye wa nutqî edeb şîrîne bo tekrari to (Abdulkirîm 2005, 170)

2.6 Nalîyê Şa'îr Dû Çavkaniyên Serekî Kiriye Bi Faktera Tevgera Bikaranîna Ziman

1- Agahî li şaristanî û marîfeta berbelava wê serdemê û serdema dîrokîya pêşiya xwe

Eve bi fakterekî girîng tê zanîn ji bo bi hêz kirin û geşbûna ziman, niha jî bandora wan aliyan bi dîrokî rewşenbîriya me ve diyare bi wê alî ve li civaka rewşenbîriyên din ve anîne neku zarave û destewaje. Ji ber ku ew li nav ziman bi xwe da hebûn, evî mezinî kariye awayê dahênana xwe bîne nav ve.

Yek ji wan sedemên kar li ziman dike bandora bindestî û serdestiye li vî derbarî de nekû tenê Kurd, belku hatina îslam ji bo navçeyê wiha li Tirk Fars û Kurd kir eger zimanê wan neguherîne bi Erebi, wêde gelek peyv têda çandine bandoreke zêde li ser bi cîh hiştine û rewşenbîriya wê kirine bi rewşenbîriya Erebi îslamî.

Zanayên antopolojiyê wiha didin zanîn asta rewşenbîrî, an jî şaristaniya civakê bi têkilheviya peyvên derekî tê pêvan kirin li civakeke din ve, wate li civaka yekem hatiye wergirtin. Ji xwe eger ziman bi wê radeyê berfireh bê karê sepandin û bandorê li ser ve nebê, wê demê civak dikarê çavkanîya bandora şaristanî rewşenbîriya derekiya xwe zêdetir geş bike û berev pêş bibe. Eve jî li cem Nalî yê şa'îr tê dîtin û hewl ji bo ewe daye û rû daye her wekî li vê teksta Şî'îrda dibêje:

Egerçî Kurdî şarezûrî qeswetim emma

Wesîlem ge îbe û hilmî şefî û feslî mininane (Abdulkirîm 2005,

517)

2- Guhertinên Xwe

Ziman tenê li bin bandora derekî da naguherê bi heman baweriyê dike ser fakter û xwediyên jî bê bandora xerîbî, faktera ewe heye li ziman da xwe bi xwe diguherê eve jî diyar bê wekî bîrmendên zimanevaniyê dehan navên lojîst û pêkhatên dengîyane ku li hinek ziman da rû didin *Wate hêza xwe û fakterên nest û hestiyên ji kurahîya şa'îr sedemên bandor û girîng ji bo dahênana zimanevî taybet û zîndî ji bo tekstan, çûnke Şî'îrû pêkhatên şî'îriyan axaftin û guftûgokirine li gel kurahîya dil û xwe bi xwe, ji bo wê yekê hilgirê civakê peyv û destwaje taybetin bi nest û babet û behsên kipkiriyan hundirê mirov û derûniyê ve* (Abdulkirîm 2005, 62-63)

2.7 Dahênan Li Şî'îrê Nalî Da Li Nêrîna Ladana Civakî ve

Bi kurtî dîroka serhildana dahênanê

Dahênan û behs û xwesta dahênanê li her warek û li warên jiyane bê, ji xwe ve ji valahiyek ve dirust nabê û pêknayê, ji ber ku dahênan berhema têkoşîn û bîrêjî û selîqeya ciwan ya paşîneyekî dûr û dirêjê rewşenbîrî ve tê. Lê belê her warek li gor pêkhat û mekanîzma taybetî û kereste û pêdiviyên xwe dibe. Ji bo wê yekê ewê li vir da em dixwazin li ser bipeyvin û axaftinê li ser bikînan dahênana edebîye. Wate dahênan li gor tekst û deqa edebî li nav teksta edebî da jî kar li ser Şî'îrîli cem (Nalî) de dikîn.

Bîr û nêrînan zêde li ser dahênan û warên dahênana hunerî û Şî'îrû warê zanistî û zanistên xwezayî û teknolojîyan da heye *Ji berê de girîngiyê zêde li vî warê de hatiye dayîn bi taybetî ji aliyê psikolojîyê ve, ji bo wê yekê tê gotin dahênan pêkhatiyê ji peydakirina peywendiyekî eşkere, yan nihênî li navbera dû kereseyên maddî, an jî li navbera dû rayên berbelav da* (Ferec 2013, 39) Li gor hinek ji nêrînan, dahênan zêdetir diyardeyekî psikolojîke, hîç peywendiyekî bi laş û ceste ve tune *Ji aliyekî din ve hinekî*

din wiha dibînin ku dahênan, kirdarêkî moxî ya cesteyî maddîye û kirokeya civakî û rewşenbîrî bi dest ve aniye (Ferec 2013, 40) Wate dahênan wekî proseyeke li cem mirov û mirovayetîyê û dîrokeke xwe ya kevin heye. Ji ber ku dahênan berhemê hewl û têkoşîn û keda û hêvîbûna çemkê mirov bûne.

Ji berê de dahênan zêdetir ji berhemên efsaneyan ve hebûna xwe hebû xwe peyda dikir *Wekî kevintirîn jandên edeb, ji ber ku tê gotin, efsane destpêktirîn û kevintirîn û mezintirîn dahênana mirove û mirov ji destpêkê ve hêviya xwe ji bo efsaneyan biriye. Ji bo wê yekê dewrûbera xwe binasê, dawiyê de hindî ji efsane çûye pêş û dahênanên mezin têda kir* (musên 2007, 33) Dahênanên cûr bi cûrên, wekî çareserî kêşeya aliyek ji aliyên jiyana mirov li gel hebûna mirov da hatin. Rolekî xwe ya bi bandor dîtine, ev pêşketin û teknolojiya li vê serdemê da dibînîn, yan hemû ew danerên edebiyên cûr bi cûrên îro hene li bunekî sade û sakar ve çavkaniya xwe girtiye.

Wate dîroka serhildana dahênanê peywiste bi dîroka ji dayikbûn û hebûna mirov û civaka mirovayetî li ser vê zemîne. Her li dirust kirina tiştên sade û destpêkî, wekî amêrên xweparastina ji dirindeya mezin û amêrên nêçîrê ji kevir û berd û dar û kel û pelên pêwîstê ajal ji bo xweparastina ji germa û serma û xwedapoşîn û xwarin û xwarina wan ya rojane, heta wekî derketina efsaneyan û edebiyata folklor û ser zimanê xelkê paşê ji bo hemû cûr û jandeyên edeb û serdeman.

2.7.1 Dahênan Wekî Zarava

Zaravaya dahênanê bi sedema, dengên cûda û nirxandineke zêde proseyeke li warên cûr bi cûr da, civak awayê bikaranînê cûdahîya xwe heye li nav zimanên cûdayên cîhanê da *Zaravaya dahênanê beramber bi peyva (Creativitin) zimanê Înglîzî û (Abida) ya zimanê Erebi radiwestê. Peyva (Creativitin) bi wê rengê ve ketiye nav ferhenga zimanê Îngilîzî, ji ber ku dû zaravayên din hebûn, ku heman amajeyan dida. Ew jî pêkhatibûn ji zaravayên (Greton, Grativeness) (Melazade 2001, 29) Watezaravaya*

dahênanê peywiste bi dahênera xwe ve û jê cûda nabê, taybete bi karên hunerî, lê belê eve nayê wê wateyê ku ev zarava heman wateya wê dahênanê dibexşê ku taybete bi xweda, belku dahênana riha tenê ji bo xwedaye. Ji ber ku xweda dahênerê rihaye (Alxaliq Almegliq) (Melazade 2001, 31) Wate dahênan yan afirandin selmandina tiştêk, yan babetekî nû ye, nêrîneke nû ve ji bo wê tiştê yan wê babeta berê nehatine zanîn û nenasîne (Roşna 2001, 47)

Dahênan bi hemû cûre û li her warekî cûda bê, pêwîste pê tiştêk bê hêjayî ewe bê pê bêgotin dahênan, bi taybetî li tekstê edebî da, ji ber ku hemû karekî edebî pê nayê gotin dahênan û naçê xaneyê dahênanê ve.

2.7.2 Çemk û Pênaseya Dahênanê

Pênase kirina her babetek li rastiya xwe da li qalib girtina vê babetê ye, bi wateyekî din nabê û estema çemkî dahênanê li pênaseyek da kombikîn û li warek da girê bidîn û dergehê li ser bigrîn. Ji bo wê yekê ev çemka (dahênanê) hilgirê çemk û pênaseyên cûda û aloz û cûr bi cûre ji hemû waran ve. Ji ber ku xwe nadê destê yek rehendê û wate û delaletê ve, ji ber wê tenê mulkê kesek û teorîyek û rêbazekî diyarkirî û sedsalek û çerxekî demê ve girêdayî nîne. Ji ber ku *roj bi roj dibînîn berhema dahênrayî pir girîng û pêşketî tê berhem anîn. Hê jî yek ji tevahiya şareza nebuyîn li aliyekî din ve çend berhemekî dinê pir girîng û sosret tîne holê û ewê pêş xwe ya kevin dike û bi awayeke endazeyekî teknîkî nû ve tê hole* (Saleh 2009, 26) Wate dahênan tiştêk nîne, yekbar û bide û êdî tevahî dûbare nabê, nexêr belku proseya dahênanê proseyeke peywiste bi jiyayî û jiyarê mirov ve, heta weku jiyayî û mirov û candarên li ser vê cîhanê hebûna xwe hebê. Dahênan û çemka dahênanê berdewam dibê û xwendineke nû û guhertin li ser da dê li rûyê çendîyetî û çawayîyê ve. Eger temaşe bikîn nêrînên kevin cûdaye li gel nêrînên nûxwazan yê ji bo dahênanê *Materyalist li gel îdealîstan ji hevdû cûda ne, her wiha pênaseya pizîşkan ji bo dahênanê ji pênaseyên din cûdaye, bi wê wateya ku heye li warên dinê wekî: Felsefe û derunzanî û ol û edeb û huner... hwd* (Melazade 2001, 37) Şaîrek, yan nivîskarek, yan edîbek ji nêrîn û dîtina edebî ve û

nêrîna amar û îstatîstîkan ve pênaseya dahênanê dike û dixê rû kar li ser kêş û serwa û musîqaya nave ve û wêneya hunerî û edebîyan ve tekstê şî'irî dike û dahênanê têda encam dide, ji bo wê yekê têgotin *Dahênan berhemana taybetî ya mirove ku peywîste bi yasayên xwezayê ve. Berhem anîna xweza û siruştê pîşe berhem tîne, û hemû pîşeyek bi sedema berhem û raman û bîran ve û amadebaşiya siruştîyan ve tê* (Melazade 2001, 40) Ku hineke dîn li wê baweriyê de ne ku dahênan berhemê bîr û keda û jê zanîn û zîrekî û asta rewşenbîrî û pêşxanekî dîrokî û siyasî û kultûrî û olî û civakî û aborî... hwd ve heye. Ewê ku dahêner heye û bi sedema wê ve dahênanê encam dide û dibê kesekî dahêner.

Hinekî dinê ji lêkolînerên warê edebî û rexneyî edebî dahênanê dibestî bi halet û diyardeyên derunîyan ve, ji ber ku dahênan li cem wan pêkhatiyê ji berhemê karekî di navbera (Ew Id) û min (Ego) û minê bilind (Suboregon) dahênan jî li rêya çespendina min dibê heta min li ser rûyê agahî û pêş agahiyê wenda dibê (Cadu 2004, 25) Wate li gor vê pênaseyê dahênan peywendiyekî bi tîn û bihêz heye li gel vê tiştê nihênî û veşartîya li nav kûrahîya mirovan ve heye, ji ber ku bi taybetî piştî derketina xwendîngeha derunîyê li ser destê (Froid) ve, êdî lêkolînên edebî çûne warekî din û di dema nirxandinê û şîrovekirina tekstan. Ji ber ku êdî şorbûna nav kesayetiye veşartiyê duyema mirov, ku kurahîyê û hesta wî ye, ji teksta de rengvedana kûrahî û hest û soza nav ve û derveya şa'îr û jî wir ve komek wêstgehên jîyanê nivîskar ji bo me keşif dibê û jûrên tarî yên girtî vedikîn û xwendevan pê aşîna dibê û peywendî (tekst-xwendevan) serî hildide.

Her çende hinek ji zana û lêkolînerên edebiyat û dahênanê bi sîd û tam û çêjê ve girêdidin, wate eger berhemek sud ji bo xelkê û civakê û mirovayetiye nebê, nabê jêre bê gotin berhemekî dahêne ye, an jî dahênanê, ji ber ku dema xwendevan dixwîne bandor li ser da dirust nabê *Wate hîç sudek nagihîne, wiha dizanin ku dahênan û çemkê dahênanê nabê li ser berhemek bê danîn ku berhemekî bê sîd bê, yan berhemek bê nikarê rizamendiya hejmarekî zêdeya xelkê ji dem û cîhekî diyarkirî da pêkbîne û ferahem bike*

(Abdulazîz 2006, 87) Ku wate nikarîn hemû berhemek bi dahênan bidin zanîn. Her wiha ji aliyê civakê ve hêjayî rizamendî û qebulkirinê bê û sud bibexşê, êdî dibê bi dahênan.

Wate dahênan bi xwe kirdarekî jîriye, peywîste bi şiyayên xwediyê kesayetîyê ve, bersîv û karvedana mirove ji bo helwesta xweşî û nexweşî û nehametiyên jiyân û jiyariyê ve, hemû mirovek xwedî behreyekî taybet û veşartîye ji bo dahênanê, lê belê pêwîste piştî mekanîzma çawayîya peydakirina vê behreya îlahiye da bigerê û bi dest bîne.

2.8 Dahênan Li Cem Nalî Li Nêrîna Ladana Civakî ve

Nalî yê şa'îr yek ji wan şa'îrane herdem pênuşa xwe bi bê berhemana tekstekî dahênerane nenivîsiye, bi wateyeke din ewê teksta şîrên Nalî ye, wiha kiriye Nalî bi wê mezinbûnê ve binasîn û derbikevê, wate tekstên Nalî hilgirê çemka dahêneranene û li nav xwe da li nav proseya dahênanê da xwe peyda dike, ji ber ku serpaweya Şîrîli cem Nalî şa'îr tenê çavkanîyek nîne û dawî pê bê û xwe li yek warê yan yek alî û mijarê diyar kirî de peyda bike û bizivire, Nalî nêrîneke cûda ji bo hemû diyardeyekî dewrûbera xwe heye. Her wiha li aliyê din ve behreya xwerisqîya îlahî Nalî û aliyek bûna eşq û evînî û me'şûqêkî wekî (Hebîbe) çavkanî û îlham bexşekî bandor û ber bi çav heye, ji bo tekstên dahênanên Nalî, ji ber ku hêza evînî bihêztirîn û bandortirîn hêz û uzeya şîyan û behreya şîrê Nalîne, ji bilî van ezmûna şa'îr û temen û têkilhevbûn û kesayetîyê civakî û bandora xwe bi xwe wate Nalî, ezmûna jiyana xwendîngehekî bê mamosta û fêrgehekî baş û gelek pêwîst û girîngê jiyânê ne ji bo mirov û mirovayetiye, Nalî jî xwedî ezmûnekî dûr û dirêjê jiyânê û jiyarbuye, ev hemû jî bûne paşxanekî rewşenbîrî olî û civakî û siyasî û kulturî û hwd, bi vê jî li Şîrû ezmûnên şîrê Nalî da reng daye û bûne tekstên dahênerane û zîndibûnê bi tekstên şîriyan bexşîye. Ji bo wê yekê tekstên şîriyên Nalî ji bo hemû serdem û zemanek diguncê û dest dide, her ev taybetmendîya şîriyaneye, wiha kiriye tekstên şîriyên Nalî bi tekst vekirî bimîne, ji ber ku tekstên dahêneraneya Nalî yê şa'îr jî dahênera.

Her wiha dîmenên keş û hewa û siruşt Kurdistanê û dîmenên dil firehên deşt û deverên Kurdistanê û kanî û rubar û çiya û dar û berdên vê Kurdistane çavkanî û sedemeke dine îlham û dahênane şî'iriyên Nalî ne, bi taybetî dîmenên ciwanên demsala biharê, eger temaşa vê tekstên şî'irê bikîn selmandina rastîya axaftinên me yên li ser ve ne:

Her çaweyê kewşik û eqîmî bulendiye

Wek teb'i min be nezmî xoşî nexme zayewe (Abdulkirîm 2005, 559)

Wekî dibînin karîgerî dîmenekanî sruşt u behar ciwanî keş u heway em werze Leser şa'îr diyarew delêt : karîgerî sruşt teb'i şa'îrîmî jiyandewe u hestî şî'îrî bzuwandûm u kaniyawî şî'îrî teqanduwetewe .

Her wiha ji bilî van sedeman bandorê û lasayîkirin û sud wergirtina Nalî li şa'îr û kesayetî û nivîskar serdema jiyana xwe ya bi taybetî şa'îrên Faris û Tirk û Ereb, ku bandoreke kêr heta zêde li ser paşxana rewşenbîrî Nalî û kesayetî û hunera şî'îra dahênana Nalî hebûye û kiriye. Lê belê li gel eve da jî jiyana û ne hemwariya jiyana û jiyara Kurdewarî û mîrnişîna Baban û tevgera rizgarîxwaziya Kurd sedem û pêwîstiyekî dinê dahênane şî'iriyên Nalî ne û li nav tekstên şî'irên wî da reng daye û tekstên wî bohn û berama jîngeya Kurdewarî û kêşe û girift û nexweşî û xweşî û şadî û hest û soza take kesekî Kurd pêve diyare û reng daye û bûne hewêna tekstên şa'îr. Li cîhana Şî'îrû huner û edeba Kurdî da jî mînakên bilind û dahênanên heye li nav wan da heta îro Nalî bi asmanê dahênana şî'irê Kurdî ve diyare. Eveye (Nalî) dibêje:

Dexîlît bim eto nexîlî yarugabî

Weha şî'îrîn sîne nerm û dil req (Abdulkirîm 2005, 252)

Lê belê Nalî yê şa'îr bi xwe eve dûpat dike, ku wiha sivikatî û lasayî bi kesî nekiriye û ew bi xwe şa'îrêkî bilîmete û dahênere, ew bi xwe dibêje " ez nebûme pêveka

hîç şa'îrekî din û tenê dahênanîm li ber ronahiya berhemên şî'iriyên xwe da min encam daye. Bi tenê, Emîn Feyzî Beg jî di derbarê Nalî de heman nêrîna xwe heye û bi kesekî dahêner daye zanîn. Ku dibêje: Zekatî Nalî înkâr nakirê, lakîn ewendey senay'î le xizî îstî'mal kirduwe, piyaw renga bilê şî'rî ew netîcey îlm û îştîxale (Feyzî 1982, 26)

Eveye Nalî dibêje:

Nalî herîfî kes niye ulf û elîfî kes niye

Beytî redîfî kes niye tefrîqe nûse gep deka (Xeznedar 2010, 44)

Guman li wê yekê nayê kirin ku Nalî sivikatîya şa'îran kiriye *lê belê sivikatî û lasayîkirin tenê ji bo ewe bûye, ku şiyana dahênanê pê bihêz bike û tekstên kevinê lasayîkiriyan bi cîh bihêlê* (Kerîm 2016, 14) Sud wergirtin û kar lê kirin û kartêkirina li navbera şa'îran da karekî asayî û pêwîst bûye, ji ber ku edebêk peyda nake ji valahîyê ve çavkanîya xwe girtibê û ji xwe ve dirust bibê. Lê belê divê şa'îr li vê sud wergirtinê tekstekî nû û dahênanekî nû dirust bike.

Ladana civakî sedemekî girîng û diyarin li tekstên Nalî da, bi taybetî tekstên dahênanî, ji ber ku ev ladanane tenê ladanekî asayî û ji xwe ve nîne, belku beşekî zêdeyê van ladanên civakî peywendî bi hest û nestên komkiriyan kûrahiya dilê şa'îre, bi taybetî hest û nestên seksiyên şa'îr bi xwe ye, bêguman ev hestên li şî'irên Nalî da reng vedane û hebûna xwe heye, ev ladan jî ji bo şî'îrekî klasîkî wekî Nalî diyar û ber bi çav li nav civakê de tiştêkî hêsan û ji xwe ve nîne. Bi taybetî jî ku pleya melayetîyê bibrê û ev cûre peyv û destewajane bêne bikaranîn. Lê belê Nalî wekî kesekî ladirayî û bawîşkên li kevneşopîyên bi hêz û qedexekiriyan civakê ceriyane û bi wêrî hengav avêtiye û xwe ji wê qaliba girtî eybe û şerm û nabê û heram û nayê kirin û hwd... Rizgar kiriye wan hemû sînoran têkşikandiye û wiha kiriye, ku tekstên şî'iriyên Nalî bibê tekstên dahênanî û zîndî û nemirî bi tekstan bexşîye. Ji bo wê yekê ladanên civakî gîr û tînekî din bi tekstên

şa'îr beşîye û tenê sedema serekî beşek ji tekstên dahênanê şa'îrin û deng û rengê xwe yê taybetî heye li dinyaya edebiyata klasîkiya Kurdî.

Nalî yê şa'îr li şî'rên xwe da hest û soz û urujandinekî rastiyanê bûye hewêna dahênanên wê, ji ber ku ew zanistaneya wê serdema xwendinê dû aliyane bûye, hem rastî û hem xeyal, gelek bi eşkere bandoreke cestayî li ser kiriye *lê belê nebûye histirîya bi berevajîya vê şa'îr sînor jê derbaskirîye, ji ber ku hemû berhemekî dahênerane reyekî demaxî, bingehekî cestayî heye û ev alî wiha bestiya aliyekî nav xindarê girîngê dine ku pêkhatiye ji aliyên civakî rewşenbîrî* (Ca'fer 2007, 54) Yek ji warên dahênanê li tekstên şî'riyên Nalî da pêkhatiye ji têrkirina pêdiviyên wan, yek ji pêdiviyên girîngên mirov têrkirina hest û hez û daxwaza seksî û romantikiyane beramber regeza beramber, ku regeza mêye. Eger bê û temaşa tekstên navdar û balkêş yên Nalî bikîn, ku ji bo Mestûrexanê Erdelanî nivîsiye, xewna Mestûre, ku Nalî pê dibîne li rastiya xwe de çî dahênanê, teksteke ji wan lêhv ji tropika dahênanê û deqêke bi wateya peyv deqêkî dahêneraneye ku pêkhatiye ji çendîn peyv û destewajeyên qedexekirî û tanu poy dijî kevneşopiyên civakî tekstekî hilgirê çemk û zarava û wate û delaleta ladana civakiye ev deqe bese ji bo selmandina tesktên şî'riyên Nalî, ku ladana civakî gelek mezine û sînor derbaskirinê encam daye û li heman demê de jî bi van ladanên çendîn deqên zîndî dahênerî ji bo me aniye diyartirîna wan tekstên şî'riyên ji bo Mestûrexan gotiye û bi xew dest pêdike, awazê wê ji awayê derketina civakî cûdaye, dahênan tevahî têda derxistiye bi wê yekê dibê bo mebest bigerîyîn neku mebest li tu bigerî, kirdarên seksîyan li cem Nalî şa'îr wekî guhertineke zanistî û awayê şî'irî têda hatiye dahênan. Amajeya diyar bi rewşeke hestpêkirî eşkere kiriye, ji destpêka hebûna mirovayetiye ve heta wekî îro jî kirdarê seksî hebûna xwe heye û pêkhatiye ji kirdarê berdewambuna jiyane, lê belê bi pêver û kultûrên cûda yê mîlletan ve guhertin li ser da hatiye.

Mirov jî ji zarokiyê ve hest bi van çalakiyên seksîyanê dike. Lê belê ew bi xwe nizanê û heta mezin dibê û dirk pê dike. (Froid) jî amaje bi van rewşan daye û wiha

bawere kipte seksîyan çavkanî ji dahênanê û ji wir ve dahênan û deqê dahêneran serî hildide û digihe lûtkeyê. Eger temaşa vê deqa Nalî bikîn dibînîn çawa li rêya ladanên civakî ve ev deq hatiye dahênan:

Îltîqay ma nar û asin her niza'e û gîrudar

Cem'î ma nar û zend û zende û merx û efar

Em Leser te'vîm û gewre girtinî ew bê twehur

Ew Leser tehqîr û texfîf û şikestî zarî mar

Em biçê ew dahênîşê dem weku gul xenderan

Em debê hestê ke ew bê, çawiyek û qe gire hezar

Em be çaw durru be ser le alî hediye bo deba

Ew be tif deyka be mîzabî şikeste abşar.... (Abdulkirîm 2005, 170-

174)

Ev dahênaneya Nalî rastîyaneye û bi nêrîneke raste rast temen ve girêdayiye û bawer jî pê dihênê ku çalakîyên seksî li cem mirov heye û bize û tama xweşî yan muçirkeyên hestiyar bi leşê mirov da pêktîne. Bi vî awayî çavpoşî û veşartina wê nine û divê bibê rastîya jîyanê. Ji bo wê yekê ji xewa Mestûre çendîn babetên têkilhevê wan aliyan têda tê dîtin her ji destpêkê ve wateyeke din bi xewnê dide.

Ji bo wê yekê ev deqa serve çendîn peyv û destewajeyên qedexê têda heye û behskirina wê asayî nîne û kevneşopîya civaka Kurdî rê pê nade. Lê belê ewê mezinîya Nalîye ewe ku vê sînorê derbas dike. Qesîdeya Mestûre mînakeke diyar yê vê rewşê û barudoxa derûniya şa'îre ku civakek mekanîzma derûnî li xwegirtiye ku şa'îr bi awayeke agahî û ne agahiyane hest û nest hêvî pê biriye. Ji bo hevseng kirina rewşa derûniya xwe sûd jê wergirtiye. Bêguman xewn baştirîn rêye ji bo gihandina wê yekê ji kurahîya dil û derûna mirov da heye bi taybetî ji bo şa'îrekî wekî Nalî ve her wiha li vê serdemê da

nayê kirin û nabê raste rast van cûre peyv û destewajaneyan bikarbînin. Lê belê rehenda xewn û zînde xewn sedemeke rêyeke baş ya şa'îr bûye ji bo derxistina hest û tiştên veşartîyên dilê xwe bi taybetî li rûyê seksê ve. Her wiha xwe betalkirina şa'îre jî ji wan hemû kipte seksîya hûndir de, ji ber ku ji bo kesek li wê serdemê û Mela jî bê û xelkê nasbikê û pêgehekî xwe yê civakî yê zêde hebê. Ewe nabê bi awayeke raste rast û bi bê sedemek vê hest û nesta erotîkiyane derbibrê û bixe ser pereyê kaxiz û xelkê têbigihîne, behskirina van cûre deqan û bikaranîna vê destewajeya seksî û pêkhatên hûr û gelek veşartîyên endamên mêyîne û nêrîneyê mirov, li rastîya xwe da dahênane û tiştêkî nû bûye. Bi taybet ji bo wê demê û serdema Nalî têda jiyaye û jiyan kiriye.

Sirušta mirov bi xwe wihaye xwedî komek xew û xulya û daxwazên berdewam û pêwîstî bi komek aliyên derûnî û fîzyolojî û psikolojî û laş û ceste ve heye. Têrkirina van pêdivîyan û hez û daxwaza jiyanekî asayî û bê giriftên derûnî bi mirov dibexşê li nêrîna psikolojî ve bi berevajî jî neguncan û nebûna derfeta cihê bi çêkirina vê hez û daxwaza mirov pişewî derûnî û giriftên seksî li hundirê mirov zêdetir û zêdetir dikin. Ji ber ku eger karî li jîngeha jiyanê xwe da zêdetirê pêdivî û hez û daxwazê têr bike *Wê demê ew mirov dikarê bi awayeke guncaw li ser jiyanê xwe ya asayî berdewam bê. Lê belê eger li civakê dijwar da jiya û berbestên zêde li ber têrkirina daxwazên wî da hebûn, nekarî wan têr bike, wê demê duçarî girjî û tirs û xem û êşan dibê* (Qerecetanî 2006, 314) Zextên derûniyên mirov neçar dike bêne çareser kirin û kêmkirina wan bar girjiyan dikin. Ji bo eve jî mirov wekî bedlêk ji bo mekanîzma berevanîya derûnî dike. Şa'îr jî ji bo kêmkirina vê zexta derûniyane û gihîştin bi lûtkeya hez û daxwazan û pêwîste derûnî psikolojî û pîrkirina vê valahîya derûniyane seksî hêvî ji bo qelem û peyv û şî'îrê dibe û wêneyekî lêhvan ji ladana civakî berhem tîne û ji dayik dibê. Bi vê jî dibê tekstekî dahênrayî û li rêya ladana civakî ve. Wekî li vê teksta xwarê ve Nalî ji bo Mestûre nivîsiye lutkeya ladana civakiye û lutkeya dahênan têda encam daye, eveye dibêje:

Mestûre ke hesnaw û edîbe be hîsabê

Hate xewim emşew be çî nazêk û îtabê

Hatûm, utî uqdem heye qet mumkîne wabê?

Hî tom egerem mesele hel key be cewabê?

Her mesile le bîkirê ke be to şerhî kirabê

Mumkîn niye kes dexilî bika çîn xe ga bê

Ayîne be mayîne debê reng numa bê

(Mestûre) bem estûre ebê miwere guşabê

Nuktêkî zerîfe benesîbî zurefa bê

Te rîfî dekem, belku le bo derd şîfabê

Em sîre çîye mîslî siwea bê, ne sima bê?

Durrîkewe ku durrî sema bê, ne siwabê?

Dukkanî tweef, kanî heya, kanî beqabê

Qubibey le qîbayî nuqe babê, nequ pabê (Abdulkirîm 2005, 63-

64)

Eger temaşa beşek ji xewnên (Nalî) bikîn, ku li ser Mestûre ye dibînîn deqêkî tevahî dij bi dab û nerît û yasa qedexekiriyên ol û jîne, dêrî yekemê xewnê şa'îr terxan kiriye ji bo gîrana xewnê, ku ew jî bi behsa Mestûreye wekî şa'îrêkî diyar yê wê serdemê ye, ku Nalî têda jiyaye, dema dibêje:

Mestûre ke hesnaw û edîbe be hîsabê

Hate xewim emşew be çî nazêk û îtabê (Abdulkirîm 2005, 63)

Paş vê dêra Şîrve Nalî yê şa'îr dikeve nava behs û xwestan ku ew jî xewneke û şerha xewnê ye, her çende destpêkê de (Nalî) (Mestûre) bi rêz ve dide naskirin û wekî edîbek behsa wê dike, ku jinekî şox û şeng û xweşik û edîbe. Lê destpêka xewna xwe de

Nalî wiha derdikevê li vê xewnê da Mestûre kêşeyekî heye û tê cem Nalî û daxwaza şerha vê meseleyê lê dike û Nalî yê şa'îr bi zanatir û rewşenbîrtir dizanê ji zana û edîb û hekîmên (çînî). Lê belê paşê rewşa li nav xewnê şerha rewşê diguhere. Êdî tişteke berevajî dibê û Nalî bi diyar dikevê û hestên seksîyên xwe dixê rû bi vî awayî erotîkî behsa endamên leşa Mestûre dike û bi vê deqê jî dibê deqêkî tevahî ladayî ji kevneşopîyên bi hêz yên civakî û civakê.

Bi vê pêvera ku mesele seksîyên li nêrîna kevneşopî û civak û olan ve diçê xaneya qedexekirî, wehm û xeyalkirina seksî diçê bin heman barî, her çende xewnê seksîne bi wê pêvera ku li bin kontrola kesan de nîne naçê bin vê barê, her çende di dema xew dîtîne de ne agahî dikevê bin rewşa (Mîna bilind), lê belê behskirina wehm û vegerana xewnên seksî bi heman awayî çemkê qedexeyî û şaş li ser da dibirin *Ji ber ku eşkerekirin û dirkandina navê wî kesê li xewê xewbînê da ji bo meseleya seksî amadehîya xwe heye neku her nabê û qedexeye li gor kevneşopî û bihayên civakî, belku diçê qaliba êrîş kirinê. Êdî dîsa sivikatî pêkirin û xerab navkirin jî, ev qesîdeye bi vî alî ve çûye, bi wê pêvera naverokê seksî heye, ji ber ku Nalî navê kesê beramber tîne ku Mestûreye...hwd (Melazade 2001, 313) Ku wate naveroka vê teksta seksîye û ladayê ji kevneşopîya olî û civakî û dewruber bi taybetî ji bo kesek ku Melaye (Mela Xidir) Nalî, ye babeteke hinekî din dikevê xaneya ladana civakî ve.*

Eger temaşa vê peyv û destewajeya erotîkî û qedexekiriyên bikîn li nav Şî'îrda, ku bûne sedema ladana civakî û ladana bi hêz û sînor şikandina wê ji aliyê şa'îr ve ku peyvên wî Bi çî nazêk û îtabê, uqdem heye, mesele helekey be cewabê, nuktêkî zerîfe, kanî heya, qubey le qîbabî, qupa, wek xeyme be perdêkî dû estûne be pabê, nextê be zaket qileşabê, Mestûre ezî şeref û rîf'et û cabê, kesêkî bilûrînî nixûnî li serabê, le tafet qileşabê, pele befrêkî ke eslen neşkabê, qendîlî munîr, kam ab û hewa, mu'tedîlî eşi û numabê, kaniye gemêkî tê zabê, ye'nî giyay lê nerwabê, ya girdekey girdêkî keşîrîn helîdabê, damênî be enwa'î gul û mil xemlabê...hwd, ev û çendîn peyv û destewajeyên din li nav vê tekstê da heye, Eger bê û ev peyv û destewajayan ji tekstê bibrîn, wê demê

çend axaftineke sade û rût ji bo me dimînê, li vir de dahênan bi sedema van ladanan ve serî hildide û tê holê ji ber ku pêş Nalî ev cûre dariştina deq hebûna xwe nebûye, bi wateyekî din Nalî li vî warî de bi dahêner tê zanîn. Ji ber wê xewn tenê bi vegeranê ve tê behs kirin û vedigerê ku Nalî yê şa'îr vê xewnê dike qesîdeyekî newaze û bilind hunerî û îstatistikî, ku berê tiştên nehatine gotin, hem li rûyê bikaranîna wêneyên hunerîyên tekstê û hem wekî bikaranîna peyv û destwajeya dijî van cûre peyv û behsan hêjayî behskirin û xistine ser kaxizê nebûye, lê belê Nalî yê dahêner wan hemû sînoran dibîne û dibê şa'îrekî qaçax û rûbirûyê tevahiya civakê dibê û bakî pê nîne.

Nalî yê şa'îr dizanê xewn baştirîn tişte, ku wekî şa'îrek dizanê xewn bac li ser nîne û sedemeke başe ji bo gihandina mebest û armanca serekî. Ji bo wê yekê xewn û zînde xew baştirîn rêne ji bo tewzîf kirina kipte seksîyên li nav dilê mirov *Ji bo wê yekê Nalî eger axaftineke bê ser du car dibêje, eve tenê xewêke û bê agahîyê ve û li dest min nebûye, tenê şerha xewna min kiriye. Li heman demê de jî rewşa seks û deruna xwe pê betal dike. Ji ber ku têgotin, zilam li bin fişarê palnerê seksî da evîniyê dike, ji bo vê mebestê û dûrketina ji ladana seks û xwendîtî û evînî û hevsergîriya fermî qebûle* (Bokanî 2008, 162).

Wger beşekî dinê ji xewna Nalî bixîr rû tevahiya vê ladana civakî ji bo me derdikevê:

Wek xeyme be perdêkî dû estûne be pabê

Sertîlekî nextê be nezaket qileşabê

Wek hîmmeî sofî ke le nêw xelwe xizabê

Mestûre ezîzî şeref û rîfet û cabê

Ya komele zîwî bu xela dûr le ser xabê

Muxleq be be xîlî, be mesele miştî mela bê

Kasêkî bilûrînî nixûnî le serabê

Nextêkî le ber mewcî le tafet qileşabê

Yaxo pele befrêkî ke eslen neşikabê

Qendîlî munîr û guzerî ab û hewa bê

Damênî be enwa'î gul û mil xemlabê

Gencêkî têdabê ke tîlesmî neşikabê

Hêşta ku le heq cêgey xasî nedrabê (Abdulkirîm 2005, 607)

Ev teksta serê beşekî dinê xewna Nalîye, eger temaşe bikin dibînin, ku eger ladanên civakî nebê, wê demê bi deqêkî mirî tê zanîn û ew tam û çêja niha nedibû. Li gel eve da jî li mudeqeve hest bi derûna têkşikayî ya Nalî dikîn li rûyê netêrî û kêmasîya seksê ve. Ji ber ku zilam û jin li bin fişara seksê hez dike û jin jî zilam jî li bin fişara atifi hez dike *Jin bi peywendiyên seksî razî dibin, ji ber sedema hem û çeşne ku peywendî bi daxwaza seks ve nîne, mê diçê karê seksî ve ji bo zêdekirina hestê wê bunê ku têda* (Henşî 2010) Herem jî wiha kiriye, ku derûnzan evina zilam û jin bi tevahî li nav seks da deynin. Bi vê pêyeya heza seksa mêrek ji bo jin tuxma evînî têda heye. Wate li rewşa seks ve Nalî ku li qesîdeyê da ber cesteye tuxma evîna Nalî têda kariye hem ji bo regeza mêyîne bi awayeke giştî û herdem ji bo Mestûre bi sedema amadehî li qesîdeyê da, ji ber ku Nalî li xalek da têda girêdayî daxwazeke seksî bûye û ji bo eve jî dikevê nav telîsma dîmenekî wehmî. *Mestûre tê dîmena wehma Nalî, eve jî bi xeyalkirine li ewreta wê wêrandina li fantaziya xwe da* (Sîweylî 2015, 120) Eve jî rewşeke asayî û siruştî ji bo zilamek vê hest û nesta seksîye li nav derûna wî da dibê û bixe rû. Lê belê li rûyê dab û nerît ve ladane .

BEŞA SÊYEM

3. DESTNÎŞANKIRINA CÛREYÊN LADANÊ LI HELBESTÊN NALÎ DA

3.1 Ladan Li Dabu û Nerîta Civakê ve

Bi awayeke giştî civaka mirovayetîyê bi çend qonaxekî dîrokî ya cûda de derbas bûye, li her qonaxek ji qonaxan da hinek ji dab û nerîtên civakê bûne cihê rexne û giriftan li ber şaristanîyet û pêşketinên mirovayetî û civakî kiriye. Civaka Kurd jî ji berê û niha ve jî xwedyê civakeke dab û nerîtê baş û xerap bûye. Yek ji van şa'îrên diyar û ber bi çavê şî'ira klasîka Kurdî li Başûr da Nalî yê şa'îre ku xwedyê çendîn berhemên şî'irê bêhempa û diyare li ser vê babetê de û berdewam rexne li civakê girtiye. Bi vê yekê jî naverokên şî'irên xwe de bûne şî'irê ladayî, ladan li civakê da, ji ber ku zimanê Şî'îrzimanekî tund û rexne himbêze li beramber nedadperwerî û êş û asîmîlasyon û çewsandin û bi sivik temaşekirina huner û edebe. Bi tenê Nalî yê şa'îr rûyê xwe dike xelkê xwe, ku bi sivik behs li şî'irên wî dikin û hunera Şî'îrnivîsînan li tiştêkî sivik û asayîye. Ji bo wê yekê Nalî yê şa'îr dibêje:

Nalî herîfî kes niye, îlf û elîfî kes niye

Beyfî redîfî kes niye, herze goye, gep deka (Muderis 1976, 100)

Wate Nalî li vê şî'irê da li piştî bêzarî derbirîna di derbarê jîyanê, ku wî xistiye bin ve û xelkê ser xistiye û payeyekî civakî ya nizim bi wî daye û xelkê kiriye xwedyê rê û şûn, helwestekî kêmasîya li jîyanê werdigrê û dibêje: *her çone ba her wabê, diyare min şayenî paye û rêw şuwênî em xelke nîme û le nimûney kesiyân nîm, şî'rekanîşim şî'irî herze nûsiye, boye rêw şuwênim le komelge da emeye ke heye (Muderis 1976, 100)* û em ku dibînin gileyî li xelkê xwe dike, ku bi çavekî sivik temaşa edeb û Şî'îrnivîsînê dikin, ev hengav jî bi paşketî û ne rewşenbîrîya mîlletê xwe dide zanîn. Her wiha (Nalî) li tekst û deqekî din da dibêje:

Aşq hewes meyke dew îlmî be sîte

Aql telebî medrese û cehlî murekkeb (Abdulkirîm 2005, 131)

Wateya wê *Dildarî fir û fêl û dro û pêç û pena nazanêt, xoyî û astêkî sade da egerêt û ser le xoy naşêwênê, belam ewaney ke xoyan be zana û xwêndewar dadenên, be xeyalî xoyan hogirî xwêndin û qutabxane û zanistin, ke çî le rastî da şuwênî nezani kewtûn û be xoşiyar nazanin û hestî pênakên* (Abdulkirîm 2005, 131) Şa'îr rû dike cûreyek ji van kesan, ku wiha mijulî eşq û eşqbaziyê ne bi hesabê ehlê zanist û zanyarî û me'rîfetê û xelk bi paşketî û nefehm û nezan dizanin, ku çî ew bi xwe nezan û nefehmin, ketine çî barek ve, ji bo wê yekê Nalî civaka Kurdî ji van cûre kesan hişyar dike heta ku bi bikaranîna çemk û wateya xweşika eşq û evînî û hevkarî û pêkve jiyane nekine paş van cûre kesan û ji wan dûr bikevin, bi vê jî deqekî ladana ji dab û nerîta civakî aniye. Ji ber ku divê xelk hişyar bikin ewqas xweş bawer nebin û tê nekevin.

Divê eve ji bîr nekîn ev rexne girtin û ladana ji dab û nerîtên civakî li cem şa'îr zêdetir ji bo ewe bûye, Kurd jî heman awayê mîlletên dine, bibê xwedî şaristaniyetekî pêşketî û xwedî me'rîfet û civakeke tendirust. Diyardeyên edebî nikarin xwe bi dûr bigrin ji kêşe û giriftên civaka xwe, ji ber ku ji berê ve bîrmend û rewşenbîrên cîhanê li xema baş kirina civaka xwe da bûn bi tenê kesêkî *wekî (Marks) dibêje beşekî ramana civakê, ku edebe pêwîst bi bingeha civakê dike* (Marks 1997, ?) Bi nav dike. Ew wiha bawere civak dinamoya hemû warên mirovayetiye, hemû guhertin û pêşketin û ber yek ketin bi xwe ji civakê ve çavkanîya xwe digre.

Wate hemû derdên civakî û girift û kêşeyên diyarên li nav civakê de cara dawî li nav edebê da cihê xwe vedike û reng dide, wekî bi xîlî bi yek birin û hesûdî û çav pîsî û gote got û behskirina eyb û hetka hevdû û gerana li pey kêmasîya hevdû û perde li ser ladana wê û hwd... Bêguman şa'îran bi taybetî Nalî yê şa'îr eve bi diyardeyekî neşîrîn û nerewa dizane rexne lê digrê û bi paşketîya civakê dide zanîn û wê baweriyê de ye zêdetir ev tişt peywendî bi dab û nerîtên kevin û paşketiyê ve heye. Ji bo wê yekê eveye dibêje:

Aciz mebe hergîz le dro û îfkî hesûdan

Dunyaye, debê seg buwerê şî'e bika seb (Abdulkirîm 2005, 131)

Wateya şî'irê *Eve dinya ye, beni adem xwedyê behre û jêhatiya kesî wiha ji bo her kesekî hilnakevê, ku bi xîlî pê bibin... Eveye heyvê jî hemû dibînîn çawa dinyayê ronak dike, ku çî sa û seg ji ber wê direyin. Her wiha Hezretî Ayşe xweda ji asman ve wê paqij kiriye, li Quranê da behs kiriye. Her çende Şî'e her buxtana wê dikin û pê diwerin û dijûn û cinêva pê didin* (Abdulkirîm 2005, 131) Wekî li wateya şî'irê da jî diyare, şa'îr giriftarê derdê civakê ye, ku dest hilnagirin ji buxtan û hesûdî û nefehmî û axaftinan pêve dikin û behskirin û rexne girtin li xelk bi vî awayî eşkereye cûreke ji ladan û wêrekiya Nalî yê şa'îr bi bêyî wê yekê guh bide metirsiyên gote gotên xelkê, behs wan dike û perde li ser radike û xelkê ji wan hişyar dike. Her wiha bi wateyekî din jî Nalî li vê şî'irê da behsa xwe dike û vê teksta şî'irê pêşkêşî neyaran û dijminên edeba xwe dike. Bi taybetî ewên li vê serdemê da dijayetiya Nalî û tekstên şî'irên kirine, lê ev şa'îrê mezin bi tekstên edebî û li qalibê Şî'irda bersîva wan dide û ji wan re dibêje: Min mange şewim û tarîkî rûnak dekemewe behre û hunerî min le Şî'irda le lutkeye û be qise û basî êwe kem nakem û şêlu nabim, çunke min behremendim le Şî'irnûsîn da.

3.2 Ladana Olî - Kesayetiyan Olî

Zêdetirê helbestvan û nivîskarên Kurd li tekstên xwe yên edebî da, behsa cûreyek şêx û mela û sofî û seyîd û kesayetiyan olî dikin perde li ser van aliyan radikin û bi karekî xerap didin zanîn û axaftinên van cûre kesan dibêjin olî û pîrozîya olî û bingehen dinyayî dikin wesîle û ji bo gihîştina armanc û meremên xwe, xelkê sade û ji rêzê ya li nav civakê jî ji bo kêr û armancên xwe û ji bo berjewendiyên xwe bikartînin.

Helbestvan û beşek ji kesayetiyan olî hemû demekî li serdema xwe da ketine gengeşe û dijayetiyan. Ji ber ku rewşenbîr û helbestvan wiha zanîne ku çavkaniya êş û paşketîya civakê li ser destê hinek ji kesayetiyan olî ve civak tûşî dibê û kesên olî jî ol û dîn wekî mertalek bikaraniye ji bo mebesta berevanî kirinê ji wan hemû diyardeyan ku

hinek kesayetîyên olî li wê baweriyê bûn ku civak tûşî li navçûn û têkçûnê dike. Eve ye Nalî dibêje:

Dest bendiyane, dên û deçin serû narewen

Ya helqeyane Sofî mil xwar û mende bûr (Abdulkirîm 2005, 200)

Wate helbestê *de Axo serû û narewekanî hewşî xaneqa le xoşîdan û wek lawanî helperkê ker destîyan girtuwe û dên û deçin û le ser awazî şine ba sema deken, yaxud wek sofîyek kololekan peywendîyan be xoşî jiyaneve nemawe serîyan kiz kirduwe û miliyan xwar kirduwetewe û bê deng û sengin* (Abdulkirîm 2005, 200) Ku wate Nalî gileyî û gazindan pêşkêşî sofîyan dike. Wekî kesayetîyeke olî, ji ber ku li asta paşketî û nexweşîyên civaka xwe bê reng dîkin û milê xwe sist dîkin û dûr dikevin ji kêşe û giriftên xelkê ku eve jî li cem şa'îrê bê xîretî û tirsokîye. Bi vê jî şî'îrekî ladana civakî nivîsiye, ji ber ku behskirina kesayetîyeke olî ji aliyê kesekî olî karekî qedexeye. Her wiha Nalî yê şa'îr li vê dûbeyta xwarê de carekî din berê xwe dide rûyê kesayetîyên olî û wan riswa dike û wan bi kesên bi fêl û fêlbaz dide zanîn û rûyê wan nîşanî xelkê dide. Ji bo wê yekê van cûre kesên olî binasin û wan riswa bikin. Ji ber ku van cûre kesan bi rih û ser û sîma rûxsarê xwe û hêvîya xwe bi olî û li bin diruşma îslamîyê fêl li xelkê dîkin. Ev cûre teks jî diçê xaneyê şî'îrê ladana civakî li cûreyê ladan û rexne girtina li kesayetîyên olî, ji ber ku nabê û nebûye rexne li kesayetîyên olî bê girtin û bi vî cûreyî wan riswa bikin. Di demek da ku bi xwe mela bê û bi vê qonaxê da derbasbûbe. Wekî Nalî li vê mînakê da behsa kesayetîyên olî yê fêlbaz dike û dibêje:

Rîşekey pan û dirêje, bo riya xizmet deka

Zahîre her kes be tul û erzi rîşî da riya (Xeznedar 2010, 128)

Wateya şî'îrê de tê gotin *Filan kes rihekî xwe yê pehn û dirêj heye, lê belê ji bo xweda xizmet nake û pehnî û dirêjiya rihê wî nîşana xwedanasî nîne. Nîşana derew û riyabazîye, eger mebesta wî peyrewa Pêxember (SXL) bûya, hinek ji rihê we xwe dihişt* (Xeznedar 2010, 128) Nalî li vê şî'îrê da kenê xwe bi wan dike ku bi dîmen xwe bi

kesayetîyeke baş û ji xweda tirs nîşand didin û didin zanîn, ji bo wê yekê jî li nivê düyem da bi biçûkxistinê ve risteyê wiha dariştiye wateyekî din jî bigihîne. Peyva (Vahîre) bi nivê şîrê pêşve girêdaye û paşmaya wê wiha lê hatiye: Xelkî bebarî dirêjî û panîda be rîşiya birîn. Wate bi sedema sade û normaliya xelkê û bawerbûn bi rûxsar û ser û sîma û rihê van cûre kesan dibê sedema bikaranîn û mil birîna wan.

Nalî yê şa'îr zêdetirîn cûreya ladana civakî ku balê kişandîye û tekstên şîrê li ser aniyê ladan û rexnegirtine û sivikayeti pêkirina kesayetiyên olî ye li cûreya softî û şex û zahîd û mela û kesayetiyên riyabazî li nav civaka Kurdî da, her çende ew bi xwe jî kesekî olî yê diyar û bi navê deng bûye, lê belê çavê xwe ji zulm û zordarî û bikaranîna olî û li bin perdeya olî ve nekiriye û wan riswa kiriye. Ji bo wê yekê jî eve tekstên zêdetir li vî derbarî de dixîne rû, şîrovekirin û şîrovekarîyê pê dikîn.

Divê eve jî bixîr rû herdem û ji berê de civaka Kurdî pile û payeyekî bilind û zêde bi kesayetiyên olî bexşîye û rêz û hurmetê zêde û taybetî ji bo wan hebûye û berdewam li bin pirs û raya kesayetiyên olî bûne *Ji ber ku, nêrîna civaka Kurdî ji bo olî û kesayetiyên olî li astekî bilind dabû. Ji ber ku çavkaniya rewşenbîriya Kurdî hucreyê mizgeftan û kesayetiyên olî bûn ji bo wê yekê bi awayeke pîroz temaşa kesayetiyên olî hatiye kirin* (Silêman 2015, 109) Ji bo wê yekê beşek ji kesayetiyên olî vê rêz û hurmet û pileyên civakî bi derfet zanîne û bikaranîne û civakê pê rêvebirine û çewsandine. Ji ber wê yekê jî hinek ji kesayetiyên olî bi navê olî ve hewldane ji bo berjewendîya xwe û komkirina serwet û samanê jî bûne sedema îlhamên şîrê hinek ji şa'îran û bûne sedemeke şa'îran ji wir ve dest deynin ser êşên civakê û sedema kêşe û giriftan beşekî zêdeyê nav civakêne. Ji ber wê yekê hinek ji kesayetiyên olî desthilata wan ya reha bûye. Bi cûreyek girêdane bi desthilata axa û mîr û began ve.

Her wiha li cîheke din da Nalî yê Şa'îr dibêje:

Wek softî safî mebe alûde be dunya

Bêhûde mukedder meke serçawey meşreb (Xeznedar 2010, 134)

Wateya wê *Xwe wekî sofî nefahm û sade wêneyan tevlî dinya neke û bi lez çavkanîya rastî û xwedênasî jê neke* (Xeznedar 2010, 134) Wekî li wateya şî'irê da jî diyare û eşkereye, çawa Nalî yê şa'ir rexne pêşkêşî wan dike û ji wan re dibêje: Ayîn bem şêweye niye ke êwe basî deken, her weha pêwîst nakat kaniyaw pak û bê kem û kurî bernamey xuda û pêxember lêl biken û bîşêwênin, çunke em dîne pêwîstî be bername û ziyad û kemkirdinekan êwe niye, ser le xelkekeş têk meden û bela rêyan da meben. Ji ber ku Nalî baş li wê yekê têgihiştîye, ku xelkê wî sade û sakarin û olî û kesayetîyên olî li cem wan pîroz bûne û rêzeke zêde li wan girtine, ji ber ku, olî wekî sîtemêkî çalak nav bînaya civakîye *li pileya me'rîfî dîn ve veguheştiye li nav dam û dezgehên civakê, ev dam û dezgeh jî bawerîya olî li me'rîfete ve dikin rêwresma bi gelekoyî kirine û li cîheke xwe ya taybetî encam didin* (Qadir n.d., 8) sîstema jiyana olî pêwîstiyekî girîng didin zanîn ji aliyê kesên olî ve ev me'rîfete belav dikin û girîngiyê pê didin xelk jî li gor bernameyekî diyarkirî bi cîh dikin.

Her wiha li teksteke din da Nalî rû dike kesayetîyên olî rexneyeke tund li wan digre li van tekstan de têdigihîn, ku Nalî dijî rêbaza sofîgeriyê bûye. Her wiha gelek bi tundî behsa wan dike û rexne li wan digre. Bi vê jî komek tekstên xweş nivîsiye, ku diçê xaneya ladana civakî ve li cûreya ladana olî, eveye li vê tekstê de dîsa êrîş dike ser wan û dibêje:

Sofiyan hatine meclîs wereqî dîde bişon

Lekin ewe dêmewe uşkane le derya niye bas (Xeznedar 2010, 234)

Wateya wê *Sofî hatine meclîsa me bi rondikên derew rûyê xwe yê rastî û çavê xwe da dikin, nizanin aliyê dinê camê ve bi ava deryayê rastî heqperestîyê nebê lê belê ew rû hişkin. Ne şarezayê deryayê ne êdî li ku bigihin ser derya rûyê xwe yê derew û derewên xwe de dişon* (Xeznedar 2010, 234) Wekî dibinîn ev tekstên ladanê li cûreya olî û kesayetîyên olî li şî'irên Nalî de hebûnekî zêde heye û bi eşkere û bi rûnî Nalî yê şa'ir rexne û dijayetîya sofîyan kiriye û bi kesên derewîn û riyabazî û çewsandina civakê dide zanîn û her wiha xelk û civaka Kurd jî agahdar dike ji van cûre kesan û dixwaze wan li

nav civakê de riswa bike û perde li ser tawan û riyabaziyên wan de rake. Eve jî bûye sedema dahênan û nivîsîna çendîn tekstên bilind û hunerî, ku diçê xaneya ladana civakî bi taybetî ladana olî.

3.3 Hevrezbazî - Ladana Civakî Hevrezbazî

Hevrezgez yekî dinê ji cûreyên ladana civakîye li nav tekstên şîriyên Nalî da hebûna xwe heye û berçav dikevê, eve jî diçê xaneya ladana civakî ve, ji ber ku niha jî li gel da bê behskirina vê babetê hevrezgezazîye tiştekî qedexeye û hatiye rakirin û bi yasa û mirov nikarin bi eşkere û li nav xelkê da behs bike. Êdî çi li wî serdemî da, wate zêdetir berî dû sed salan berî niha şaîrekî wekî Nalî bi eşkere li nav şîrîrên xwe da perde li ser vê aliyê da rakiriye û Şîrîrî li ser nivîsiye.

Nalî hevrezgezazî yek ji wan rêbazane ku rexneya edebî jî li ser dike. Li rêya xwendin û şîrovekirina tekstan Nalî, yek ji wane li ser hevrezgezazî nivîsiye, bi vê jî li dab û nerît û orf û dîn û bihayên exlaqîyan rakiriye, ji ber ku hem dijî dîne û hem dijî dab û nerît û ehlaq û rewşa civakê ye.

Eveye Nalî dibêje:

Kur taze û ter bê madem sade wek xuşkî bê

Emma kerwa sebze, dîba kur û zîba keç (Abdulkirîm 2005, 165)

Wateya wê *Eger kur taze û ter bê, wekî xuşka mû lê nehatibê ewe xweşe û daxwaz û arezûyê dilerizîne, lê belê ku mû lêhat wekî qumaşek ku çawa nexşê bixî ser, wiha nexweşik dibê* (Abdulkirîm 2005, 165) Ku wate şaîr meyla aliyê kurê xweşik û lûske da çûye û tenê van hez û daxwazan jî veneşartiye û behs kiriye. Eve jî tiştekî dîrî li nerît û dîne û dibê şîrîrekî ladana civakî ji dab û nerît û diyardeyên bilindên civakê. Her çende Nalî xwestiye meseleyê cûdahîya rezgez kêmbike, wekî yek wesfa keç û kur bike û rol bi her dû yan bide ji xweşikî û arezûbazîyê, lê belê her çawa ji bo civakê wekî Kurd ku mûsilmane jî nabê û nayê kirin.

An jî li şî'rekî din da, Nalî dibêje:

Îşqit ke mecazî bê xwahîş meke îla keç

Şîrîn keç û leyla keç û selma keç û ezra keç (Abdulkirîm 2005, 162)

Li vê şî'irê da bi rûnî derdikevê Nalî yê şa'îr li nav jîngehekî hevregzbazî da eve nivîsiye û behsa nehiştina cênderê dike *Ke madem etu aşqî çî ciyawaziyekî heye le nêwan keç û kur* (Abdulkirîm 2005, 162) Yan li teksteke din da dîsa Nalî dibêje:

Kur zîbî debustane, keç şem'î şebustane

Bo bezme temaşa kur, bo xelwetî تنها keç (Abdulkirîm 2005, 164)

Wate: Kur xwendîngehe, keç muma tarîkîstane, ji bo bezmî temaşakirina kur ji bo xelweta tenêfî jî keç, mebest çîye li vir da kur xweşikê û ji bo temaşakirina wî xweşe? hemû ev tekstên ku li ser ve me xistiye rû hevregzbazîya şî'irê Nalî digihîne bi vê jî tekst dibê tekstek ji tekstên ladana civakî. Eger li dêrên vê tekstê temaşe bikîn dibînîn yek wesfekî têda tûne ku amajebê ji bo keç, yan jin, lê belê dibînîn ew wesf ji bo nêrîne bikartê, ku têda hatiye (Yusifî Misir) kes heye le dunyada ciwanî afret be ciwanî piyawêk biçuwênêt?! Li rêzeke din da wesfa (xeta kesk) dike, ku delaleta li simbêlê zilam wate ew simbêlê qeytaniyeyî li ser lêhvên zilam li ser devê xortan da heye û rû ave, sedan peyv û wesf hene ji bo lêhvên jin, li vir da Nalî yê şa'îr wesfa simbêlê dike, eger Nalî mebesta wî keç bûya, eve piştrastbin zilam nîne li dinyayê de pê xweş bê jina wî yan xweşdiviya wî simbêlê xwe hebê.

Divê eve jî bibêjîn, li serdema kevin ve babet û behs û daxwaza hevregezbazî hebûye û hatiye behskirin, lê belê şa'îrek wekî Nalî li pile û payeyekî civakî ya wiha bilind ji malbata nêzîkê Babaniyan û her wiha Mela jî bê, bê û behsa babetekî wiha bike, li rastiyê da eve gelek bi curet û wêrekiya Nalî dixê rû, her wiha tenê dikarîn bibêjîn ev diyardeye li vê serdemê da bi hêz bûye û hebûna xwe hebûye.

Her çawa bubê Nalî rêçke şikandî û dahênerê tekstên şî'iriyên xwe yên bi hemû cûreyan bûye, ji ber ku girane li civakeke girtî wekî civaka Kurdî li wê serdem û demê da van cûre ladanên civakî da encambide û bi eşkere û bi bê tirs rûbirûyê komelek metirsî û dijayetîyê bibe, an jî li teksteke din da kerem dixe:

Kur ayîney husnî, ta wek kiçe menzûre

Girtî ke xubarî mû çînî kur û mîna kiç (Abdulkirîm 2005, 165)

Wate Eynik û awêneya xweşikî û rûmeta kur heta wekî mû lê nehatiye, ji bo wê yekê temaşekirin dikarê, lê belê ku mû jê hat û tuwê gene tûkî lînîşt weku defrî şuşe lê tê, ku çî keç wekî xwe dimîne û guhertin li ser da nayê (Abdulkirîm 2005, 165) Her wiha li dawiya vê qesîdeyê da dibêje:

Ella ella ke çî eql û kemalêkî heye

Le gel ew eqle û kemale çî cemelêkî heye

Dil refêne le bo medhî serapayî ewê

Wacibe medhî bikat herçî kemalêkî heye

Ehlî em şare hemû noker û etba'î ewn

Yusifî Misre, eceb cah û celalêkî heye

Ger xeyalî dehenî bênime nêw xezelî em xezele

Dên delên em xezele urde xeyalêkî heye

Xetî sebzî kenarî lebî Nalî her wek

Xidrî zînde le ser ça he zulalêkî heye (Abdulkirîm 2005, 576-577)

Eger temaşa vê tekstê bikîn, dibînîn belge û delaleta wî eweye, ku Nalî yek ji van şa'îrê klasîkiyên Kurde, ku bi tevahî beşek ji tekstên wî diçê xaneyê ladana civakî. Her wiha yek ji şa'îrên wêrekê serdema xwe bûy

3.4 Ladana Civakî Galtecarî (Henekwarî)

Galtecarî an ku henekwarî cûreyeke dinêye ji ladana civakî, ku Nalî yê şa'îr kar li ser kiriye û behsa wê kiriye, eve jî cûreyeke ji gihandina peyam û mebesta şa'îr, ev cûre tekst awayeke ji awayên rexnegirtinê û redkirina beramber ku bi awayeke galtecarî û behskirina bi henekan ve û awayeke bi himbêz girtinê ve dixê rû.

Nalî yê şa'îr li gelek ji tekstên van cûre ladanê heye û berçav dikevê, bi taybetî ewên ku xwestine bi çavekî sivik û biçûk temaşa Nalî yê şa'îr bikin û li pile û payeya şî'îrên wî û nivîsîna şî'îrên wî kêmkirin û bidin, lê belê Nalî yê şa'îr gelek bi hêz ve kariye bersîva wan bide û her wiha bi hekenwarî van cûre kesan ve nêzîk dibe, hinek car jî babetekî olî, an jî behsa kesekî olî, yan kesayetîyekî diyar dike bi awayeke galtecarî û henekwariyê ve.

Nalî kerem dike:

Reqîbî cûftelî, nabête nexçîrit, ke xer kurre

Elîfî çayre dayim le qîşqey kerdîr û cewra (Abdulkirîm 2005, 84)

Wateya wê: Bedkar cote avêja wê ji bo ewe dikare bibê bi nêçîrê te, ew herdem her li gel aliyê xwe û ser û sewdaya xwe ye)

Nalî bi awayeke galtecarî li rêya bikaranîna komek peyv û destewajeyên wekî (Bedkar-Cote-Alîk-Nêçîr-lewer.....hwd) rû dike wan kesan ku hesûdiyê li şa'îr dibin û li vir û li wir behsa wî dikin û dixwazin wî lekedar bikin, Nalî bi ker û heywan didin zanîn û axaftinên wî jî bi cot avêtinê behsa wî dikin û her wiha şa'îr van cûre kesan wiha dixêrê rû ku çawa ker û gûhdirêj ji bo alîkê cot tavêje, van cûre mirovan jî ji bo destkefteke maddî û aferînek axaftineke xwehr û nebicîh dikin û dixwazin tiştêkî bi vî navî de bidestbixin.

Dîsa Nalî yê şa'îr li teksteke din da û li cîheke din da, dibêje:

Bezmî rendane eme, mel'ebeyî weîza

Eme cêyî remz û îşaratî derûne le geruwî

Tengî pirxerxereyî wa'îza xerra niye bas (Abdulkirîm 2005, 246-247)

Wateya wê *Bila Sofî riyakar rû neke van korên me, korê me korê dildarî û dildarên rastîne, galtebazarî şîret bê kirdar nîne, em bi kurahiya evîna rastî da çûne xwarê û em bi xwe behsa başî û xerapî û bê bariya dinyayê ve mijul nakîn, her wiha li nîvê dêra duyem da dibêje: Kora me korê dildarane, bi îşaret û remza derûnê axaftinê têda dike, meydana ewe nîne wa'îzê li xwe bayî û ser xwe re çûyî, bê bi ger û girtin û nefes û henaseya siwariyê ve dest têda bike bi pend û şîretan* (Abdulkirîm 2005, 247) Wate Nalî yê şa'îr bi henek pêkirinê rû dike van cûre mirovan bi hesab qaşo herdem li civata zîkir û xweda perestiyê de dibestin, lê belê hîç li dînya û dîn ne gihîştine û ji xwe ve şîretê li xelkê dikin û tûşî ser gêjiya wan dikin, ev cûre kes cihê wan li meclîsa me nabê û bila biçin ji bo xwe mijulî xwe bibin û şîretê li derûna xwe bikin.

Behskirina bi eşkere û bi navkirina van mirovan cûreyeke ji ladana civakî li cûreya ladana civakî bi awayeke henekwarî, şa'îr ji bo gihandina wate û delaleta şî'irê xwe û ji bo wê armanca xwe bike van cûre û awayê Şî'îrnivîsînê hîlbijartiyê, ku henekwarî û bi pelar û şîyanê behsa van cûre kesên li nav civakê bike, eger hurî temaşe bikî Nalî tu demekî, yan gelek bi kêm behsa kesên asayî û çînê hejar û bin ya civakê

kiriye û rexne li wan girtiye, belku herdem rûyê qelema wî ji bo wan kesan bûye, ku vê çînê diçewsênin û asîmîle dikin û wan bikartînin û xedir li wan dikin li bin perdeya kesayetîyên baş û olî ve.

Eveye Nalî yê şa'îr dibêje:

Şêxim were der, fêslî behar û gul û geşte

Eyiyamî le germa be xizan weqtê xezane

Ew şêxe be kum megire ke peşmîne merîde

Ew rîşe beser darewe rîsêkî buzane (Abdulkirîm 2005, 487)

Wateya wê: Nalî rû dike ewên dilê wan miriye û tenê ji bo rûpamaliyê dijîn û şêx riyabaz dike bi mînakekî jêre dibêje *Ev demsal demsala gul û geranê ye bi navê gulan, serdema ewe nîne benî adem bixî nava germa û payîzê dema xizanê germaye neku bihar, ku divê mirov çav bi gul û gulzar û keskatiya dar û beran bigrê. Her wiha dest û milê wan şêxan negre ku şeytaneke, ji bo veşartina bergê hurî li ber kiriye, rihê wî jî bi ser darê bilind ve mûyê riswayê bizine* (Abdulkirîm 2005, 487) Nalî henekan bi wan şêx û sofîyan dike û bi awayeke henekwarî behsa wan dike û ji wan re dibêje: Rihê wan û ser û sîmayên wan tenê ji bo riyabazî mil birîna xelkê ye, her wiha rû dike mîlletê xwe û dibêje guh nedin wan cûre şêxan û gotina wan nekin, ku çavê xweşik û nî'metên xweza û dinyayê nabîne, tenê wan dixê rîza şeytan ve, ku çawa mirov li xîştayê dibe û avê şêlo dike û serê wan têkilhev dike.

Şa'îr bi awayeke henekwarî behsa wan dike û dixwaze rûyê wan yê rastî bixe rû, ji ber ku Nalî kesekî hişyare û dizanê çî heye û çî tûne li dewrûber, ji bo wê yekê çavê şa'îr û hizr û bîrê şa'îr wan kesan dibîne û dinasê û hest pê dike, ku mirovên normal û asayî û xelkê giştî nikarin rûyê rastî yê wan bizanin û ji armanc û meremên wan têbigihin, Nalî wekî xemxûr û kesekî rewşenbîr û hişyar rexne li wan digre û henekên xwe bi wan dike û xelkê jî agahdar dike xwe ji van cûre kesên bi fêl û derewînê li nava civakê biparêzin. Bi vî awayî jî teksteke ladana civakî nivîsiye, ji ber ku her behskirina

kesên olî li mela û şêx û sofî tişteke civak wan bi pîroz dizanê ji bo wê yekê dibê ladana civakî.

3.5 Ladana Civakî Erotîkî - Behskirina Laş û Cesteyê Jin

Ev cûre şî'ire berfirehiyeke mezin li dîwana Nalî yê şa'îr da dagîrkiriye û cîheke zêde girtiye, bi cûreyekî din dikarîn bibêjîn Nalî van cûre şî'ire nivîsiye û bi tenê dahênaneke zêde mezin li vî warî da li nav şî'irên xwe da kiriye, bi taybetî li qesîdeya Mestûre da, eger bê û ji bo ladana civakî li dîwana wî da tenê qesîdeya Mestûre nivîsîba dîsa jî bes bû, ku xwe ji (49) rêzên Şî'irdide û bi şakarekî bilinda edebî tê zanîn li dinyaya şî'ira klasîka Kurdî bi giştî û dinyaya şî'ira Nalî bi taybetî. Eve ji bilî li şî'rên din ku behsa laş û cesteya qedexekirîya jinê dike û dixê rû.

Li vî derbarî de nivîskar û lêkolîner Rêbwar Sîweylî, dibêje, qesîdeya Mestûre bi sedema gelek belgeyan ve xwe ji wan tekstan cûda dike ku şa'îrên rêka îslamê di derbarê endamên leşê jinê ve berhem anîne, gelek ji wan şa'îran meyla xeyal û bîrkirina wan çendî azad û bilind firîne, li behskirin û wesfa endamên qedexekiriyên leşê jinê da biwêrek û azad nebûn. *Ji xwe eger çend kesek jî hespê serkêşê xwe berev rûberê laşê jinê de dabê, ewe zêdetir li ser sîma û şan û mil û gerdenê nivîsîne, an jî li bin ranê derbas dibe û navê saq û piyê wan bi dem da hatiye û li nermiya ranê da rawestayê* (Sîweylî 2015, 111) Ku wate Nalî cûda û hurtir û bi wêranetir behsa endamên leşê jinê kiriye û di demek da ew bi xwe kesekî xwedî pile û payeyekî olî û Mela bûye, ji bo wê serdemê û demê jî bi vî awayî behskirin li awayekî dîmen û girteya seksî da neku her qedexê nebûye, belku zilam jî li ser hatiye kuştin û kêşe û giriftên mezin li ser pêkhatine, ji bo wê yekê dîmenên beşek ji şî'irên Nalî wêneya ceste û cihê wiha yê jinê dixine rû zilam nikarê tenê li nav xelkê da jî behs bike, êdî bê û li nav Şî'îrû hemû civakê û xwendevan û nexwendevan bibhîse û bibîne, ji bo wê yekê Nalî birastî neku ladana civakî encam daye, belku dest ji bo cihên gelek girîng û bingehînên cesteya jinê biriye û li nav şî'irên xwe da behs kiriye wekî: Ran – memik – lêhv – sîne – pajneya pê û

xirupirên ceste û her wiha endama mêyîne jî li hinek cîh de li nav şîrên xwe da behskiriye, ji wî jî kurtir çûye û behsa pêkhat û beşên endamê za û zê û mêyîneya jinê bi rûnî kiriye, eve jî lutkeya erotîkî û yasa şikênî û têkşikana bihayên civakî û dab û nerîtên ehlaqî û civakiye, ji bo wê yekê hewl didîn piçek ji tesktên şîriyên Nalî li ser van cûre ladan bixîn rû û bikîn belge û şîrove li ser bikîn û cih û peyv û destwajeyên ladayî û qedexeyên nav civaka Kurdî destnîşan bikîn, ku bi çend beşek destpêkiriye bi vî awayê

xwarê jî ev yek tê dîtin.

3.5.1 Behskirina Memkê Jinê

Nalî dibêje:

Xoş le ser sîney serî heldawe dû guwê ser be mor

Mat û heyranîm ke 'er 'er key henarî girtuwe (Abdulkirîm 2005, 544)

Wateya wê Çend xweşikî dî gogên ser bi mor li ser singê yar serî hildane ku mebesta wî *Ji gogan cote memikê yar û li ser bi morî ya gog memikane, ku kes dest lê nedaye negirtiye, ez ji eve seyr sersamim ku wiha kengê tişteki wiha rû daye dar û dirextê 'er'er henar bigre mebest ji 'er'er bejn û bala yarê ye, ji henar jî memikên wê ne (Abdulkirîm 2005, 544)*

Wekî dibînîn Nalî bi eşkere behsa leş û cesteya jinê kiriye, ku memikê wê yek ji van cihane, ku wiha herdem zilam çav li ser û cihê hest hişyarker û bizwêna zilame, eve jî ladane ji orf û dab û nerît û bihayên bilindên li nav civaka Kurdî da. An jî dibêje:

Kiç perçemî çîn çîne, dû memkî le ser sîne

Wek şaneyî hengwîne bo le etî dinya kiç (Abdulkirîm 2005, 164)

Wateya wê *Behsa jinê dike, dibêje keç perçema wê çîn çîne dû memik li ser sîne ye û bi zulfên wê dorandiye ew memik wekî şaneyî hingivîn pirin ji lezet û tama xweşiyê*

û li dinya jî ji bo xweşî û tam û arezû her keçe (Abdulkirîm 2005, 164) Bi vî awayî behskirina tama hingivîna memika keç û behskirina wê li şîrê da kirdara seksî têdaye û hesta beramber tevdigerîne, her wiha Nalî li cîheke din da, bi tevahî daxwaza xwe ji bo memkê yarê derdibrê û bi wê temenê pîr ku hebûye, şîn û weylayî ji bo gihîştina bi memikê keçê kiriye û ew bi xwe dibêje her çende ez pîrim û serê min spiye û wekî şîrê memik, lê belê her hez ji mijîna memikê yarê dikim û bi hêviya ewe me memikên wê bi dest û dev bigrim.

Wekî mînak Nalî li vir da behs dike û dibêje:

Bo memik Nalî çî mindalane wey wey kirduwe

Gerçî muwî wek şîre, bew şîre şikofey kirduwe

Xoş be herdû dest û dem girtuwiye oxey kirduwe

Kîzb û towemmet, îftîra û biwetan ke tobey kirduwe (Abdulkirîm 2005, 552-553)

Wateya wê *Temaşa Nalî bike çawa wekî zarokan ji bo memikê yar digrî û dinale û ketiye hawar hawarê û her çende pîr jî bûye û mûyên wî wekî şîrê spî bûye, bi wê şîra memikê yarê helaliyê kiriye û pê gihîştîye, Wate ji bo wê şîrê zarok bûye û ketiye gir û galan û wekî dar û dirextê biharan helaliyê kiriye* (Abdulkirîm 2005, 553) Her wiha li dêra düyem da, dibêje temaşa Nalî bike ku çend başe bi her dû destan û dev memikê yarê girtiye ji xweşiyar da her (Ox û ox) a wî ye derew û buxtane dibêjin tobe kiriye û dest ji memikê yar hilgirtiye, tiştê wiha neraste û dildarê rastîne wekî Nalî tu demekî tobe pê nakê.

3.5.2 Endama Nêrîneya Zilama

Nalî yê şa'îr li zêdetirê tekstên xwe de behsa endamê zilam kiriye û tenê wekî balkişandineke li ser çûna temen û pîriyê ji kar ketina vê endamê behs kiriye ku eve jî ladanekî diyar û rûn ya civakiye û bi vî awayî behskirina ji endama nêrîneya xwe li

civaka Kurdî da eybe û şerme û nabê bi eşkere bê behs kirin û bixe rû, lê belê li van tesktên Nalî da hest hi derûna têkşikayî ya Nalî dikîn, eveye li vê teksta şî'irê da dibêje:

Elîfr nekîre û bêgane, nayete te'rîf

Elem muşabihi xeyr û mulazîmî tenkîr (Abdulkirîm 2005, 226)

Wateya wê: Elîf (al) elf lamî te'rîf îşarete jî ji bo endamê nêrîneya zilam ku wekî pîta (Elîf) dirêje, nekîre: li şûna wê yekê ku kesê ya tiştêkî nediyar bigihîne nenaskirî be, pênasê kirina wê nehatibe kîrin me'rîfe nasandin, dibêjim, peyveke ji xwe ve kesek yan tiştêkî diyar bigihîne, muşabiye, wek xeyr, peyveke li zimanê Erebi da eger yafe jî bikin pal me'rîfe yek her nabê bi me'rîfe û bi nekîrî dimîne, bi giştî rêzeke dibêje: Eweye elîf weku endamî nêrînem waye ewende bê kare û pekkewteye kes nanasê û natwanim be kesî binasênim kîrekem ke caran wek alayî qît û qinc bû, wek şitî dîkey lêhatuwe û (kîrîş) bibwe be hawserî (ten) wate leşew lîyî ciya nabêtewe û birwa bo cêyek.

Behskirina endama nêrîne û şibandina wê ya bi (elîf) ku pîta (elîf) rast û rêke bi vî cûreyî Nalî yê şa'îr bi vî awayî behskirin tiştêkî rê pênedayî ye û ladane ji dab û nerît û teqalîdê civakê, ji bo kesek ku şa'îr bê û naskirî bê li nav civakê û her wiha Mela jî bê, nabê van cûre peyv û destewajeyan bikarbîne.

Her wiha Nalî li cîheke din da behsa gunên xwe dike û bi destkê gozê bi nav dike:

Hurufî cerre têyanda nemawe awî emel

Hemû elleq û mulxayî amîlî teqdîr

Be xeyrî en ke le bo nez' û 'ezlî zembûre

Ke jarî marî neçêjê useyleyî hencîr (Abdulkirîm 2005, 224)

Wateya wê *Lêpîrsîn* û *gileyî ji pîrbûn* û *nexweşiya xwe dike, wekî ku li vê şî'irê da diyare zêdetir kêşeya haletê derûnîye ku dema dibêje ku li gel şeket û pîr û lê qewimane eweye endamê îşkerê leşê min wiha nexweş û ji hal ketiye û peywendiya wan bi hev re nemaye wekî ewene ku çawa sedema (kirin)a min jî berev ewe diçe ku şiyana*

(hişyar) bûnê ve li veşartî kêm bistîne, her wiha dibêje gunên min ku wekî destkê van la û laya (goze) ku wiha ava karkirina wan têda nemaye û bi qeza û qedera xwedê ji kar ketine û bi vî alî û wî aliyê gozê şor bûne, tenê rêgîrek maye kar bike, ew jî kar bi xwe ye ji bo eweye nehêlê devê şîleya hêjîrê (jehrê mar)e ku tam bike (Abdulkirîm 2005, 224)

3.5.3 Endama Mêyîneya Jin

Yek ji babet û behsan, ku behskirina ceste û laşê jine, bi taybetî ew cihên ku nabê û ne hêjayî behskirinê ye û nabê bi eşkere behsa van cihên qedexe kiriyan bê kirin, lê belê Nalî yê şa'îr bi eşkere û li nav tekstên şî'îrên xwe da behsa ceste û laşê jin dike û her wiha bi cûreyek behs dike, ku tenê ew kesên xêzandarî yan mumareseya seksîyê encam dane bi van cûre wesfa van cihên jinan dike ku zanyarî û naverokeke bi tevahî li ser wan heye û dixê rû, bi taybetî jî li qesîdeya (Mesture) eveye xweşikî û bi bê perde ber çav dikevê, ew jî bûye sedema dahênan û nivîsîna şî'îrê erotîkî û ladana civakî.

Her wiha Nalî yê şa'îr ji bo wê yekê xwe rizgar bike li dijayetîya civakê û dab û nerît û tenanet şer û dîn jî, hêvî dibe ber cîhana xewn, peyva xewn li rastîyê da rewabûnek dide axaftinên wî û ew xwe ji wan qedexekirîyan diparêzê ku li cîhana agahdar da hene û nabê di dema asayî û bêdarî da bi cîheke siruştî û asayî axaftinê li vî derbarî de li ser bikîn. Xewn azadiyek ji bo dûayan û axaftine li ser taboyan tîne holê û çekeke bi destê axaftvan ve heta bi bê şerm û hesab ji bo vekirina meseleyên exlaqîyên civakê, behsa halê xwe dike.

Eveye Nalî li behskirina nav leq û çeqên Mesture û endama za û zê da, dibêje:

Lew kaniyeda cozere rêwasî rûyabê

Be cozere rêwase kemêkî qilîşabê

Ya qesrî mu'ellake le awêne kirabê

Ya xunçeyî neşgufte ke awî nedabê

Ya qursî nimek her weku mermer be tiyabê

Cêyî qetreye awêkî le nêwda qileşabê

Ya girdekî girdêkî ke şîrîn helîdabê

Girdî nimekîn, ye'nî giyay lê nerwabê (Muderis 1976, 611-612-613)

Eger temaşa wan tekstên li serê bikîn li qesîdeya Mesture ya Nalî da bi eşkere û bi bê hîç tirsek wesfa endama za û zêya (Mesture) dike û çendîn wêneyên hunerî xweşikiya şî'ir berhem aniye. Temaşa wateya şî'irê bikîn, dibêje *Em şuwêne kameye kes riçey tiya neşkanduwe û be seriya neroyîştuwe, lutkey berz û spî qendil asaw guzerî aw heway le bare bo pêgeyştin û gewre bûn, çunke le nawerastî ew befre sarde da kanîyekî germ teqîwe, bew kaniye germe behar hatuwe û cozere rêwasêk riwawew be rûwanî ew cozere rêwaseş kemêk le pele befreke şeqî birduwe?* (Muderis 1976, 613) Li vir da wateyekî li rêza yekem da bi eşkere Nalî behsa ranên Mesture dike bi spî û bi befr û bi qendîlan bi nav dike, her wiha behsa ewe jî dike, ku li navbera ranên spî de jî kaniyek heye av germ û teqiyayî têda heye, ku mebesta wî endama mêyîneya jin û mûyên wê jî dişibîne bi rêvasan, her wiha tenê cureta wî ya wê yekê heye Nalî yê şa'îr dibêje: Ev cîh hatiye şeqkirin û bi şev derzêkî têdaye. Eve jî şî'irekî erotîkiye behskirina laş û cesteya jine.

Her wiha wateya rêza dûyem An ku dibêje: Eve çiyê tu dibêjî qey koşkekî bilinde ji eynik û awêneyan hatiye dirust kirin anjî xunçeyekî nepişkiwiye, ji ber ku nehatiye (av) dan, heta bipişkivê, diyare eger xunçe neyê avdan napişkivê, belku sist jî dibê û dimrê, li vir da peyva xunçe û av nedan û endama za û zêyetîya jine.

Her wiha li wateya rêza sêyem û çarem da dibêje: Wate an jî eve çiyê qey dibêjî wekî parçe berd û kevirê mermer tîşk dide û tenê dilopa (av) ê li nava wê da derz kiriye, yan girdeke û serî hildaye ew bi xwe jî bi tam û xwê û şore zevî ku spî bike û giya jê dernekeve bi vê jî li gir û giya û girek diyare û eşkereye ku endama za û zêya jine û spî û nerm û bê mûye.

Ev tekst û çendîn tekstên din li vê qesîdeyê da behsa li endamên jin û cihên qedexekiriyê Mesture û jin bi giştî dike, ku eve jî bûye sedema wê yekê ev tekst bibin tekstên ladana exlaqî û civakî û dûrî li ehlaq û rewşt û nerîta civaka Kurdî be. Bi tenê ev cûre tekst rûyê xwe yê meclîsan nabê, ji bo wê yekê teksteke tevahî ji bo xaneyaya ladana civakî û şî'ira erotîkî ye.

Eger em bixwazin tevahiya teksta şî'riya Mesture xanim li vir da behs bikîn û şîrove bikîn, bêguman zêde pêwîste û behsa me gelek dirêj dibê, ji bo wê yekê me beşekî biçûk ji tekstê wergirtiye, me xistiye rû eger na tevahiya tekstê ku xwe ji (49) rêzên şî'irê dibîne, diçê xaneyaya ladana civakî û şî'ira erotîkî cinsî û babeta seksî, ku têda hildan û wesifkirina endamên girîng û seksiyên jin li (Sing – ran – memik – dem û lêhv – endama za û zê û hwd...)

Wate Nalî yek ji şa'îrên qaçax û yaxî û tekstên wî jî cûda û bîr û hizrê dahênerane li nêrîna ladana civakî ve berhem aniye û tamedî têr û nazik û romantîkî jî bi xwendevan dibexşê. Ji aliyêke din ve bi tehl kirina wî hest û nestî û kûrahî û derûniye li cem şa'îr.

3.6 Ladana Civakî û Paşketiya Civakê:

Yek ji van cûre ladanên Nalî yê şa'îr li nav tekstên xwe da hêvî ji bo wê biriye û tekst li ser nivîsiye, bi cûreyek behsa hinek ji take kesên nava civakê dike û êrîşê li ser dike û rexne lê digre, ku eve jî cûreyek ji ladana civakî dirust dike. Ji ber ku raste rast li ber xelkê û bi eşkere axaftin û gileyî û gazindên xwe ji wan dike. Bi taybetî li van rewşt û dab û nerîtên paşketî yê kevin, ku bûne sedema paşketinê û berev pêşveçûna civaka Kurdî û asta take kesên Kurd.

Wate nivîskar li vî rûyê ve aliyekî hîlbijartiye li jiyana rastî û dike bi cihê rexne girtina li ehlaq û rewştaya nepesend û xwe xerap bi niyazê rêberî û serzenîştîkirina bi kûrî û bi wêneyekî kar bike têrî aliyên hîlbijartî jî şîrove dike û diçespênê (Feçil 2002, 56) Li

nav edebiyata Kurdî da ev cûre Şîrnivîsîn hebûnekî zêde heye û hebûye, ji bo wê yekê zêdetirê şa'îrên Kurd hevşêweya şa'îr û bîrmendên cîhanê ketine xem û başkirin û berev pêşvebirina civaka Kurdî û dest xistine ser kelên û nexweşiyên civakê eve jî li şî'îrên wî da bi rûnî xûyaye û hatiye berceste kirin.

Nalî yê şa'îr jî wekî şa'îrên din, herdem rûyê dijî wan aliyên ku bi awayeke şaş û ji bo berjewendiya xwe civaka Kurdî bikartînin û take kesên wê diçewsênin, eve jî wiha li şa'îr kiriye êrîşeke tund bike ser wan û civakê û take kesên nav civakê bo ku hinek ji dab û nerîtên kevin û xerap ji nav bibe û kêr bike.

Bi vê jî ladanekî civakî dirust kiriye, ji ber ku eve di dema Nalî jiyaye tu bîçî dijî dab û nerît û adet û hinek ji kes û kesayetiyên olî rawestî karekî hêsan û kêşe nîne. Eveye Nalî dibêje:

Tûtî to le hîrsî dil dawî teme dekate mil

Bulbulî min le eşqî gul texniye û tereb deka (Muderis 1976, 100)

Wateya wê "azûtû! ey bedkar û xirapkar me cûdahî heye ji hevdû, tu tutiyî (papagan) û zêde dibêjî û tenê axaftina xelkê dûbare dikî, îş û karê te her axaftina vî û wî gerandin û anîn û birine, ji bo wê yekê li temaya xwe yî û te milên xwe girêdaye û bûyî nokerê ev û ew, lê belê ez bilbilim dildarê gul û gulzar û baxim, herdem stran ji bo xweşikî û şîyan û xwezayê dibêjim" (Muderis 1976, 100) Nalî yê şa'îr rexne û gileyî, li komek kesan dike, ku dixwazin Nalî û şî'îrê Nalî bi sivik û bê girîng û dûbare kirinê bidin zanîn. Lê belê Nalî bersîva wan dide bi awayeke hunerî û tekstên Şî'îrû wêneyên xweşik li qalibekî henekwarî û pêkenînî dixe ber tîşkê hizr û qelema zarê xwe, şa'îr wiha bawere ev cûre nokerî û pesindan diyardeyekî neşîrîne û mijule civakê ji nav bibe, bêguman ew kesên bi vî awayî tevdigerin kesên diyar û pile û payeyekî civakî ya bilind heye, ji bo wê yekê behskirina wan tiştêkî asayî û yasayî nîne li gor orf û dab û nerîtê lê belê eve li cem Nalî cihê xwe nabê û divê perde li ser rûyê wan rake û wan binasê û xelk jî wan binasê.

Her wiha li teksteke din da li cîheke din da, dibêje:

Sabûnî keffî pêye kefi zarî çaplûs

Xasiyetî reqqî heye nermî zubanî lûs (Muderis 1976, 237)

Wateya wê *Lepê devê zilam merayî ker û riyabaz, di demek da ku dipeyvê û diaxive û merayî dike kefi diçirîne, sabûn pêye ji bo axaftin li gel ker bike, wate zimanê wî ewende hilûye wekî ewe ye kefê sabûnê birjîne ji ber ku pê kesê beramber, wê kefa li devê zilamê riyabaz dirijê ser zevî sabûna wî ber pêye ji bo şemitandin hilxiliskandina kesê beramber, nermîya zimanê wî yê hilû, ji bo milbirîn û xelkê şaşkirin û helxeletandine hwd (Muderis 1976, 237) Nalî yê şa'îr gileyî û gazindeyê li van kesane dike ku zimanekî nerm û hilû heye û berdewam li hundirê xwe de jî kesê xerap û kîn rihtin û xelkê hildixeltênin û fêl li wan dikin û riyabaz û bêrûne, wekî li Şîrda xûyaye zêdetir mebesta wî ew kesin, ku pile û payeyekî dînyayî heye û xelk gûh didin wan û bi wan şaş û hildexilitin.*

Yan her li teksteke din da (Nalî) rû dike mirov û mirovayetîyê û civak û wan kesan xwe bi zilzan û tekebûra wan heye û naz û fîz li ser xelkê dikin. Bêguman kesên dewlemend û dest dirêj û arîstokrat mebesta wî bûne, ji wan re dibêje we ji bîr kiriye, hûn çawa hatine vê dinyayê û bi çi da derbasbûne, werin ser xwe û naz û fîz li ser kî de dikin, karê we yê bi vî awayî nîşana hîç û pûçiya we ye.

Ji bo wê yekê Nalî dibêje:

Binware bûnî ewelt û çûnî axirt

Hatî çî rût û qût û helatî çî lûs û pûs (Muderis 1976, 239)

Wateya wê: Ey ademîzad li xwe bayî buyî li ser xwe şûyî!? bîr li xwe bike, tu çawa hatî dinyayê û tu çawa çûyî, ku wate dinya ne ji bo eweye û nehatiye dirust kirin piştî xwe pê girêbidî û bibestî. Wate Nalî her çende behsa vê çîne dîke çînekî diyar û xwedî pile û payeyekî cîvakî ne, lê belê êriş dike ser wan û wan bi xweperest û

dinyaperest bi nav dike. Ewe jî cûreyeke ji ladana civakî li cûreya paşketî, ji ber ku Nalî wiha bawere ev tevger nîşana paşketî û nezanî û nefehmîya wane, eger na dinya karwan seraye û çawa hatine wiha jî diçin û bi cîh dihêlîn û hîç tiştekî li gel xwe nabîn, ji bo wê yekê daxwaz dike ewqas li pey dinya û ewê li nav deye nekevin û agahdarî hevdû bin û civakê îhmal nekin û kar bikin ji bo paşarojeke baştir û bi rûmettir.

3.7 Ladana Civakî Li Rûyê Siyasî ve

Yek ji cûreyên dinê ladana civakî siyasî û rewşa siyasî ye li navçeyê da, diyare behskirin û rexne girtin û hevsozîya niştiman li cem şa'îrên klasîkî û li nav wan de jî Nalî yê şa'îr yek ji wan şa'îrane berdewam mijulî ewe bûye, ku wiha hestekî kûr ya niştiman li dil û derûna xwe û take kesê neteweya xwe biçîne. Her çende çî raste rast Nalî wekî şa'îrên piştî xwe vê meseleyê nexistiye rû, belku li rêya wêneyên hunerî û dest nîşan û nivîsên xwe ve vê babetê behskiriye, qesîdeya (Qurbanî tozî rêgetim) yek ji wan qesîdeyên dirêjên Nalî yê şa'îr bi tevahî qesîdeyê siyasî û behsa rewşa Silêmanî dike li bin siyasî û desthilatdarîya Mîrnişîna Baban û Babanîyan. Bi tevahî hest bi derûnîya têkşikayî westabûna Nalî dike li dûrî bajar û welatê xwe xurbetî dûrî û nebûna hêz û desthilatekî siyasî bihêz û kiyaneke siyasî Kurdî, herdem Nalî tûşî xem û xurbet û bêhêvîti kiriye. Yek ji wan sedemên diyarên koçkirina Nalî ya Şamê û dûrketina ji Silêmanî rûxana Mîrnişîna Baban bûye ku ew rûdana siyasî tevahîya jiyana Nalî diguhere û berevajî dike û wiha li şa'îr dike serhilgirê û bajarê bab û bapîrên xwe bi cîh bihêlê û biçê û xurbetê himbêz bigre.

Ewe jî ji bîra me neçê ku tevgerên Kurdistanê serdema Nalî de tevgerên xêlkî bûn û xwedî desthilatên Baban her ew bi xwe bibûne dijî canê hevdû û tevgera neteweyetî negihîştibû radeyek hemû şa'îr wekî hinek kes dixwestin têkbidin (Muderis 1976, 63) eveye Nalî gileyî û lêpîrsînê li neteweya Kurd û Ereba dike, ku her dû jî yekin, lê belê ketine bin çewsandînê û dagîrkirin û sîtem û zordarîyê û tefrîqe dixine navbera xwe û şer dikin, Nalî li vir da dibêje:

Milletî Kurd û Ereb her dukyan tefreqe bûn

Be cefaw û mîlhenî mulkî seba û yemenî (Muderis 1976, 68)

Nalî yê şa'îr li vê beyta şî'irê da ji me re dibêje: Ku wiha bê beş nebûye li hestekî welat xwestin û hem welat xweş xwestin û bigre zîrekiyekî ewqas ser rêjbûye eve jî zaniye ku mîlletê Kurd û Ereb ji berê de heta wê serdema gîrodeya destê biyanî û bin çepokî rojgarbûn û li malwêranîya yek ji wan girtiye. Bi awayeke neraste rast hest bi ladana siyasî dikin, ku çawa Nalî gileyî ya serkirdayetî û birêvebirên mîllet dike, ku takê bindestî û sîtemkarî û çewsandina wî ji aliyê welatan û her wiha nav xwe jî ve dikevin. Eveye li heman qesîdeyê da dibêje:

Ew xarî yare êste pir exiyare, yanexo

Her xarî yare, ya buwete xarî mar û mor (Muderis 1976, 195)

Wateya wê *Hucreya min ku wê demê ji bo min û hevrêyên min wekî şikefta sewr ji bo pêxember (SLX) û Ebubekirê hevrê, niha pir bûye li biyanî û kesên nenas, ya her wekî caran dost û biraderî têdaye, an jî kes têda nîne, çol û hole û eger mar û mêrû têda bê (Muderis 1976, 196)* Wekî dibînin Nalî çawa hesta derûnî derdibrê û lê niha welatê min pire ji kesê nenas û biyanî ku mebesta wî dagîrker û wan kesane, ku bûye sedema ji navbirina desthilata mîrnişîna Baban û şewitandin û kavilkarîya bajar. An jî ji ber xerabîya rewşa siyasîya navçeyê bi xem û hêvî ve dibêje:

Aya meqamî rûxsete lem beyte bimênimewe

Ya meslehet teweqqufe tayewmî nefxî sûr (Muderis 1976, 197)

Wateya wê *Gelo hela ewe heye li vê demê da bême Silêmanî, yan baştir wiha ye li vir rawestîn heta roja qiyametê ku hemû zîndewer ji bilî saraya mehşer da kom dibin û eve jî li wir bi hevdîtina hevdû şa dibîn xweda jî tolê ji hevdû kirina me li bedkar destine (Muderis 1976, 197)* Diyare xirabîya rewşa siyasîya navçeyê û têkçuna rewşa bajarê

Silêmanî li ruyê ramiyê ve û tirsî vegerana wiha ji Nalî dike bipirsê ku war heye vebigerê? Li rastiye ev awaya axaftinê û mane û wateya delalîyan behs li wiha dikin, ku wiha Nalî êrîşî tund dike ser serkirdeya dagîrkerên bajarê Silêmanî û Kurdistanê, lê belê navê kes nayênê tenê rewş û jîngeha navçeya me ji bo şîrove dike û behs dike li pişt vê peyv û destewajeyan wiha têdigihin û tînin Nalî yê şa'îr behsa dijminên gelê xwe dike û her wiha lêpirsin û gileyî jî li mala navxweya Kurd dike, Nalî vê hestê li rêya yarî kirina bi ziman û peyvî ve û hunerên rewanbêjî dixê rû armanca şî'îrî pê digihîne.

Li xwendina vê nameya (Nalî) ku ji bo (Salim)ê şa'îr şandiye, bi eşkere dikevê, ku wiha mebesta Nalî tenê halpîrsînekî asayî û adetî nîne, belku Şî'îrî'îrekî siyasîye û ji ber wê jî ku ji bo welatê bindest şandiye, awayê remzî têda bikaraniye, Nalî li her rêzek da tê pîrsiyar dike li pîrsiyaran da jî rewşa berê tîne pêş çav dipirse û xwe niha wekî xwe maye, li pîrsiyara berambera xwe datîne, lê belê ji aliyê xerabtirbûn neku baştirbûn, ji ber ku dizanê baştirbûna ji wê yekê nayê çaverê kirin, paşaroj li van şî'îran da serdema hukma (bebe) û dema pîrsiyar jî serdema romanîyane, ku wate Nalî alîgirîya xwe ji bo serdema Babanan derdibre, xerabtirbûna rewşa jîyanê jî ji bo serdema Romîyan dide zanîn.

Wekî her rewşenbîrekî hişyar û durbîn hest bi peywendîya di navbera rewşa derûnîya xelk û rejîma siyasî dike, eve jî bi wê da rêzek de ku dipirsê çi xelk zewq û şewqa berê maye û rabiwardin û geran û seyrana wê demê dikin yan ne?! feqe diçin ji bo yarî kirin û rimbazî û xarxarîne lawan berdewame, yan li sayeya rejîma reşa Romîyan ve hemû tiştê jêbiriye û ji navçûye, cûreya remz bikaranîna keşa (Nalî) wekî sedemek bûye ji bo şiyana derbirîna mebest li gel xwe derbas kirin li çavê zeq û guhê qît.

3.8 Ladana Civakî Şî'îra Daşorîn

Daşorîn yek ji van cûre şî'îrane li edebiyata hemû gelan de hebûna xwe heye û kêma heta gelek şa'îran Şî'îrîli ser nivîsiye, şa'îrên Kurd jî bêbeş nebûye li van cûre

şî'irane, bi taybetî şa'îrên klasîka Kurdî, li nav wan da jî Nalî yê şa'îr xwediyê çendîn tekstên xweşike li ser vê babetê, ji bo wê yekê şî'ira daşorîn bi sedema cûreyek ji durketine li bihar û rewşa civakî û ladana li yasa û orf û adet û teqlîda Kevina Kurdewarî ve, ev cûre Şî'îrjî diçê xaneyê ladana civakî ve.

Nalî yê şa'îr li zêdetirî wan şî'irane li ser sofî û zilamên olî nivîsiye diçê xaneyê daşorîn û sivikatî pêkirinê, eve ye Nalî yê dibêje:

Sofî û ser mêzer, min û zulf û ser û desmal

Min kuştayî lacangme û ew kuştayî cange (Muderis 1976, 464)

Wateya wê *Sofî hez, ji ser û mêzere ku lûfika mêzera wê li milan bê xwarê û xwe pê binivêne, ev jî daxwaza mine ku zulf û ser û desmala yar bibînim bi lacangiya şor bûbê, ez kuştaya lacangî nazdaranim û ew jî kuştaya wê cenga ser lêşêwaye ku xwe ji dest daye her çi da bi daxwaza dil nebê an jî ez bi bê ceng li meydana dil da hatime kuştim û ew jî li cenga riyakar da hatiye kuştin ku dinya û qiyameta tiyalekîs çûye* (Muderis 1976, 465) Wekî wateya şî'ir da diyare şa'îr galte û sivikayetî bi zilamên olî ku sofîyane dike û ji wan re dibêje we bi xwe dest daye rêbazek ku hebûna xwe nîne li îslamê da û xelk jî ser lêşêwayî dikin, wekî hûn bi xwe eve tişteki riyabazîye û dinya û qiyamet jî li ser daniye, ji ber ku xweda eva qebl nake û naxwaze.

Yan li teksteke din da Nalî dibêje:

Şêxî û ser lînge destarî be destarî buzug

Rendim û destarî kelley minî defe, nek mîndefe (Muderis 1976, 452)

Wateya wê *Tu bi navê şêxê terîqetî û mêzerêkî lit ji bo riya û dinya li ser nave ewqas lîngê destarêk dibê, demîşt ji bin ve mijulî birwêş kirin û axaftina heleq û meleq û hîç û pûçe, ez kesekî qoşme û keyfçî û xweşim, gûh bi dinya nadim û li şûna mêzer enêm bi serê xwe ve, neku mêzerekî(kumekî) wekî gozê Helac, lokeya riyayî ji bo ev û ew pê şîrove bikim* (Muderis 1976, 452)

Li vê teksta şîrê da Nalî carekî din şor dibê bi navê kesayetî û ew kesên bi derew şêx û sofî riyabazê dinyayê ne bi awayeke henekî û galtecarî û bi daşorînê ve behsa wan dike, divê eve jî behs bikîn, ku wiha Nalî yê şa'îr dijî ola îslamê nebûye, ji ber ku ew bi xwe kesekî olî bûye, lê belê dijî wan kesan rawestayê û wan rîswakiriye, ku bi navê ol ve li bin riha dirêj û mêzer û kumê serê xwe ve û bi bikaranîna olê ve xelkê çewsandine û ji bo bi destanîna destkeftên maddî û me'newî û riyabazî vê ol û dînê bikaranîne. Şa'îr tê perdeyê li ser van cûre kesan radike û wan riswa û rezîl dike li ber çavê xelkê bi henek û galtecarî û xirapkar bi nav tîne, bi vê jî teksteke ladana civakî li cûreya daşorînê ji bo me dixê rû.

Yan li cîheke din da Nalî dibêje:

Şêxim, çi germe helqeyî zîkirt be reşbelek

Halî emane xo be cenabit musewwele

Dayim le dûte mêgelî jin, nêrgelî piyaw

Bem rîşe we le pêşewe le pêşewe buwî be ser gele (Muderis 1976, 267-268)

Wateya wê *Şêxê terîqetê li Kurdistana serdema Nalî da terîqeta Qadiri û Neqşebendî bûye û niha jî hene helqeya zikir kombûna ji bo bîranîna xweda û reşbelek û helperkêya pêkve ya jin û zilamane: Le hatin û we'êkî taybete be ser derwêş û sofîyekanda dêt û cilewî xoyaniyan niya le dest dereçê, her weha le dêrî duwem da ya şêx hemîşe komelî jin û piyawit şuwên kewtûn ke ewende nefam û nezanin weku mer û bizin wan, xoşit be komelê rîşewe wek sergel kewtuwîte pêşiyên ewendeş tenegeyiştuwe û nefamî û nezanî û nazanî bo kuweyan debey* (Muderis 1976, 268) Wekî dibînîn çawa bi awayeke henek û galtecarî û xelk jî bi cahîl û nefahm û nezan dide zanîn û wan bi paşketî bi nav dike û şêx û sofîyan jî bi nezan û nefahm û ser hiş çûyî bi nav dike.

ENCAM

Li dawiya vê lêkolîna da gihîştîn çend encamek ku pêkhatine ji van xalên xwarê

Ladan û çemka ladanê behs û babetekî giştîne û hemû warên nivîsînê li xwe digre, wate ladan dikare li babetekî zimanevanî bê û zêdetir û kar li ser keresteyên zimanîyan wekî peyv – destewaje – birge – fonîm – ladana sentaksî – yan ladana wateyî li xwe bigre , anjî ladaneke ji ladana rewanbêjî û hunerên wê bê, yan jî ladanekî civakî bê û dest ji bo komek çemk û zaraveyên qedexekirî dab û nerî û orf û dîn û jîn û civakê bike.

Bi her cûreyek ji cûreyan bê, eve digihîne, ku wiha ladan û çemka ladanê biha û nirxekî zêde girîng û pêwîstî heye li hemû kayeyên nivîsînê da bi taybetî jî li edeb û Şîrda.

Ladana civakî ku me kar li ser kiriye li vê lêkolînê da pantayekî zêde û berfireh li tekstên edeba klasîka Kurdî li Kurdistana başur da dagîrkiriye, bi cûreyek gelek kêş û şaîrên wê serdemê peyda dika Şîrû tekstên şîrê li ser vî warî de nehatibe nivîsîn û ladana civakî têda nehatibe kirin û perde li ser diyardeyek, yan behs û daxwazekî civaka xwe ya li vê serdemê da ranekiribe û tîşk nexistibê ser û hewla gihandina bi xwendevan û civakê nedabê.

Nalî yê şaîr yek ji van şaîrane xwediye çendîn tekstên hunerî yê bilindê edebîye, ku diçê xaneyê ladana civakî ve, Nalî yê şaîr her çende ew bi xwe pile û payeyekî civakî ya diyar û kesekî mela û olî bûye, lê belê herdem êrîşeke tund kiriye ser kesayetîyên olî û wan rexne kiriye û bi kesê fêlbaz û riyabazê li nav civaka Kurdî daye zanîn û pê wiha bûye sedema serekiya çewsandinê û paşketiya nav civakê ne, ji bo wê yekê li rêya tekstên şîriyan ve wekî peyam û erkekî mirovayetî û niştimanî jî hewl daye mîlletê xwe ji van cûre kesan agahdarbika, ji bo eve jî yek ji ladanên civakî ku teksteke zêde li vî derbarî de nivîsiye, ladana civakî li cûreya oliye û kesayetîyên mezinê olî kiriye armanc bi vê jî teksteke sed li sed ladana civakî berhem aniye.

Ladana erotîkî û behskirina laş û cesteya jinê bi awayeke vekirî û bi eşkere bi navkirina li tekstên şîriyên Nalî da, hebûnekî zêde heye û beşa şêr ber ketiye û dikarin bibêjîn bi pileya yekem tê, wekî mînak li qesîdeya (Mestûre) da ku xwe ji (49) rêzên Şîrde pêktîne, ji destpêkê ve heta dawî ya qesîdeyê şaîr bi awayeke vekirî û gelek bi azadî û bi bê gûhdanê bi bihayên mirovayetiye û ehlaq û rewştiyên nava civaka Kurdî û îslamî da hêvî ji bo van cûre behskirina ceste û cihê hesasê jinan biriye û behs kiriye, eve jî lûtkeya ladana civakî ye û ji ber ku bî awayî eşkereye û li vê serdema Nalî têda jiyaye û li civakeke îslamî û ew bi xwe jî Mela bê, bêguman ji yasa ladan û dijî dab û nerît û exlaqa civakî ye ev cûre peyv û destewaje, ku rûyê meclîs û nava xelkê nîne, li Şîrda bê behs kirin.

Nalî yê şaîr ji bo guzarişt kirin û gihîştina bi mebesta Şîrû xistine rûya van hez û xeyal û daxwazên ji hestan da hene hêvî biriye ber mekanîzmekî diyar, ku mekanîzma berevanîya derûnîye, bi vê jî li rêya wêneyên hunerîyên li nav tekstên Şîrda xwestiye hezên xwe pê derbibrê û haletên derûnîyên seksîyên xwe pê pir bike.

Nalî yê şaîr yek ji wan şaîrên wêrek û bi curet ya edeba klasîkî ye, ku bikarê bi vî awayî bi bê perde van ladanên civakî li nav tekstên Şîrda encam bide. Heta niha ne li serdema xwe û ne piştî serdema Nalî jî bi vî awayî û bi van hemû azadîyan ve behsa endamên laş û cesteya zilam jinê nehatiye kirin û nexistine rû eve jî bûye sedema dirustbûn û nivîsîna çendîn tekstên hunerî û statîkî ji aliyê şaîr ve û têda dahênana hunerî encam daye û li tekstan ve tamedî zêde ya edebî bi xwendevan dibexşê.

Li rûyê dahênana Şîr ve Nalî yê şaîr bi sedema hêvî birin û pel avêtina komek behs û xwestan û babeta qedexê li nav civaka Kurdî da, bi taybetî jî rûnkirin û xistine ser kaxizê laşê jinê û endamên seksîyên jin û zilam, her wiha ev şîrên, ku guzariştin li hez û arzuya hesta derûnî û seksî ya şaîr hilgirê wêneya hunerî û tekstên erotîkî ne û diçine xaneya ladana civakî û ladana ji dab û nerît û rewşenbîrî û ehlaqa civakê ve, ji bo azayetî û curetî ya Nalî yê şaîr ve vedigerê, bi vê jî bûye sedema dahênana mezina Şîrû Nalî jî bi şaîrekî dahêner bide zanîn. Ji ber ku zanayê derûnnas (Froid) dibêje: Yek ji sedemên dahênanê derxistin û xistine rûyê haletên derûnî û seksîyên nav ve yê nivîskare, ji bo wê yekê dahênan bi meseleya hesta derûnîya seksîyan ve tê girêdan.

Yek ji van mekanîzmên diyar û ber bi çavê Nalî yê şa'îr hêvî birine li vê rêyê ve tekstên Şî'îr pêşkêşî beramber kiriye û cîhana xewne, xewn wekî sedemek û çekekî edebî li cem Nalî yê şa'îr bikarhatiye, bi taybetî li qesîdeya (Mesture) da, ji ber ku xewn hîç bacekî yasa û civakî û exlaqî û olî jî nagirê, Nalî xewn dike rêyek ji bo pirkirin û gihîştina bi hez û dawxazên seksî li xewnê da jî hîç kes û aliyan jî nikarê bê sizadan û bi bêbext jî bê bi navkirin, li aliyekî din ve zextên derûnîyên şa'îr piştgirê serekî bûye li dahênan û nivîsîna van cûre tekstan û bi vê jî tekstan kiriye bi tekstên erotîkî û ladana ji dab û nerîtên bihêzên civakê û her wiha li yasayên zemînî û asmanî jî, şa'îr hez ji encamdana fîzîkiyên seksî kiriye li gel Mesture da li rastiyê da ji bo wî desteber nabê, li ber rêgiriya civakî û olî, ji bo wê yekê Nalî van hezan ji bo asta ne agahî dibe û paşê li rêya mekanîzma ladanê ve hez û daxwaza encamdana wê kiriye xewn û xeyala Şî'îrdike rêyek ji bo gihîştin û lutkeya daxwazên seksî bi Şî'îrencam dide, eve jî lutkeya ladana civakiye li şî'îrên Nalî da.

ÇAVKANÎ

- Abdulazîz, Se'îd. *Medxal ala alabda'*. Al Urdin: Daralsaqafe lîl neşir û lîltewzî', 2006.
- Abdulkirîm, Mela Abdulkerîmî Muderis û Fateh. *Dîwanî Nalî*. Çapî duwem. Serdeşt, 2005.
- Abdulla, Abdulselam Necmedîn. *Şikirdinewey deqî şî'irî le ruyî zimanewaniyewe*. Hewlê: Çapxaney Hacî Haşim, 2008.
- Abdulwahîd, Kerîm Azad. *Sosyolojiyay şî'irî Kurdî(le ruyî pêwêre akariyekanewe)*. Hewlê: Çapxaney Wezaretî Perwerde, 2005.
- Abdumelik, Murtaz. *alşî'riye alqasîde qasîde alqarae*. Beyrut: Dar Al Menxib al'arabî lîl dîrasat wel neşir, 1994:.
- Akeltun, Tedî. *Markîzm û rexney edebî*. Hewlê: Dezgay Aras, 2008.
- Almesdî., Dr. Abdulselam. *Aluslubiye waluslub*. Kuwêt: Dar sa'ad alsabah, 1993.
- Anduras, Necîb Fayiq. *Almedxel fî alneqid aladibî*. Misir: Mektebe alaneclu Misriye, 1974.
- Basîr, Dr: Kemal Husên Azîz. *rexne sazî mêjû peyrewkirdin*. Bexda: Çapxaney kurî zanyarî Bexda, 1983.
- Bokanî, Sabîr. *tirs û xoşewîstî*. Silêmanî: Xaney çab û bilawkirawey Çarçira, 2008.
- Cadu, Saleh Muhemed Alî Abu. *Tatbîqat Ameliye fî tinmiye altefkîr albida'î*. Al Urdin: Dar alşerq waltewzî û dar yafa alnaşir altewzî liltabi'e, 2004.
- Ca'fer, Nurî. *Alasale fî mecal al'alem walfen*. Bexda: Almegbe altehrîr, 2007.
- Cafer, Nurî. *Alfikir taybe we utur*. Bexda: Çapxaney tahrîr, 1977.
- Cizîrî, Al Tahir bin al Mebruk Al. *Alanziyah fî Alnas Aldramî*. Cam'ie Al Musil, 2002.
- Deştî, Osman. *şî'irî nawçey Mukriyan nîwey yekemî sedeybîstem*. Slimini: Silêmanî : Çapxaney Renc., 2009.
- Dizeyî, Abdulwahid Muşîr. *ladanî watay le zimanî şî'ir da*. Bexda: Cami'e Bexda, 2007.
- Dr:Talebanî, Mukerem. *Dîwanî Şêx Riza Talebanî*. Silêmanî, 2001.
- Ebubekir, Xoşnaw. *şî'irî berengarî Kurdî*. Silêmanî: Çapxaney Ronakbîrî, 2002.
- Elî, Qadir Xanzad. *Zimanî şî'irekanî Hacî Qadirî Koyî û Mehwi û Şêx Riza*. Hewlê: Zankoy Selahedîn, 2004.

- Emîn, Dr. Abdalqadir Heme. *Binyatî karnameyê le deqê nûyê Kurdî da*. Silîmanî: Çabxaney Tîşk, 2008.
- Fazil, Dr. Salah. *Alem Aluslub*. Cidde: Dar albilad, 1988.
- Feçil, Selah. *Dr:Minahic alneqid el'asr*. al Qahire: Mudîrît lîlneşir alma'lumat, 2002.
- Fehîm, Şewqî. *Albinaye fîl nasr û biyolojiya al ictima'ie*. beyrut: Mucelle Alaflam, 1977.
- Ferec, Ehmed Îsma'îl. *Têrwanînek le Nalî mezin*. Silêmanî: Çapxaney Serdem, 2013.
- Feyzî, Emîn. *Encumenê edebiyatî Kurd*. Silêmanî: Çapxaney Kakeyi Felah, 1982.
- Hensî, Kemal. "Welamdanewey seks le mîda." Silêmanî, 2010.
- Hesen, Heme Se'îd. *şî'ir û şimşêr*. Hewlêr: Çapxaneya Aras, 2008.
- Hîte, Mecîdî. *M'cem musgulhat aladab Ingilî - Fransî - Arabî*. Beyrut: Mektebe Nebat, 1974.
- Husên, Cebar Ahmed. *Îstatîkay deqê şî'irî Kurdî (1950-1970)*. Silêmanî: Dezgay Çap pexşî Serdem., 2008.
- Husên, Selahdîn. *Hewel albî'a alfen we mulamihe al ictima'ie*. Wezare Al îlam, 1976.
- Kemal. *Seretayek bo lêkolînewey şî'irî klasîkî Kurdî dîdarî şî'irî klasîkî Kurdî*. Bexda, 1986.
- Kerîm, Piştîwan As'ad. *şî'ir le rewangey şa'îranî klasîkî Kurdiyewe*. Hewlêr: Zankoy Selahedîn., 2016.
- Kurdî, Mêjuyî Edebî. *Dîwanî Kurdî*. Hewlêr: Gîwî Mukriyanî, 1961.
- Latîf, Kerîm B.D Zahîr. *Alanziyah fî şî'ir Hacî Qadir Koyî*. Silîmanî: Mucelle Serdem Al'arabî, 2005.
- Mamend, Abdulla Soran. *Nostaljiya le şî'irî hawçerxî Kurdî da*. Hewlêr: Zankoy Selahedîn, 2014.
- Marks, Karl. *Aladab wel fen fî alaştirakiye (Alasdar alsanî*. Al Qahire: Mektebe Medbulî, 1997.
- Ma'ruf, Fetah Mihemed. *Ziman û taybetmendiyekanî*. Hewlêr: Zankoy Selahedîn, 1987.
- Maruf, Xeznedar Dr. *Mêjuyî Edebî Kurdî*. Hewlêr: Dezgay Aras, 2010.
- Mecîd, Mehmud. *Şî'ir û felsefe*. Silêmanî. Silêmanî: Dezgay B û bexşî hemdî, 2008.
- Meçîye, Mihemed Se'îd. *albaylucî alactma'î fî alabida'î alfenî ,mecmu'e meqalat mutircume al Ingilziye*. Urdin: Dar bin Reşîd lîlneşr weltewzî', 1998.

- Mehmud, Ehmed. *Dîwanî Seyîd Ehmed Neqîb*. Hewlêr: Çapxaney Giştî Rewşenbîrî û lawan, 2006.
- Mela, Kerîm Mela Abdulkerîmî Muderis û Mihemedî. *Dîwanî Mehwi*. Bexda: Çapxaney Korî Zanyarî Kurd, 1977.
- Melakerîm, Mihemedî. *Nalî le klawrûjney şî'rekaniyewe*. Bexda: Çapxaney Akademiya Iraq, 1979.
- Melazade, Rêbwar Muhemed. *Nalî û saykolojiyay şî'ir*. Hewlêr: : Çapxaney rojhelat, 2001.
- Merwe, Husên. *Dîrasat neqdiye fî çu almenhic alwaqî'*. Lubnan: Mosse alabhap al'arabiye, 1986.
- Mihemed, Dr. Abdulqadir Heme Emîn. *Binyatî karnameyî le deqî nuwey Kurdî da*. Silêmanî: Çapxaney Tîşk, 2008.
- Mîran, Kerîm Mistefa Şareza Serdar Hemîd. *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*. Silêmanî, 1986.
- Mîşel, Dînklin. *M'cem Alm alaîctima*. Bexda: Dar al reşîd lîlneşir, 1980.
- Muderis, Mela Abdulkerîm. *Dîwanî Nalî*. Baxda: Çapxaney Korî Zanyarî, 1976.
- Mukriyanî, Gîwî. *Dîwanî Salim*. Hewlêr: çapxaney Kurdistan, 1972.
- musên, mewlud Abdulrahîm. *Pêkhatay Efsaney Kurdî*. Silêmanî: Çap û bilawkirawey Renc., 2007.
- Omer, Dr. Muhsîn Ehmed. *edeb û komelge*. Hewlêr: Dezagay Raman, 2005.
- Qadir, Sero. *Komelge, dîn û tundutîjî*. çapî yekem. Dihok: Çapxaney Xanî, n.d.
- Qasimî, Alî. *Muqedime fî ilm almastalih*. Muqedime fî ilm almastalih, 1985:.
- Qerecetani, Kerîm Şerîf. *saykolojiyayî giştî*. Hewlêr: Çapxaney Zankoy Selahedîn, 2006.
- Quen, Jan. *Biniye alluxe alşî'iriye*. almexrîb: Dar tubqal lîlneşir, 1972.
- Rêbîn, Resul. *Sîstemî siyasî*. Silêmanî: Çapxaney Wezaretî Rewşenbîrî, 2003.
- Resul, Îzedîn Mistefa. *Serincî le zimanî edebî yekgirtuyî Kurdî*. Bexda: Çapxaney Selman Alazîmî, 1971.
- Ribab'e, Dr. Muhsîn Same. *Alustubiye mefahîmha û tecliyatha*. al Urdin: Dar alkendî lîlneşir, 2003.
- Roşna, Ehmed Resul. *Dahênan le rewangey çend teorîkewe*. Silêmanî: Çapxaney Dekay Serdem, 2001.

- Sale, Aware Kemal. *Rexney Komelayetî û Praktîzekirdinî le şî'irekanî Goran da*. Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim, 2002.
- Saleh, Tavke Omer Heme. *Ziman wek dahênanekî takekesî lay Mehwî*. Hewlêr: Zankoy Selahedîn, 2009.
- Şareza, Kerîm. *Nalî û zimanî edebî yekgirtuyî Kurdî*. Bexda: Çapxaney Edîb, 1984.
- Şeqrawî, Muhyedîn Yusif Abu. *Mudexil alî sosyolociya aladib al'arabî*. almexrîb: Almerkez alsaqafî al'arabî aldar albîçaw, 2005.
- Sicudî, Ferzan. *Der Amadî ber nişane şunas îşî'ir*. Danişgahî Alame Teba tabayî, 1997.
- Sikut, Wîlbirs. *Xemise medaxel alî aleniqid aladibî (Muqalat m'ahre fî alneqd*. Bexdad: Minşurat uzare alsaqafe ulfenun, 1981.
- Silêman, Ehmed Hezar. *Rehendî rexney komelayetî le şî'irekanî Hacî û Bêkes da*. beşî Kurdî, Hewlêr: Zankoy Selahedîn, 2015.
- silh, sdiq. *Dîwanî silim*. Silêmanî: binkay zhin, 2015.
- Şiwan, Îbrahîm Ahmed. *Edebî Konî Kurdî*. Bila tarîx.
- Sîweylî, Rêbwar. *Kitêbî Nalî*. Çapî duyem. Hewlêr: Çapxaney Malî Wefayî, 2015.
- Şukriye, Resul Dr.: *Edebî Kurdî û hunerekanî edeb*. Hewlêr: Zankoy Selahedîn, 1989.
- Talebanî, Dr. Mukerem. *Dîwanî Şêx Rizay Talebanî*. Hewlêr: Dezzgay Aras, 2001.
- Warîn, Reniye Wîlîk û Austin. *nivriye aladib*. Beyrut: Alosse al'arabiye lîldîrasat walneşir, 1987.
- Weys, Dr. Ahmed Muhemed. *Alanziyah min menzur aldirasat alaslubiye*. Beyrut: Mecîd Amosse al Cam'iye lildirasat walneşir, 2005.
- Xeznedar, Maruf. *Dîwanî Nalî*. Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim, 2010.